# LI ZANÎN-GEHÊN TIR-KIYEYÊ ÎXLALÊN MAFÊN AKADEMÎK YÊN DI QADA XEBATÊN KURDÎ DE

WÎB
WEQFA ÎSMAÎL BEŞÎKCÎ

# Li Zanîngehên Tirkiyeyê Îxlalên Mafên Akademîk yên di Qada Xebatên Kurdî de

**Sazî**
Weqfa Îsmaîl Beşîkcî

**Koordînatora Projeyê**
Ayşe Tepe Dogan

**Raportor**
Gullistan Yarkin

**Hevdîtin**
Güllistan Yarkın, Tofan Sünbül

**Deşîfrasyon**
Tofan Sünbül, Şükran Şahin, Şilan Seyhan

**Wergera Kurdî**
Kubra Sagir

**Dîzayn**
Şener Ozmen

Îlon, 2020
Revîzekirin: Hezîran, 2023

WEQFA ÎSMAÎL BEŞÎKCÎ

www.ismailbesikcivakfi.org

ismailbesikcivakfi ibesikcivakfi IsmailBesikciVakfi ismailbesikcivakfi

Uluslararası İnsan Hakları
Çerçevesine Uyumun
İzlenmesi için
ETKİNİZ
AB PROGRAMI

"Ev weşan di çarçoveya "Bernameya YE Etkiniz" de, bi piştevaniya Yekitiya Ewropayê pêk hatiye. Ji naveroka vê weşanê tenê Weqfa Îsmaîl Beşîkcî (WÎB) berpirsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê temsîl nake."




# LI ZANÎNGEHÊN TIRKIYEYÊ ÎXLALÊN MAFÊN AKADEMÎK YÊN DI QADA XEBATÊN KURDÎ DE

# NAVEROK

**PÊŞEKÎ, Güllistan Yarkin** / 7
**KURTEYA BIRÊVEBER** / 9
**DESTPÊK** / 12

1. **XALÊN PARASTINA AZADIYA DERBIRÎNÊ DI PEYMANÊN NAVNETEWEYÎ DE YÊN KU DEWLETA KOMARA TIRKIYEYÊ ÎMZEYA XWE DANIYE BINÎ** / 18

2. **XEBATÊN KURDÎ LI ZANÎNGEHÊN TIRKIYEYÊ** / 24
2.1. Ji sala 1923yan heta 1990an Têgeha "Kurd", Xebatên Kurdî û Dr. İsmail Beşikci / 24
2.2. Di Salên 1990î de Têketina Xebatên Kurdî ya Zanîngehên Tirkiyeyê û Geşbûna Qismî ya li Salên 2000î / 29
2.2.1. Beşên Kurdî û Tezên Kurdî yên Ewil di Salên 2010î de / 33

3. **SÎNORDARKIRINA AZADIYA DERBIRÎNÊ YA BINGEHÎN DI QADA XEBATÊN KURDÎ DE: AN SANSÛR Û OTOSANSÛR AN JÎ CEZAKIRIN** / 35
3.1. Du Têgehên ku Salên Dûr û Dirêj Qedexe Mane "Kurd" û "Kurdistan" / 38
3.2. Hin Mijar û Têgehên ku Îro di bin Fişarê de ne: / 44
3.3. Danezana "Bu suça ortak olmayacağız!" "Em ê nebin hevparên vî sûcî!" û Cezakirina Akademîsyenên Îmzekar / 45
3.4. Li Beşên Ziman û Edebiyata Zazakî Fişara li ser Nîqaşên Zazabûn, Kurdbûn û Zazakiyê / 49
3.5. Qedexeya Tezên bi Kurdî û Cihêkariya li hember Kurdî li Zanîngeha Dicleyê / 53

4. **TECRUBEYEKE DÎROKÎ DI QADA XEBATÊN KURDÎ DE: ZANÎNGEHA MARDİN ARTUKLUYÊ Û ÎXLALÊN MAFÊN AKADEMÎK** / 58
4.1. Heyama Rektorê Yekem Serdar Bedii Omay: Li Zanîngehê Xweseriya Qismî / 60
4.1.1. Di Mijara Kontenjana Formasyona Mamostetiya Kurdî de Pirsgirêka ligel YOKê / 63
4.1.2. Hewlên Hêzên Mehelî yên Mêrdînî û Derdorên Muhafezekar ên nav Zanîngehê ji bo Astengkirina Azadiyên Akademîk û Azadiya Derbirînê / 67
4.1.3. Tasfiyeya Birêveberiya Serdar Bedii Omay di sala 2014an de / 70
4.2. Heyama Rektorê Duyem Ahmet Agirakça: Paşveçûna di Azadiyên Akademîk de / 72
4.2.1. Li Zanîngehê Tasfiye, Zordarî, Tirsandin, Çavtirsîkirin û Tehdît / 73
4.2.2. Cezakirina Akademîsyenên li Zanîngeha Zaxoyê Doktora Kirî / 76

5. **BIDAWÎBÛNA PROSEYA DIYALOGÊ Û BANDORA GİŞTÎ YA HEYAMA REWŞA AWARTE LI SER XEBATÊN KURDÎ** / 78
5.1 Îxracên Akademîsyenan, Rektorên Fişarker, Kêmbûna Çalakiyên Akademîk û Polîtîkaya Sirgûnê / 79
5.2. Paşveçûna di Dersên Hilbijarî yên Kurdî û Xebatên bi Kurdî de / 84

6. **"ENCAM" WEQFA ÎSMAÎL BEŞÎKCÎ** / 87

7. **PÊŞNIYAR** / 89


MŞÜ


T.C.
ŞIRNAK ÜNİVERSİTESİ
MEHMET EMİN ACAR KAMPÜSÜ


DİCLE
ÜNİVERSİTESİ


YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ


İLİMDEN GİDİLMEYEN YOLUN SONU
MUNZUR ÜNİVERSİTESİ
REKTÖRLÜĞÜ


BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ



Ev rapor xwe dispêre encamên lêkolîna mijara çavdêrîkirin û raporkirina îxlalên mafên têkildarê azadiyên akademîk û azadiya derbirînê yên qada Xebatên Kurdî yên li zanîngehên Tirkiyeyê ku ji terefê Weqfa Îsmaîl Beşîkcî (WÎB) ve û bi piştgiriya Etkiniz AByê hatiye kirin. Xebatên Kurdî bi esasî qadeke akademîk a înterdîsîplîner e ku xwe dispêre lêkolînên li ser tarîx, çand, avaniya civakî û siyaseta kurdan, li her derê ku ew dijîn. Ev qad, dîsîplînên beşên însanî û civakî yên wekî edebiyat, sosyolojî, tarîx, antropolojî, zanista siyasetê, sînema, xebatên kultûrî, psîkolojî û perwerdehiyê dihewîne. Li aliyê din, her çi qas wekî Xebatên Kurdî were binavkirin jî ew qad bêyî xebatên li ser komên etnîkî û dînî yên wekî  ermenî, suryanî, êzidî û elewî, nikare bi awayekî serbixwe were nirxandin û bêyî pêwendiya ligel xebatên tirkî, erebî, farisî jî ne mimkun e ev nirxandin kamil bibe. Lewma jî Xebatên Kurdî ji nêz ve têkildarê xebatên li ser komên etnîkî û dînî ye ku kurd bi wan re di nav têkiliyê de ne.

Dr. İsmail Beşikciyê ku navê xwe daye Weqfa Îsmaîl Beşîkcî, yekem akademîsyen e ku Teza Dîroka Tirkan (Türk Tarih Tezi) û Teoriya Roj-Zimanî (Güneş-Dil Teorisi) di çarçoveya rastiya kurdan de rexne kirine ku ev teorî li Tirkiyeyê di avakirina îdeolojiya fermî ya dewletê de xwedan ciheke girîng in.

Beşikciyê ku ji ber xebatên xwe yên akademîk ên rexneyî di sala 1970yan de ji zanîngehê hatiye îxrackirin, ji ber kîtêbên xwe yên çapkirî, gotar û parastinên xwe yên li dadgehan, ji destpêka salên 1970yî heta 1990î, 17 sal û 2 mehên emrê xwe li girtîgehan derbas kiriye. Ji ber vê yekê Beşikci aktorekî dîrokî ye ji aliyê têkoşîna azadiya akademîk û azadiya derbirînê ve ya ku li dinyayê tê kirin.

Li zanîngehên Tirkiyeyê, xebatên akademîk ên li ser kurdan ku bi

bikaranîna têgeha “kurd” hatine kirin, çend salpiştî ku Beşikci dest bi vê têkoşînê kir, di salên 1990î de bipêş ve çûb û bi taybetî di salên 2000î û 2010î de bi awayekî qismî zêde bû. Xebatên Kurdî, bi taybetî piştî sala 2015an derbeyeke giran girt û paş ve çûn. Ev rapora ku xwe dispêre lêkolîneke sala 2020ê ku di bin şertên fişarker ên giran yên siyasî û civakî de hatiye birêvebirin, bi qasî ku em dizanin rapora ewil e ku li ser îxlalên mafî yên qada Xebatên Kurdî yên li zanîngehên Tirkiyeyê hatiye amadekirin û ji ber vê hindê xwedan nirxeke sembolîk e.

Pêşniyara lêkolîna ku vê raporê xwe sipartiyê, çarçoveya giştî û rêbazên şopandinê cara ewil di sala 2019an de, ji terefê Dr. Derya Bayirê ve hatine kemilandin. Ev projeya lêkolînê di mehên bihara 2020an de, ji teref Koordînatora Îdarî ya WÎBê Ayşe Tepe Dogan, Endamê Lijneya Birêveberiyê ya WÎBê Tofan Sunbul û lêkolînera serbixwe Gullistan Yarkinê ve hat pêkanîn. Wekî ekîba birêveber a projeyê em spasiya hemû akademîsyenan dikin ku beşdarê rapirsiya me bûne û hevpeyvîna ligel me qebûl kirine. Bêyî piştgirî û tevkariya wan dê ev rapor derneketa holê.

Wekî lêkolîner û nivîskara vê raporê, spasiya Lijneya Birêveberiyê ya WÎBê dikim ku piştgirî û tevkariya projeyê kirin; spasiya Bernameya Etkiniz AByê, Derya Bayira ku piştgiriya raporê kir û pêşniyara projeya lêkolînê kemilandî, ji bo piştgiriyê spasiya yek ji avakarên WÎBê İbrahim Gürbüz dikim. Herwiha ji bo piştgiriya hêja ya xebatkarên WÎBê Şükran Şahin û Şilan Seyhan dikim.

Hêvî dikim ev rapor tevkariyê bike ku di Xebatên Kurdî de azadiya derbirînê û azadiyên akademîk xurt bibin.

30 Gulan 2023
**Gullistan Yarkin**

# KURTEYA BIRÊVEBER

Ev rapora di destê we de ji xebateke çavdêriyê pêk tê ku bala xwe dide li ser îxlalên mafên perwerdehî û agahdariyê, azadiyên akademîk û derbirînê yên akademîsyenên qada Xebatên Kurdî ku ev maf di peyman û belgeyên navneteweyî de hatine parastin û Tirkiyeyê jî îmzeya xwe daniye binê wan. Di destpêka raporê de, di çarçoveya xalên li belge û peymanên behskirî de, rewşa giştî ya Xebatên Kurdî li Tirkiyeyê û rêça ku ji bo nivîsandina raporê hatî şopandin, cih digirin. Di vê beşê de tehlîlên 20 hevdîtinên kûr, ligel daneyan li raporê hatine zêdekirin. Ji beşdaran neh kesî danezana “Em ê nebin hevparên vî sûcî!” îmze kiriye û çar kes jî di qonaxa rewşa awarte de -ku di 21ê tîrmeha 2016an de hatibû îlankirin û 19ê tîrmeha 2018an de hatibû bidawîkirin- bi Biryarnameyên di Hukmê Qanûnan de (KHK) ji karê xwe hatine îxrackirin. Di heman demê de yekî/ê ji karê xwe îstîfa kiriye, peymana akademîsyeneke/î îmzekar ku li zanîngeheke weqfê dixebite nehatiye dirêjkirin û sê akademîsyenên îmzekar jî li karên xwe yên li zanîngehan berdewam dikin. Daneyên rapirsiyên amadekirî bi grafîkan, di bin serenavên mijaran de hatine nirxandin. Di dewama raporê de, behsa fişar û îxlalên li ser şexsê Dr. İsmail Beşikci tê kirin ku weqfa me jî li ser navê wî hatiye avakirin û wî li zanîngeheke Tirkiyeyê cara ewil behsa kurdan û têgehên têkildarê kurdan kiriye û li ser wan xebitiye ku ev têgeh ji destpêka avakirina komarê heta destpêka salên 2000î wekî tabûyên siyasî dihatin dîtin. Paşê jî tezên li agahîdanka YOKê li gor salan hatine lêkolînkirin, tezên li ser kurdan nivîsandî hatine tesbîtkirin û li gor atmosfer û rûdanên siyasî yên wan salan hatine nirxandin. Di navbera salên 1990 û 2000î de kêmbûna tezên li ser kurdan bi derdora fişar û pevçûnê û li zanîngehan tabûbûna van mijaran re rasterast hevgirtî ye. Di salên 2000î de bi pakêtên guncaniya ligel YEyê û

bi hin reformên demokratîk Xebatên Kurdî nîsbeten geş bûne. Xebatên Kurdî yên zêdebûyî, ji nirxandina tezên li agahîdanka YOKê ya li gor salan jî tê fehmkirin, herwiha tezên tesbîtkirî bi awayekî kronolojîk wekî tablo cih digirin. Di raporê de, çarçoveyeke giştî hatiye xêzkirin ji bo cara yekem vebûna beşên kurdî li zanîngehan, yên bi gavên erênî yên qonaxa piştî 2000an ku ji teref raya giştî wekî "hevdîtinên diyalogê" tê zanîn û ji 2010an vir ve serpêhatiya beşên kurdî yên li zanîngehan. Paşê jî dîsa bi lêkolîna li ser agahîdanka YOKê hatî kirin, hatiye tesbîtkirin ku di navbera salên 2000 û 2010an de hejmara tezên ku di sernavên wan de peyva "kurd" derbas dibe derketiye 43yan û di salên dahatû de jî hejmara tezên di vê qadê de bi zêdebûn dewam kiriye. Ji ber vê yekê, salên 2000î nîşan didin ku ji teref Komara Tirkiyeyê û dîroka zanîngehan, di qada Xebatên Kurdî de veguherînên girîng pêk hatine. Tezên yekem ên kurdî piştî 2009an hatine nivîsandin û teza ewil ya kurdî di sala 2012an de li Zanîngeha Mardin Artukluyê hatiye parastin û bi awayekî fermî hatiye qebûlkirin. Ligel vê yekê, di vê raporê de mijar û têgehên wekî "Bakurê Kurdistanê", "mêtingeh", "kolonî", "dij-kolonyal" hatine ravekirin ku îro hê jî wekî tabû tên dîtin û dema dibin mijarên xebatan rastê mueyîdeyên curbicur tên. Piraniya akademîsyenên ku di qada Xebatên Kurdî de xebatên xwe bi rê ve dibin, dema xebatên xwe yên akademîk pêk tînin an jî dema di dersan de fikrên xwe bi xwendekaran re parve dikin, hewl didin ku bipîvin an jî pêşbibînin ku kîjan fikir û têgeh dê sînorên dewletê derbas bikin û ji ber vê dikarin werin cezakirin, kîjan fikir û têgeh "maqûl" û "qebûlbar" in. Di rapirsiyê de, ku ligel 58 akademîsyenan hatiye kirin, ji bo baştir fehmkirina vê mijarê du pirs hatine pirsîn: (a) "Hûn wisa difikirin ku di dersên xwe de otosansûrê dikin?" Ji 58 kesan 37 kesî bersiva "erê" daye vê pirsê, anku otosansûra di dersan de ji %63.79 e. (b) Di xebatên xwe yên akademîk (tez, gotar, kîtêb hwd.) yên têkildarê mijarên kurd û Kurdistanê de hûn wisa difikirin ku otosansûrê dikin?" Ji bo vê pirsê jî ji 58 kesan 41 kesî bersiva "erê" daye û îfade kiriye ku di weşanên akademîk de otosansûrê dike. Rapor nîşan dide ku di qada Xebatên Kurdî de, ji aliyê azadiyên akademîk û azadiya derbirîne, otosansûrê ve yek ji pirsgirêkên bingehîn e û ev bi awayekî gelek berbelav tê kirin. Herwiha, di raporê de tecrubeyên perwerdehiya beşa Ziman û Edebiyata Kurdî û beşên din ên Zanîngeha Mardin Artukluyê tên tehlîlkirin ku di Xebatên Kurdî de bi îdiayeke mezin vebûbûn, bo raya giştî wekî gaveke girîng hatibû nîşandan û di medyayê de gelek cih girtibû. Tevî vê, helwestên rektorên zanîngehan ên li hember Xebatên Kurdî, bi hevdîtinên kirî û agahiyên ji venêrîna medyayê bidestxistî hatiye nirxandin. Zanîngeha Mardin Artukluyê dezgeha yekem e ku di qada perwerdehiya bilind de beşa kurdî vekiriye û ders daye. Di bin Enstîtûya Zimanên Zindî ya zanîngehê de, bi pratîkî perwerdehiya bilind a kurdî dest pê kiriye. Ligel vê taybetmendiyê, hem li gor hevdîtinên di çarçoveya vê xebatê de hem jî wekî ji venêrîna medyayê derketiye holê, Zanîngeha Mardin Artukluyê (MAU) xwedan ciheke girîng e. Ji ber ku di çarçoveya azadiyên akademîk û azadiya

derbirînê ya qada Xebatên Kurdî yên li zanîngehên Tirkiyeyê de, li gor konjonktûra siyasî ya rojane, rolên gelek "fişarker" an jî "azadker" yên rektoran, YOKê û dewletê yên li ser akademîsyenan û xweseriya zanîngehan nîşan dide. Di dema birêveberiya Serdar Bedii Omayê yekem rektorê Zanîngeha Mardin Artukluyê de akademîsyenên ji beşên cuda û bi taybetî akademîsyenên beşa Ziman û Edebiyata Kurdî nîsbeten di derdoreke azadtir de dersên xwe dane û lêkolînên xwe kirine. Lê belê, piştî ku rektor guheriye û Ahmet Agirakça ketiye dewsa wî, li temamê zanîngehê û dîsa bi taybetî di beşa Ziman û Edebiyata Kurdî de fişar zêde bûne, azadiyên akademîk û derbirînê bisînor bûne û qonaxeke wisa boriye ku bûye sedema îxracan. Bandorên erênî û neyênî yên van her du rektoran yên li ser zanîngehê di hevdîtinên ligel akademîsyenan de hatine bilêvkirin ku ew li beşên cuda yên MAUyê xebitîne an jî dixebitin. Paşê jî di encama guherîna atmosfera siyasî de – hilweşîna proseya diyalogê û îlana rewşa awarte – pirsgirêka azadiya derbirînê ya li piraniya zanîngehên Tirkiyeyê, ji bo akademîsyenên qada Xebatên Kurdî tecrubeyeke çawa bûye, bi jêgirtinên ji hevpeyvînên wan hatine diyarkirin. Di beşa encamê de jî cih hatiye dayîn bo nirxandineke giştî, pêşniyarên Weqfa Îsmaîl Beşîkcî, gavên ku divê werin avêtin û verastkirinên qanûnî ku divê werin kirin. Yek ji girîngtirîn pêşniyarên behskirî ev e: Cihdîtin û pêşketina kurdî ya li nav jiyana akademîk girêdayî verastkirinên fiîlî û qanûnî ne ku ji bo bikaranîna kurdî ya di hemû qonaxên perwerdehiyê de werin kirin, perwerdehiya berîdibistanê jî di nav de. Berî her tiştî şert e ku mafê "perwerdehiya bi zimanê zikmakî" were temînkirin û lazim e di serî de makezagon, li hemû mewzûatê were zêdekirin û bikeve bin misogeriyê. Ji bo parastin û pêşxistina kurdî û zimanên din ku bo salên dûr û dirêj ji derfetên perwerdehiya modern hatine bêparkirin, gavên piştgiriyê werin avêtin. Herwiha, pêwîst e ku ji bo kirmanckî/zazakî jî pêngavên saxlem werin avêtin ku niha di nav lîsteya "zimanên li ber mirinê" ya UNESCOyê de ye.

Ev rapora çavdêriyê, bala xwe dide Xebatên Kurdî ku ji avabûna Komara Tirkiyeyê heta îro, bi salan e li zanîngehan di bin fişarên siyasî de ye. Rapor, bi awayekî bêhtir spesîfîk, hewl dide ku îxlalên mafî yên akademîsyenên di qada Xebatên Kurdî de lêkolînên xwe dikin derxe holê, yên ku di demeke nêzîk de li zanîngeheke nav sînorên Tirkiyeyê bi awayekî qadroyî an peymanî xebitîne an jî halê hazir hê jî dixebitin û van îxlalan di çarçoveya peymanên hiqûqî yên navneteweyî binirxîne ku azadiyên akademîk û derbirînê diparêzin û Tirkiyeyê jî îmzekarê wan e.

Di proseya amadekirina raporê de teknîkên hevdîtinên kûr, venêrîna arşîvan û rapirsî hatin bikaranîn. Di dema lêkolînê de bi 20 akademîsyenî re hevdîtinên kûr hatin kirin ku xebatên xwe di qada Xebatên Kurdî de dikirin, di derbarê îxlalên mafî de venêrina medyayê hat kirin, ji bo nîşandana rewşa giştî ya Xebatên Kurdî agahîdanka YOKê (Lijneya Perwerdehiya Bilind)[1] hat venêrîn, rapirseyeke *online* li ser înternetê hat kirin ku 58 akademîsyen beşdar bûn. Bi rêya van teknîkên lêkolînê, îxlalên mafî yên cuda yên di qada azadiyên akademîk û azadiya derbirînê de hatin dîtin, ku piraniya wan nebûne mijara banga sûcî, heta di dosyeyên dozan, dadgehan û medyayê de jî nehatine dîtin. Di hevdîtinên kûr de, bi giranî baldarî li ser tecrubeyên akademîsyenan bû ku wan hê jî li zanîngehên bajarên kurdan xebatên xwe didomandin an jî berê li van zanîngehan xebitîbûn û li ser îxlalên mafên akademîk bû ku ew lê rast hatibûn. Di rapirsiyê de bêyî sînorkirina mekanî, bersivên akademîsyenan hatin girtin ku berê li zanîngehên Tirkiyeyê xebitîne an hê jî xebatên xwe didomînin. Hin akademîsyenên ku tevlî anketê bûn li Tirkiyeyê dijiyan lê qismeke wan

1 Hatiye mecbûrkirin ku tezên lîsansa bilind û doktorayê yên ku li zanîngehên Tirkiyeyê tên parastin bo Lijneya Perwerdehiya Bilind (YOK) werin teslîmkirin.

mecbûr mabûn biçin welatên cuda. Di hevpeyvînên kûr de bes akademîsyenek li derveyê Tirkiyeyê dijiya. Di venêrîna medyayê de ligel rojnameyên wekî *Cumhuriyet, Sabah, Hürriyet*ê yên navendî, ji agahîdankên hin organên weşanê yên rexneyî, yên wekî *Evrensel* û *Bianet*ê û hin rojname û portalên herêmî yên bajarên wan zanîngehan sûd hat wergirtin.


Di seranserê xebatê de ji ber sedemên derketina şewbeya Covid-19ê û sînorkirina derketina derve, hemû hevdîtin û rapirsî li ser înternetê pêk hatin. Qismek ji beşdaran bi rêya têkiliyên şexsî, qismeke din jî ji ser Weqfa Îsmaîl Beşîkcî, bi têkiliyên rêxistinî hatin dîtin. Di proseya gihiştina beşdaran û daxilkirina wan de zehmetiyeke mezin derneket. Rapirsî di mehên gulan û hezîrana 2020an de hat kirin. Bi rêya koma bangewaziya e-nameyan a Weqfa Îsmaîl Beşîkcî û platformên wekî *Kurdish Studies Network*ê beşdar hatin dîtin.

Hevdîtinên kûr di mehên nîsan û gulanê (2020) de pêk hatin. Di vê qonaxê de ligel akademîsyenên ji Zanîngeha Mardin Artukluyê (8 kes), Zanîngeha Wan Yuzuncu Yılê (3), Zanîngeha Bingolê (2), Zanîngeha Muş Alparslanê (2), Zanîngeha Dicleyê (1), Zanîngeha Munzurê (1), Zanîngeha Şirnakê (1), li du zanîngehên weqfê yên li Îzmîr û Stenbolê (2) hevdîtin hatin kirin ku berê li wir xebitîne an jî niha dixebitîn. Beşdar, bi piranî ji zanîngehên li bajarên kurdan hatin hilbijartin. Sedemên wê jî ev in ku li van zanîngehan ji sala 2009an vir ve beşên Ziman û Edebiyata/Çanda Kurdî û Ziman û Edebiyata Zazakî vebûne, gelek akademîsyenên ku li beşên zanistên civakî yên van zanîngehan dixebitin di qada Xebatên Kurdî de xebatên xwe bi rê ve dibin û da ku îxlalên mafî yên li van zanîngehan bi awayekî vekirî werin nîşandan.

Ji 20 akademîsyenên ku me hevdîtin pêk anî 10 ji beşên Ziman û Edebiyata/Çanda Kurdî û Ziman û Edebiyata Zazakî bûn; akademîsyenên mayî jî di beşên wekî Zanista Siyasetê, Sosyolojî, Tarîx, Mîmarî, Antropolojî û Têkiliyên Navneteweyî de dixebitîn û xebatên xwe bi giranî bi zimanên tirkî û îngilîzî bi rê ve dibirin. Dema beşdar hatin diyarkirin aîdiyeta wan a etnîkî ji akademîsyenan nehat pirsîn lê piştî hevdîtinan tabloyeke wisa derket holê ku 19ê beşdaran kurd, 1 tirk; 14 mêr, 6 jî jin in. 9ê beşdaran di 16ê kanûna paşîn a 2016an de danezana “Em ê nebin hevparên vî sûcî!” îmze kirine. Di dema hevdîtinan de ji 9 akademîsyenên îmzekarên danezanê 4 kes di qonaxa rewşa awarte de bi KHKyan ji karên xwe hatibûn îxrackirin, di heman qonaxê de 1î/ê ji peywira xwe îstîfa kiribû, peymana îmzekareke/î ku li zanîngeheke weqfê dixebitî nehatibû nûkirin û 3 akademîsyenên îmzekar jî hê li karê xwe dewam dikirin. Ji 11 akademîsyenên ne îmzekar 3 kes di heman qonaxê de ji ber fikrên xwe yên muxalîf bi KHKyan hatibûn îxrackirin, 2 kesan jî ji ber *mobbing*ê ji karên xwe îstîfa kiribûn. 5 beşdarên ne îmzekar jî li karê xwe dewam dikirin. Wekî encam, dema ku me hevdîtin pêk anî, 13 akademîsyen ji ber sedemên cuda, bi rêyên fişarê û îxlalên mafî ji zanîngehan hatibûn dûrxistin, 7 kesan jî li karên xwe berdewam dikirin.

Di rapirsiya nav çarçoveya lêkolînê de, wekî hevdîtinan balkêşî ne li ser herêm an jî zanîngehekê bû. 58 kes beşdarê rapirsiyê bûn. Ji 58 kesên beşdarên anketê 32 mêr, 26 jin bûn. Ji nav beşdaran 30 kesan kurdî, 21an tirkî, 3yan kirmanckî-zazakî, 3yan kurdî-tirkî, 1î/ê jî kirwatî-almanî wekî zimanê xwe yê zikmakî diyar kiribû.


Ji beşdarên rapirsiyê pozîsyona wan a akademîk hatiye pirsîn, ji 58 kesan 57 kesî bersiv daye.




Dabeşbûna dîsîplînên akademîk ên beşdarên rapirsiyê wekî li jêrê ye.

| Li zanîngeheke nav sînorên Tirkiyeyê dîsîplîna ku hûn dixebitin an jî xebitîne çi ye? | | |
|---|---|---|
| Ziman û Edebiyata Kurdî/Zimanên Zindî | 15,52% | 9 |
| Sosyolojî | 13,79% | 8 |
| Antropolojî | 5,17% | 3 |
| Tarîx | 5,17% | 3 |
| Zanista Siyasetê | 13,79% | 8 |
| Têkiliyên Navneteweyî | 10,34% | 6 |
| Mîmarî | 3,45% | 2 |
| Aborî/Birêveberî | 8,62% | 5 |
| Felsefe | 3,45% | 2 |
| Zimannasî | 3,45% | 2 |
| Psîkolojî | 8,62% | 5 |
| Yên din (Ziman û Edebiyata Tirkî, Tip, Sînema, Zanistên Perwerdehiyê hwd.) | 8,62% | 5 |
| **Bi giştî** | **100,00%** | **58** |

Ji 58 kesên beşdar 43 kes dema rapirsî dihat kirin li zanîngehekê nedixebitîn. Di rapirsiyê de hat pirsîn ku heke li zanîngeheke nav sînorên Tirkiyeyê naxebitin sedema wê çi ye. Li gor vê, bersiv li jêrê ne.




Heke hûn li zanîngeheke nav sînorên Tirkiyeyê naxebitin sedema wê çi ye?

Ji 58 kesan 43 kesî bersiv daye vê pirsê. Wekî hem rapirsî hem hevdîtin nîşan didin, hejmara giştî bi awayekî tekûz neyê zanîn jî gelek akademîsyenên ku di qada Xebatên Kurdî de dixebitin ji ber nêrînên xwe yên rexneyî, bi taybetî jî bi sedema îmzekirina metna "Em ê nebin hevparên vî sûcî!" qonaxa piştî 2016an ji zanîngehan hatine dûrxistin. Lewra, her çi qas dê di beşên pêştir de bi hûrgilî were ravekirin jî îxlala mafî ya herî girîng ku divê di beşa "Destpêkê" de were diyarkirin, di sala 2015an de piştî hilweşîna qonaxa diyalogê ya di navbera PKKê û Dewletê de û di qonaxa rewşa awarte ya di navbera salên 2016-2018an de, ji zanîngehên Tirkiyeyê dûrxistina beşeke girîng ya akademîsyenan e ku ew di qada Xebatên Kurdî de dixebitin.

Herwiha, di rapirsiyê de hat pirsîn ku akademîsyenên îxrackirî jiyana xwe ji aliyê aborî çawa îdare dikin. Ne tenê akademîsyenên bi KHKyan îxracbûyî, herwiha akademîsyenên ku ji zanîngehê îstîfa kirine û malnişîn bûne jî bersiv dane vê pirsê. Li gor vê encam wisa ne:

**Heke hûn ji peywira xwe ya akademîk hatibin îxrackirin, piştî îxracê we jiyana xwe bi aliyê aborî çawa îdare kir?**




Di vê pirsê de şeş kesên ku bersiva "ya din" dane anîne ziman ku di sektorên taybet de dixebitin, malnişîn bûne, xebatên post doktorayê bi rê ve dibin, dersên li ser înternetê didin bo zanîngehên derveyê Tirkiyeyê û li derveyê Tirkiyeyê dixebitin. Wekî di van bersivan de jî tê dîtin, qismeke girîng a beşdaran derveyê qada akademîk xebatên xwe didomînin. Bi taybetî akademîsyenên ku derfet dîtine derkevin derveyê Tirkiyeyê, bi rêya bûrsan xebatên xwe yên akademîk didomînin.

Ev rapor ji pênc beşan pêk tê. Di beşa yekem de xal û naverokên peymanên navneteweyî hatine nîşandan ku azadiya derbirînê misoger dikin û Tirkiyeyê jî îmzeya xwe daniye binê wan peymanan. Di beşa duyem de Xebatên Kurdî yên li zanîngehên Tirkiyeyê di nav çarçoveyeke şiverêya dîrokî de hatiye nirxandin û ji sala 1960an heta îro rûdanên di vê qadê de bi sûdwergirtina ji agahîdanka YOKê hatine çavdêrîkirin. Di beşa sêyem de, tê vekolan ka di qada Xebatên Kurdî de sînorkirina azadiya akademîk û azadiya derbirînê ya bingehîn çawa bi awayê sansûr/otosansûrê pêk tên û nêrînên rexneyî yên ku bi serbestî tên gotin çawa ji teref desthilatdariya siyasî û birêveberiyên zanîngehan tên cezakirin. Di beşa çarem de, behsa îxlalên mafî yên li Zanîngeha Mardin Artukluyê tên kirin ku ev der di dîroka zanîngehên Tirkiyeyê de û ji aliyê Xebatên Kurdî yên li zanîngehan tên kirin xwedan girîngeyeke mezin e, yekem beşa kurdî lê vebûye û gelek xebatên qada Xebatên Kurdî tên birêvebirin; û herwiha tê behskirin ku çawa desthilatdariya siyasî û YOK mudaxaleyê xweseriya zanîngehê dikin. Di beşa pêncem de jî, tê nirxandin ku xirabûna "qonaxa diyalogê" ya di navbera PKKê û Dewleta Komara Tirkiyeyê de û rewşa awarte ya di navbera salên 2016 û 2018yan de derbasdar, bi awayekî giştî çawa bandor li ser îxlalên mafî û azadiya derbirînê ya li Xebatên Kurdî kiriye.

Di seranserê raporê de, *Biryarên Pêşniyarî yên Têkildarê Statûya Personelên*

*Akademîk ên Perwerdehiya Bilind* ya UNESCOyê, ya bi tarîxa 1997an, dê wekî çavkaniyeke referansê were bikaranîn ku ev metna têkildarê mafên akademîsyenên li dezgehên perwerdehiya bilind dixebitin, li hemû dinyayê di meseleya azadiyan de di wesfê çavkaniyeke muraceatê de ye.

## 1. XALÊN MISOGERKIRINA AZADIYA DERBIRÎNÊ DI NAV PEYMANÊN NAVNETEWEYÎ DE KU DEWLETA KOMARA TIRKIYEYÊ ÎMZEYA XWE DANIYE BINÊ WAN

Piştî Yekem û Duyem Şerên Cîhanî ku li parzemîna Ewropayê bûne sedemên gelek hilweşînan, di sîstema nû ya cihanî de ku di bin hegemonyaya Amerîkayê de hatiye avakirin, pêşxistina hiqûqa navdewletî û mekanîzmayên kontrola navdewletî bûye yek ji girîngtirîn rojeva dewletên dinyayê. Di bin bandora karesata mezin ya dumahîka şerên cîhanî ku bi mirina bi sed hezaran mirovî bi dawî bûn, bi armanca jinûve-avakirina hiqûqa navdewletî, pêşîlêgirtina îxlalên mafên mirovan yên li nav welatan, pêşîlêgirtina qirkirinan û misogerkirina mafên mirovan, gelek peyman hatin afirandin. Mafên mirovan, yên wekî mafê jiyanê, nedîtina îşkenceyê, rastnehatina cihêtiya nijadî, azadiya derbirînê, azadiyên akademîk, gihiştina perwerdehiyê, hin ji wan mafan in ku ji teref peymanên navneteweyî hatine misogerkirin. Dewletên ku van peymanan îmze dikin di qada navneteweyî de, li ber dewletên din teahûd dikin ku dê mafên behskirî di bin misogeriyê de bin û li ser sînorên axa xwe dê mafên mirovan binpê nekin.

Dewleta Komara Tirkiyeyê, bi teahûda bicihanîna xalên wan, îmzeya xwe daniye bin gelek peymanên navneteweyî ku, mafên mirovan dixin bin misogeriyê û bandoreke girîng li ser hiqûqa wê ya hundirîn dikin. Ji aliyekî din, digel ku terefekê van peymanan e, li nav sînorên Dewleta Komara Tirkiyeyê, di qadên cuda de îxlalên mafên mirovan bi awayekî giran berdewam kirine. Mijara ku ev rapor bala xwe dide ser, mafê azadiya akademîk û azadiya derbirînê li zanîngehên Tirkiyeyê ye, digel ku ew maf

ji teref peymanên navneteweyî hatine misogerkirin jî îxlalên mafî li van qadan bi awayekî giran berdewam in.

Yek ji peymanên herî girîng ên navneteweyî ku Tirkiye jî terefekê wê ye û azadiya derbirînê misoger dike, Peymana Mafên Mirovan ya Ewropayê ye *(European Convention on Human Rights)*. Ev peyman di 4ê çiriya paşîn a 1950yî de li Romayê hatiye îmzekirin û di 3yê îlona 1953yan da hatiye tetbîqkirin. Dewleta Komara Tirkiyeyê jî ev peyman di 4ê çiriya paşîn a 1950yan de îmze kiriye. Peyman, di tarîxa 10ê adara 1954an de û bi qanûna pejirandinê ya bi hejmara 6366ê, di tarîxa 19ê adara 1954an de li Rojnameya Fermî (Resmi Gazete) hatiye weşandin. Organê kontrola Peymana Mafê Mirovan ya Ewropayê, Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewropayê[2] ye. Peyman 50 salên dawiyê, bi rêya xebatên Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewropayê, Komîsyona Mafên Mirovan ya Ewropayê û Konseya Ewropayê ji nû ve hatiye şîrovekirin û pêşxistin. Konseya Ewropayê, ligel protokolên îlawe yên ku bergehê peymanê fireh dikin, pêşniyar û biryarên bo dewletên endam, qebûl kirine, standardên tevgerê pêşniyar kiriye û mueyîde kiriye li hember dewletên ku hukmên peymanê bi cih neanîne.[3] Bi xala 10em a Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê, azadiya derbirînê û ligel wê azadiyên akademîk û mafê agahdarbûn/girtina agahiyan hatine parastin.

### Xala 10em:
### Azadiya Derbirînê

**1.** Her kes xwedan mafê azadiya derbirînê ye. Ev maf bêyî mudaxeleya meqamên giştî an sînorên welatan, azadiya baweriyê û girtin û dayîna xeber û nêrînan jî dihewîne. Ev xal, ne asteng e ji bo dewletan ku saziyên radyo, televîzyon û sînemayê bi rejîmeke destûrê ve girê bidin.

**2.** Bikaranîna van azadiyên ku erk û berpirsiyarî jî lê barkirî, bi pêşdîtina qanûnan û di civakeke demokratîk de parastina ewlehiya neteweyî, hevgirtîbûna axê an jî ewlehiya giştî, dabînkirina nîzama giştî û pêşîlêgirtina kirina sûcan, parastina tenduristî an exlaqê, parastina navdarî û mafên kesên din, pêşîlêgirtina belavbûna zanyariyên veşartî an jî ji bo bicihkirina bêalîbûn û desthilatiya erka darizandinê, dibe ku bi hin formalîte, şert, sînordarî û mueyîdeyan ve werin girêdan.[4]

Peymaneke din ya ku Dewleta Komara Tirkiyeyê terefekê wê ye, Peymana Navneteweyî ya Medenî û Siyasî ye (International Covenant on Civil and Political Rights)  ku ji teref Lijneya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî hatiye qebûlkirin. Ev peyman cara yekem di sala 1966an de hatiye qebûlkirin, ji bo îmzeyan hatiye vekirin û di

---

2 https://humanrightscenter.bilgi.edu.tr/tr/content/49-avrupa-insan-haklar-sozlesmesi/

3 Dominika Bychawska-Siniarska (2018) Avrupa İnsan Hakları Sözleşmesi Kapsamında İfade Özgürlüğünün Korunması Uygulamacılar İçin El Kitabı, Avrupa Konseyi Yayını.

4 Dominika Bychawska-Siniarska (2018) Avrupa İnsan Hakları Sözleşmesi Kapsamında İfade Özgürlüğünün Korunması Uygulamacılar İçin El Kitabı, Avrupa Konseyi Yayını.

sala 1976an de jî ketiye meriyetê. Tirkiyeyê jî bi îmzeya Serokkomar, Serokwezîr û wezîrên serdemê, di sala 2003yan de ev peyman pejirandiye û di meha kanûna pêşîn a heman salê de jî ketiye meriyetê.[5] Dema peyman hatiye îmzekirin, bo xala 27an, ku di derbarê mafê azadiya îbadeta komên dînî yên cuda de ye, bi diyarkirina bicihanîna vê xalê di çarçoveya Peymana Lozanê de û bi îhtîraz nîşandana vê xalê hatiye îmzekirin.[6] Xala li ser azadiya derbirînê ya vê peymanê wisa ye:

**Xala 19em:**

Mafê her kesê heye ku bêyî mudaxeleya tu kesî, bibe xwedan fikrê ku dixwaze.

**2.** Her kes xwedan mafê derbirîna fikrên xwe ye; ev maf, bêyî girêdayîbûna sînorên welatan, azadiya lêkolînê, girtin û ragihandina her cure zanîn û fikrê dihewîne bi awayê devkî, niviskî an jî weşandî, di forma berhemên hunerî an jî bi her awayê hilbijartî de.

**3.** Bikaranîna mafên ku di benda duyem a vê xalê de tê pêşdîtin, hin erk û berpirsiyariyan bi xwe re tîne. Lewra, dibe ku hin sînor li wan bên danîn, lê belê ev sînordarî divê bi qanûnan were pêşdîtin û

**(a)** Ji aliyê rêzdariya li hember maf û navdariya kesên din û

**(b)** Ji aliyê parastina ewlehiya neteweyî, nîzama giştî an jî tenduristiya giştî û exlaqê giştî divê pêwîst be.

Parastina mafê perwerdehiyê û azadiyên akademîk, bêyî fişarên siyasî an yên din, ji bo xwendekar û lêkolîneran misogerkirina xebatên wan bi awayekî serbest li saziyên perwerdehiya bilind û zanîngehan, di xalên 13em û 15em ên Peymana Navneteweyî ya li ser Mafên Aborî, Civakî û Çandî *(International Covenant on Economic, Social and Cultural Rights)* de hatiye sererastkirin. Ev peyman li Lijneya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî, di sala 1966an de hatiye qebûlkirin, ji bo îmzekirinê hatiye vekirin û di sala 1976an de hatiye tetbîqkirin. Dewleta Komara Tirkiyeyê jî vê peymanê di sala 2003yan de pejirandiye û peyman di Rojnameya Fermî de hatiye weşandin. Xalên eleqedar ên peymanê wisa ne:[7]

**Xala 13em:**
**Mafê Perwerdehiyê**

**1.** Dewletên ku terefdarên vê peymanê ne; mafê perwerdehiyê bo her kesê nas dikin. Dewletên peymandar li ser vê fikrê dibin yek ku divê perwerde ji bo pêşxistina

5 https://humanrightscenter.bilgi.edu.tr/tr/content/117-medeni-ve-siyasi-haklara-iliskin-uluslararas-sozlesme/

6 file:///C:/3%20ETK%C4%B0N%C4%B0Z%20AB%20PROJES%C4%B0/S%C3%B6zle%C5%9Fmeler/MedeniVeSiyasiHaklaraIliskinSozlesme.pdf

7 https://humanrightscenter.bilgi.edu.tr/media/uploads/2015/08/03/EkonomikSosyalKulturelHaklar-Sozlesmesi.pdf

temamî ya takekesî û rûmeta mirovan û xurtkirina rêzdariya li hember azadiyên bingehîn be. Dewlet, herwiha di vê mijarê de li hev dikin ku perwerde divê rê li ber vebike ku her kes bi awayekî karîger beşdarê civaka azad bibe, di navbera hemû netewe û hemû komên nijadî, etnîkî û dînî de feraset, xweşbînî û dostaniyê pêş bixe û fealiyetên ku Neteweyên Yekbûyî dike ji bo parastina aştiyê pêş ve bibe.

**2.** Dewletên ku terefdarên vê peymanê ne ji bo temînkirina temamî ya mafê perwerdehiyê, van berpirsiyariyan bi cih tînin:

**(a)** Dibistana seretayî mecbûrî ye û bo her kesê dibistana seretayî ya bêpere tê temînkirin;

**(b)** Perwerdeya teknîk û pîşeyî jî tê de, cureyên cuda yên perwerdehiya duyem û bi taybetî jî perwerdehiya pêşxistinê ya bêpere ya di serî de tê dayîn, bi hemû amûrên guncav, bi qaîdeyî ji bo têketin û sûdwergirtina her kesê vekirî bike.

**(c)** Perwerdehiya bilind, bi taybetî wekî perwerdeya pêşxistinê ya bêpere, bi hemû amûrên guncav, ji bo sûdwergirtina her kesê li gor qabiliyeta wan divê were vekirin.

**(d)** Kesên ku hemû serdemên perwerdehiya ewil temam nekiribin an jî ev perwerdehî qet negirtibin, heta ku mimkin be ji bo girtina vê perwerdehiyê tên teşwîqkirin an jî girtina vê perwerdehiyê li wan tê ferzkirin.

**(e)** Tê hewldan ku bi awayekî çalak, hemû astên sîstemên perwerdehiyê werin pêşxistin, sîstemeke baş a bûrsan were avakirin û şertên madî yên mamosteyan her tim werin başkirin.

**3.** Dewletên terefdar ên vê peymanê rêzê nîşan didin heke dayîk û bav an jî wasî, zarokên xwe neşînin dibistanên dewletê lê bişînin dibistanên ku ji teref dewletê hatine sazkirin û parastin, yên xwedan şertên mînîmûm in; û herwiha rêzê nîşan didin li hember mafê temînkirina perwerdeya exlaqî û dînî ya li gor dînên xwe.

**4.** Tu hukmeke vê xalê, prensîbên di benda yekem a vê xalê de diyarkirî li aliyekî, nikare wisa bê şîrovekirin ku serbestiya avakirin û birêvebirina saziyên perwerdehiyê bide şexs û dezgehan, yên ku divê saziyên perwerdehiya taybet hertim bînin cih û guncaniya perwerdehiya saziyên taybet li gor standardên mînîmûm ên dewletê be.

## Xala 15em:
## Mafê Beşdariya Jiyana Çandî

**1.** Dewletên ku terefdarên vê peymanê ne;

**a)** Mafê beşdariya jiyana çandî,

**b)** Mafê sûdwergirtina ji pratîk û pêşketinên zanistî,

**c)** Mafê parastina qezencên madî û manewî yên ji berhemên hunerî, edebî û zanistî ku wî/wê afirandiye.

Ji bo her kesê/î qebûl dike.

**2.** Tevdîrên ku dewletên terefdarên vê peymanê ji bo bikaranîna temamî ya vê

mafê bigirin, divê tevdîrên lazim bin ji bo parastin, pêşxistin û belavkirina zanist û çandê.

**3.** Dewletên terefdarên vê peymanê mecbûr in ku rêzê nîşanê azadiya pêwîst a ji bo fealiyetên afirîner û lêkolînên zanistî nîşan bidin.

**4.** Dewletên terefdarên vê peymanê, feydeyên ji bo pêşxistin û hewesandina têkilî û hevkariyên navneteweyî yên qadên çandî û zanistî qebûl dikin.

Di vê çarçoveyê de, şîroveyên Komîteya Mafên Aborî, Civakî û Çandî yên ji bo xalên vê peymanê girîng in. Ev şîroveyên komîteyê ligel ku bi giştî biwesf in, herwiha rê nîşan didin ku dewletên terefdarên peymanê çalakî û xebatbariyê li peymanê bar bikin û berpirsiyariyên vê peymanê bînin cih. Biryara komîteyê ya bi tarîxa 1999an "Şîroveya Giştî ya bi hejmara 13an" ya xalên 38, 29 û 40an yên bi sernavê azadiya akademîk û xweseriya rêxistinî; azadiyên akademîk û xweseriya avahiyên akademîk di nav çarçoveya xalên eleqedar ên peymanê de dinirxînin.[8]

"…Li gor tecrubeyên komîteyê, personel û xwendekarên li saziyên perwerdehiya bilind, li hember fişarên siyasî yên astengker ên li hember azadiya akademîk û fişarên cureyên din bêparastin dimînin. Ji ber vê sedemê, fikrên ku li xwarê têne îfadekirin li ser saziyên perwerdehiya bilind bi taybetî disekine. Komîte, ji aliyekî din, dixwaze diyar bike ku mafên azadiya akademîk ên personel û xwendekaran, ji bo hemû pêkhateyên sektora perwerdehiyê derbasdar in û piraniya nêrînên li xwarê ji bo pratîka giştî ne.

Endamên civata akademîk serbest in ku wekî şexs an komekê û bi rêyên lêkolîn, xebat, dersdan, belgekirin/raporkirin, nîqaş, hilberîn, afirandin û nivîsandina nivîsên zanyarî, nêrînên xwe pêş bixin û ragihînin. Bergeha azadiya akademîk ev e: bo takekesan, bi awayekî serbest gotina fikrên xwe yên di derbarê sîstem an saziya ku tê de dixebitin; bicihanîna erkên xwe bêyî merûzê cihêkariyê bibin an bêyî tirsa serkutkirina ji teref dewletê an saziyeke din; beşdarbûna avahiyên temsîlê yên akademîk û profesyonel; serbestiyeta sûdwergirtina ji hemû mafên mirovan ku ji bo takekesên din ên heman yekeya îdarî û di asta navneteweyî de tên nasîn.

Ji bo sûdwergirtina ji azadiya akademîk, xweseriya saziyên perwerdeya bilind pêwîst e. Xweserî, ji bo xebatên akademîk, standard, birêveberiyê û fealiyetên têkildar ên saziyên perwerdehiya bilind, ji bo girtina biryarên kartêker ên asta xwe-birêveberiyê pêwîst e…"

Ligel vê yekê, di belgeya bingehîn a Yekîtiya Ewropayê de ku Tirkiye di statûya endamtiya wê de ye, li gor xala 13em a Beyannameya Mafên Bingehîn ên Yekîtiya Ewropayê (the Charter of Fundamental Rights of the European Union) ya bi tarîxa 2000an, azadiyên akademîk û hunerî û "rêzdariya li hember azadiyên akademîk" bi

---

8 https://www.ohchr.org/EN/Issues/Education/Training/Compilation/Pages/d
Ji bo tirkî bnr. https://insanhaklarimerkezi.bilgi.edu.tr/media/uploads/2016/05/05/BMde_Insan_Haklari_Yorumlari_1981_2006.pdf s. 228.

taybetî di bin parastinê de ne. Digel ku Tirkiye ne terefdareke vê belgeyê ye jî, ev belge bo Tirkiyeyê standardekê nîşan dide.[9]

**Xala 11em:**
**Azadiya ragihandin û derbirînê**

**1.** Her kes xwedan mafê azadiya derbirînê ye. Ev maf, bêyî mudaxeleya meqamên giştî û sînordariya sînorên netewî, xwedaniya nêrînekê, girtina xeber û fikiran û azadiya ragihandina wan dihewîne.

**2.** Divê rêzdarî li hember azadî û piranîparêziya çapemeniyê were nîşandan.[10]

**Xala 13em:**
**Azadiya zanist û hunerê**

Huner û lêkolîna zanistî divê neyê sînordarkirin. Rêzdarî bo azadiya akademîk were nîşandan.

Ligel van peymanên bingehîn ku xalên wan ên girîng li jor hatine nîşandan, Biryara Pêşniyarî ya Têkildarê Statûya Personelên Akademîk ên Perwerdehiya Bilind a UNESCOyê (Recommendation Concerning the Status of Higher-Education Teaching Personnel) ya bi tarîxa 1997an a li ser mafên akademîsyenên ku li saziyên perwerdehiya bilind dixebitin, di nav wan metnên navneteweyî yên bingehîn de ye ku azadiyên akademîk û mafê perwerdehiyê dixin bin parastinê.[11] Ev biryara pêşniyarî; ji bo rêgezên bingehîn ên di perwerdehiya bilind de pêwîst, xweseriya saziyên perwerdehiya bilind, maf, erk û berpirsiyariyên saziyên perwerdehiya bilind, azadî û mafên personelên akademîk ên perwerdehiya bilind û nirxandin, girtina kar û derxistina ji kar a personelên akademîk, perspektîfeke berfireh dabîn dike û çarçoveyeke giştî pêşniyar dike. Li gor vê biryara pêşniyarî perwerdehiya bilind; ji bo pêşveçûn û pêşxistina mirovan e û mafê perwerdeyê, hînbûn û lêkolîn bes li derdoreke wisa pêş dikeve ku azadiya akademîk bi temamî lê hebe. Herwiha, xweseriya saziyên perwerdehiya bilind û bi awayekî eşkere gotina dîtin, hîpotez û nêrînan, di navenda perwerdehiya bilind de cih digire. Derdoreke akademîk ya wisa ji bo rastî û objektîfiya lêkolînê û xebata zanistî temînateke xurt nîşan dide.

Di vê rapora çavdêriyê de hem bi rêberiya xalên peymanên navneteweyî yên li jor diyarkirî hem jî bi biryara pêşniyarî ya UNESCOyê ya bi tarîxa 1997an, îxlalên mafî yên têkildarê azadiya derbirînê yên li hember akademîsyenan dê werin nîşandan ku li zanîngehên Tirkiyeyê di qada Xebatên Kurdî de lêkolîn dikin an jî kirine.

9 https://www.avrupa.info.tr/tr/avrupa-birligi-temel-haklar-bildirgesi-708

10 https://www.avrupa.info.tr/tr/avrupa-birligi-temel-haklar-bildirgesi-708

11 Biryara Pêşniyarî ya Têkildarê Statûya Personelên Akademîk ên Perwerdehiya Bilind a UNESCOyê [UNESCO Yüksek Öğretim Akademik Personelin Statüsüne İlişkin Tavsiye Kararı] http://80.251.40.59/politics.ankara.edu.tr/altipar/Yayinlar/Yuksek%20Ogretim%20Tavsiye.pdf

## 2. XEBATÊN KURDÎ LI ZANÎNGEHÊN TIRKIYEYÊ

### 2.1. Ji 1923an ta 1990an Têgeha "Kurd", Xebatên Kurdî û Dr. İsmail Beşikciyê di bin Fişarê de

Di bin banê zanîngehên Komara Tirkiyeyê de heta salên 1990î, birêvebirina lêkolînekê, nivîsandina tezekê an jî dayîna dersekê bi bikaranîna têgehên "kurd" û "kurdî", di tu qadî de hema hema ne mimkun bû. Di vê çarçoveyê de, azadiya derbirînê di bin fişareke mezin de bû û li zanîngehan ne mimkun bû ku mirov behsa qadeke wekî "Xebatên Kurdî" bike. Zanîngehan û akademîsyenan, bi esasî xebatên li ser dîroka gelên qedîm ên Anatolyayê bi rê ve birin ji bo bisazîkirin û belavkirina îdeolojiya fermî ya ku hebûn û dîroka kurdan înkar dikir. Teza Dîroka Tirkî ya fermî ku dîroka komên etnîkî yên netirk înkar dikir, bi taybetî di salên 1930î de, ji teref dîroknas û antropologên wekî Afet İnanê hatin belavkirin.[12] Di vê qonaxê de îdeolojiya fermî bi tevkariyeke mezin a zanîngehan hat bisazîkirin. Akademîsyenên rexneyî yên wekî İsmail Beşikci û Fikret Başkaya, Teza Dîroka Tirkî ya fermî ya Dewleta Komara Tirkiyeyê red dikirin ku vê tezê xwe dispart înkarê. Wan bi dirêjahiya gelek salan an li zanîngehan pozisyonên akademîk nedîtin an jî ji ber ku fikrên xwe anîn ziman ji zanîngehan hatin îxrackirin.

Li zanîngehên Tirkiyeyê, sosyolog İsmail Beşikci yekem akademîsyen e ku derketiye derveyê îdeolojiya fermî û bi derbaskirina sînorên dewletê li ser kurdan xebat kiriye. İsmail Beşikci, di nav salên 1964-1970an de

---

12 Beşikçi, İ. (1991). Türk Tarih Tezi Güneş Dil Teorisi ve Kürt Sorunu. Istanbul: Yurt Yayınları. Cagaptay, S. (2004). Race, Assimilation and Kemalism: Turkish Nationalism and the Minorities in the 1930s. Middle Eastern Studies, 40(3), 86–101.

li Zanîngeha Erzurum Ataturkê, li Fakulteya Fen-Edebiyatê, di beşa Sosyolojiyê de asîstaniya hîndekariyê kiriye. Paşê, di sala 1970an de ji ber daxwaza rektor Kemal Biyikoglu ji karê xwe yê li zanîngehê hatiye îxrackirin.[13] Di serdema navborî de, hem fikrên wî yên ku dianî ziman hem jî beşdariya Mîtîngên Rojhilat ên ku ji teref Partiya Karkerên Tirkiyeyê lidarxistî, bûn sedem ku karê wî were bidawîkirin. Beşikci, hem wekî çavdêrekî beşdarê van mîtîngan bûye hem jî di serdemeke wisa de ku hebûna kurdan dihat redkirin, peyva kurd wekî sûc dihat dîtin (criminalizaton) û ji teref akademîsyenên li zanîngehê bi temamî tine dihatin hesibandin, di dersên xwe de, di nivîsên xwe yên weşandî de behsa kurdan û kurdiyê kiriye. Paşê ji ber weşan û naverokên dersan hatiye sûcdarkirin û cezakirin.

Di sala 1968an de rektoriya zanîngehê lêpirsîna îdarî li ser İsmail Beşikci vekiriye û di sala 1970an de ji teref Rektoriya Zanîngeha Erzurum Ataturkê karê wî hatiye bidawîkirin. Dr. Beşikci, di hevpeyvîneke xwe de ji bo lêpirsîna siyasî ya li ser xwe û ji kar derxistina xwe ev gotin anîne ziman:

> Lêpirsînên îdarî hatin vekirin li ser min. Ango, tu beşdarê mîtîngan dibî. Bi çi armancê tu beşdar bûyî? Çima beşdar bûyî? Çi maneya wê heye ji bo te? [...] Fikrê te çi ye? Pirsên wisa pirs kirin. Wan çaxan, di dersên min de jî car caran têgehên wekî "pirsgirêka rojhilat", "kurd", "kurdî" derbas dibin û di van dersan de xwendekar not digirin. Bi taybetî jî li Fakulteya Fen-Edebiyatê xwendekar not digirin. Anku, xwendekarên MHPyî ji ber têgehên "kurd", "kurdî", " pirsgirêka rojhilat", "partiya karkeran" min gilî kirine. Piştî wê, li ser min lêpirsînên îdarî vebûn. Anku, tu dibêjî kurd, tu dixwazî çi bibêjî? Kurd hene? Zimanekî bi navê kurdî heye? Tu van tiştan ji ku derdixî? Ew çax Orhan Turkdogan jî asîstan bû, lê asîstanekî biqidem bû. Wî ez îxbar kirime. Lêpirsîna îdarî piştî vê îxbarê vebûbû. [...] Anku, di derbarê min de fitkirina xwendekaran, jehrîkirina zêhna xwendekaran filan [...] Anku, di dawiya van lêpirsînên îdarî de peywira min hat bidawîkirin[...] Belê, ji teref rektoriya zanîngehê [...] Ew çax Kemal Biyikoglu bû[...][14]

Wekî di vê jêgirtinê de jî tê dîtin, ji bo Beşikci bikaranîna têgehên wekî kurd, kurdî û beşdariya Mîtîngên Rojhilat, ji teref îdareya zanîngehê wekî sûc hatine qebûlkirin. Di vê qonaxa tawanbariyê de xwendekarên neteweperest ên tirk jî roleke çalak dilîzin û mamosteyê xwe bi îdareya zanîngehê gilî dikin. İsmail Beşikci, piştî karê wî yê li Zanîngeha Erzurum Ataturkê bi vî awayî hatiye bidawîkirin, ezmûna

13 Malmîsanij (2011) Bu Kürtleri Nereden Çıkardın İsmail Beşikci? Vate Yayınevi.

14 Malmîsanij (2011) Bu Kürtleri Nereden Çıkardın İsmail Beşikci? Vate Yayınevi, ss.21-30.


İSMAİL BEŞİKCİ
UNESCO'YA MEKTUP
İSMAİL BEŞİKCİ
TÜRK TARİH TEZİ
"GÜNEŞ-DİL TEORİSİ"
VE
KÜRD SORUNU
Bilim Yöntemi Türkiye'deki Uygulama-II
İBV
İSMAİL BEŞİKCİ VAKFI
2. BASKI
İSMAİL BEŞİKCİ
DEVLETLERARASI SÖMÜRGE
KÜRDİSTAN
POLİS MEMURU

asîstaniyê ya li beşa Sosyolojiya Fakulteya Zanyariyên Siyasî ya Zanîngeha Ankarayê vebûyî qezenc kiriye û di sala 1971an de li Zanîngeha Ankarayê dest bi kar kiriye. Piştî li vê zanîngehê dest bi kar kiriye derbeya leşkerî ya 1971an pêk hatiye. Piştî derbeya leşkerî dema li fakulteyê bûye, hatiye desteserkirin û bi daxwaza Fermandariya Birêveberiya Awarte ya Diyarbekirê pêşî hatiye şandin bo Girtîgeha Rêveberiya Awarte ya Diyarbekirê, piştî ku Dadgeha Bilind a Leşkerî biryara mehkûmiyetê tesdîq kiriye jî şandine bo Girtîgeha Sûrîçiya Diyarbekirê. Dr. Beşikci, di heman hevpeyvînê de aniye ziman ku kesên wî bi Fermandariya Birêveberiya Awarte ya Diyarbekirê gilî kirine rektor, dekan û xwendekarên Zanîngeha Erzurum Ataturkê bûne:


> Anku li gor wan dosyeyên lêpirsîna îdarî, ez li Fakulteya Zanyariyên Siyasî hatim desteserkirin, û birin bo Diyarbekirê. Kesên ku ez bi fermandariyên rewşa awarte îxbar kirime, rektor bi xwe, dekanê Fakulteya Fen-Edebiyatê, dekanê Fakulteya Çandiniyê, dekanê Fakulteya Tibbê ne. Rektor û dekan îxbar dikin. Ligel vê, hin profesorên din jî hene di wê daxwaznameya îxbarê de. Herwiha, xwendekarên MHPyî jî hene. Anku, bi giştî yên dersa sosyolojiyê dixwînin. Anku nêzikê şêst kesî dibêjin "Beşikci dabeşkeriyê dike, Beşîkcî behsa hin kesên bi navê kurd dike, Beşîkcî îxanetê li welatî dike[...]" Îxbarên bi vî awayî.[15]

Wekî tê dîtin, ji rektor ta xwendekaran, hermû derdorên li zanîngehê bi armanca cezakirina Beşikci ya ji ber fikrên wî hereket kirine. Qonaxa dirêj a girtîgehan ji bo İsmail Beşikciyê ku cara yekem di 1971an de ket girtîgehê, wisa dest pê kir. Ji sala 1971an ku cara yekem ket girtîgehê heta sala 1999an ku cara dawî ji girtîgehê derket, ji xebatên xwe yên rexneyî yên li hember Teza Dîroka Tirkî, bo nimûne, ji kîtêbên xwe yên *Îskana Mecbûrî ya Kurdan (Kürtlerin Mecburi İskanı), Name bo UNESCOyê (UNESCO'ya Mektup), Mêtingeha Navdewletî Kurdistan (Devletlerarası Sömürge Kürdistan)* û metnên nivîskî û devkî yên parastina xwe ya li hember dadgehê, bi giştî 17 sal û 2 meh li girtîgehê maye.[16]

Ji salên 1970yî heta salên 1990î ku Beşîkcî li girtîgehan maye, anku heta têkoşîna lêgerîna mafên kurdan xurt bû, têgeha kurd nekarî bikeve zanîngehên Tirkiyeyê û nimûneyeke wekî Beşikci derneket. Wekî li xwarê jî tê nîşandan, heya salên 1990î, heta bi taybetî 2000î, Xebatên Kurdî li Tirkiyeyê di bin fişareke giran de mane û birêvebirina xebatên di vê qadê de bi negirtina kar, lêpirsînên îdarî, derxistina ji kar û ketina girtîgehan bidawî bûne.

15 Malmîsanij (2011) Bu Kürtleri Nereden Çıkardın İsmail Beşikci? Vate Yayınevi, s. 31.

16 Di hevdîtina me ya ligel İsmail Beşikci de wî diyar kir ku bi giştî 17 sal û 2 meh li girtîgehê maye. (Hevdîtina ligel İsmail Beşikci, 23ê tebaxa 2020an).



T.C.
İSTANBUL

Örnek : 29

-GIYABİ-

Tutuklama kararını veren mahkeme : İSTANBUL 2 NOLU DGM
Esas veya sorgu numarası : 1993/212
C. Başsavcılığı Hz. numarası : 1993/682

**TUTUKLAMA MÜZEKKERESİ**

**Sanığın :**
Adı ve soyadı : İSMAİL BEŞİKÇİ
Baba adı :
Ana adı : ZAHİDE
Doğum yeri : İSKİLİP
Doğum tarihi : 1939
Nüfusa kayıtlı olduğu yer : Çorum, İskilip ... Mah.
İkametgâh ve işyeri adresi : Ankara Etlik Aşağı Eğlence Mercimek Sok. No: 19/16

Sanığın şekli :

Sanığa isnad olunan fiil : 3713 sayılı yasanın 8/1 maddesine muhalefet
Fiilin gerçekleştiği zaman ve yer :

Fiilin kanunda hükme bağlandığı madde...

Suçun ne olduğu ...
kanuni unsurları ...

Tutuklama seb...

C.M.U.K.'nu ... da yazılı sebeplerden dolayı ... için müzekkeredir.

... ve sicil no'su

İsmail Beşikci, di sala 1999an de piştî ku cara dawî ji girtîgehê derket, digel ku ji ber fikir û nivîsên wî yên derbirî gelek doz lê hatine vekirin jî, neketiye girtîgehê. Ew vê rewşê bi rakirina xalên 141 û 142yem ên TCKyê ve girê dide.[17] Wekî li xwarê jî dê were nîşandan, hem têkoşîna lêgerîna mafî ya kurdan a di salên 90î de, hem jî ji ber qanûnên Tirkiyeyê yên li gor çarçoveya guncaniya YEyê revîzekirî û peymanên navneteweyî ku qismeke wan a girîng di 2000an de hatine îmzekirin, mimkun e ku bandora wan a erênî li ser xurtbûna Xebatên Kurdî û bi giştî bandorên erênî yên li ser azadiya derbirînê ya li Tirkiyeyê, bi taybetî heta 2016an were çavdêrîkirin.

## 2.2. Di Salên 1990'i de Têketina Xebatên Kurdî ya Zanîngehên Tirkiyeyê di Salên 1990î de û Geşbûna Qismî ya li 2000an.

Heta salên 1990î ji ber şertên li jor beshkirî, li zanîngehên Tirkiyeyê rêvebirina xebatên akademîk ên bi bikaranîna peyva "kurd" gelek zehmet bûn. Heta vê serdemê, bi dirêjahiya salan, Xebatên Kurdî li qadên derveyê zanîngehê, di bin zextên giran de, ji teref lêkolînerên serbixwe hatin birêvebirin. Di salên 1990î de ji ber pevçûnên çekdarî yên di navbera PKKê (Partiya Karkerên Kurdistanê) û Dewleta Komara Tirkiyeyê de, kurd bûn rojeva yekemîn a Tirkiyeyê. Di salên 1990î de bi bandoreke mezin a têkoşîna lêgerîna mafî ya kurdan jî, qedexeya weşana bi kurdî ji teref dewletê hat rakirin û piştî rakirina vê qedexeyê ronakbîr û rojnamevanên kurd dest pê kirin ku wekî serdema navbera 1960 û 1980yî gelek kovar, rojname û kîtêban biweşînin.

Rûdanên hiqûqî, siyasî û civakî yên salên 1990î, sînorkirî jî be bi awayekî erênî bandor li zanîngehên Tirkiyeyê kir. Bi taybetî jî di salên 2000î de, qada Xebatên Kurdî derket holê ku di bin dîsîplînên cuda yên wekî sosyolojî, tarîx û zanista siyasetê de tê birêvebirin. Hem mobîlîzasyona civakî û siyasî ya kurdan hem jî polîtîkayên proseya endamtiya YEyê yên Tirkiyeyê, bandoreke erênî lê kir ku li zanîngehên Tirkiyeyê ji bo Xebatên Kurdî sînorkirî jî be qadek vebe. Bo nimûne, di sala 2001an de, di nav proseya guncaniya YEyê de, di xalên 13em û 26em ên Makezagona 1982an bi awayekî qismî hatin revîzekirin ku azadiya derbirînê bi awayekî girîng dixistin bin fişarê.[18] Di salên 2000î de mijara kurdan li zanîngehên Tirkiyeyê bû mijareke wisa ku êdî nedibû bihata piştguhkirin û înkarkirin, ji teref hin akademîsyen û xwendekaran dihat meraqkirin.

Mimkun e ku mirov têketina Xebatên Kurdî ya zanîngehên Tirkiyeyê ji agahî-

17 Malmîsanij (2011) Bu Kürtleri Nereden Çıkardın İsmail Beşikci? Weşanxaneya Vate.

18 Di vê mijarê de bnr: Sultan Çamak, Anayasa Mahkemesi ve Avrupa İnsan Hakları Mahkemesi Kararlarına Göre İfade Özgürlüğünün Sınırlanması, İnönü Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi, Özel Sayı, Cilt:2 Yıl: 2015

danka YOKê çavdêrî bike.[19] Li gor agahîdanka ku YOK dabîn dike, teza yekem a ku peyva "kurd" (Kurdish) tê de derbas dibe tezeke îngilîzî ye û li zanîngeheke DYAyê hatiye parastin. Ev teza lîsansa bilind di sala 1993yan de ji teref Adem Hakan Ozoglu hatiye parastin û hatiye teslîmkirin bo YOKê.[20] Sernavê resen yê tezê "Kurdish national discourse: The pkk and the Seyh Said revolt" e (Gotara Neteweyî ya Kurdan: PKK û Serhildana Şêx Seîd). Wergera tirkî ya navê tezê di agahîdankê de nîne û digel ku di teza resen de "PKK" bi tîpên mezin hatiye nivîsîn jî di agahîdanka YOKê de "pkk" bi vî awayî piçûk hatiye qeydkirin. Ev teza lîsansa bilind di heman demê de yekem teza di agahîdanka YOKê de ye ku peyva PKKyê tê de derbas dibe. Zanîngeha ku tez hatiye teslîmkirin wekî "The Ohio State University/Enstîtûya Derveyê Welat" hatiye qeydkirin. Li gor agahîdanka YOKê di salên 1990î de, hejmara tezên ku di sernavên wan de kurd-kurdish derbas dibin, 9 in.

Di Agahîdanka YOKê de Tezên Ewil ku di Sernavên Wan de Peyva "Kurd" Derbas Dibe - Salên 1990î[21]

| Nivîskara/ê Tezê | Sal | Sernavê Tezê | Bername û Zanîngeh |
|---|---|---|---|
| ADEM HAKAN ÖZOĞLU | 1993 | Kurdish national discourse: The pkk and the Seyh Said Revolt (Gotara neteweyî ya kurdan: PKK û Serhildana Şêx Seîd) | Lîsansa Bilind- Ohio State University |
| COURTNEY ÖYMEN (LUKITSCH) | 1994 | The PKK and the 'Kurdish Question' as factors in Turkish-German relations 1984-1994 (PKK û 'Pirsa Kurd' wekî faktorên di nav têkiliyên tirk-alman de) | Lîsansa Bilind- Zanîngeha İhsan Dogramaci Bilkentê |
| GÜZİDE YÜLEK | 1994 | Kuzey Irak'taki Kürtler ve Birleşmiş Milletler Güvenlik Konseyi'nin aldığı kararlar (Kurdên li Bakurê Iraqê û biryarên ku Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî girtiye) | Lîsansa Bilind- Zanîngeha Stenbolê |
| OYA GİRİT | 1994 | Milli Mücadele dönemi Kürtçülük hareketi (Bizava Kurdparêziyê di heyama Têkoşîna Neteweyî de) | Lîsansa Bilind- Zanîngeha Marmarayê |
| FATİH ÜNAL | 1995 | Kürt meselesinin ortaya çıkışı (II. Meşrutiyet Dönemi) (Peydebûna meseleya kurd [Heyama Meşrûtiyeta Duyem]) | Lîsansa Bilind- Zanîngeha Stenbolê |

19 Hemû tezên nivîsandî li agahîdanka online neyên barkirin jî, agahîdanka YOKê seyra giştî ya têkildarê tezan di asteke girîng de nişan dide.

20 Ji bo tezên li derveyê welat parastî û dîplomayên girtî, saziya rayedar YOK e ku hevkêşiya dîplomayê dide. Ji ber vê yeke, ji bo kesên dixwazin hevkêşiya dîplomayê bigirin mecbûrî ye ku tezên xwe yên parastî teslîmê YOKê bikin.

21 Hemû agahiyên vê tabloyê bi awayê ku ji agahîdanka YOKê hatine girtin tên nişandan.

| | | | |
|---|---|---|---|
| EROL KURUBAŞ | 1996 | Türkiye'deki Kürt sorununun uluslararası boyutu (1918-1960) The International dimension of the Kurdish question in Turkey (1918-1960) (Rewşa Navneteweyî ya Pirsa Kurd a li Tirkiyeyê [1918-1960]) | Lîsansa Bilind- Zanîngeha Enqereyê |
| MEHMET ERTÜRK | 1996 | Ermeni-Kürt terör örgütlerinin Türkiye'ye yönelik faaliyetleri (Fealiyetên rêxistinên terorî yên ermenî-kurd yên li dijî Tirkiyeyê) | Lîsansa Bilind- Zanîngeha Inonuyê |
| SUNAY DELİLBAŞI | 1998 | Kürtlerin etnik kökenleri ile ilgili teoriler Theories related to the ethnic origins of Kurds (Teoriyên li ser kokên etnîkî yên kurdan) | Lîsansa Bilind- Zanîngeha Marmarayê |
| VELİ FATİH GÜVEN | 1999 | Türkiye'de siyasi Kürtçülük hareketleri (1923-1995) Kurdish movements in Turkey (1923-1995) (Bizavên Kurdparêziyê yên siyasî li Tirkiyeyê) | Doktora- Zanîngeha Hacettepeyê |

Li zanîngehên Tirkiyeyê peyva kurd encax di salên 1990î de ketiye nav sernavên tezan û hindikbûna nivîsandina tezên 1990î, nîşan dide ku Dewleta Komara Tirkiyeyê û birêveberiyên zanîngehan di qada Xebatên Kurdî de azadiya derbirînê û azadiyên akademîk bi awayekî giran îxlal kirine û fişarek dane ser mijareke wisa heyatî ku di nav sînorên zanîngehan de neyê nîqaşkirin. Tevî ku ev îxlal qewimîne jî ev tez nîşan didin ku di salên 1990î de di qada Xebatên Kurdî de gelek zeîf be jî rûdanên erênî pêk hatine.

Di agahîdanka YOKê de di navbera salên 2000 û 2010an de hejmara tezên ku di sernavên wan de peyva kurd derbas dibin derdikeve 43yan û salên pêş de jî hejmara tezên di vê qadê de bi zêdebûnî dewam dikin. Ji ber vê yekê, salên 2000î ji aliyê dîroka Komara Tirkiyeyê û dîroka zanîngehan ve tê wê maneyê ku gelek veguherînên girîng qewimîne di ware kurdî de. Wekî di beşa yekem a raporê de hatibû diyarkirin, Tirkiyeyê di sala 2003yan de *Peymana Mafên Siyasî û Medenî* ya ji teref Lijneya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî qebûlkirî û *Peymana Navneteweyî ya li ser Mafên Çandî, Civakî û Aborî* îmze kiriye ku parastina azadiyên akademîk, xebatên lêkolîner û xwendekaran bêyî merûzmayînên fişarên siyasî û yên din, bi awayekî azad, li perwerdehiya bilind a xweser û zanîngehan dixe bin temînatê. Di îmzekirina van peymanên navneteweyî de, yên ku azadiya derbirînê temîn dikin û ji bo Xebatên Kurdî cih vedikin; bandora dayîna statûya endamtiyê ya ji teref Yekîtiya Ewropayê, ji bo bi temamî endambûna YEyê û bi taybetî jî reformên bingehîn ên eleqedarê têkiliyên sivîl-leşkeran û bi giştî mafên mirovan hene ku hikûmeta AKPyê ya sala 2002an bûye desthilatdar pêk aniye.

Ji ber vê yekê, pevçûnên çekdarî yên di navbera PKK û dewletê de, di qada siyasî de mobîlîzasyona xurt a kurdan, qanûnên guncaniya YEyê û peymanên navneteweyî ku Dewleta Komara Tirkiyeyê îmzeya xwe daniye binî, faktorên girîng in ku bandor li Xebatên Kurdî dikin. Wekî ev rapora çavdêriyê jî nîşan dide konjonktûra siyasî

ya giştî û polîtîkayên dewletê yên li ser kurdan, bi awayekî zêde bandorê dike li ser akademîsyenên ku di qada Xebatên Kurdî de xebatan dikin. Polîtîkayên rojane yên desthilatdariya siyasî, di rola diyarkerê yekem de ye ji bo îxlalên mafî yên di qada Xebatên Kurdî de diqewimin. Ji ber ku rûdanên siyasî yên behskirî rasterast bandorê li ser îxlalên mafî yên di qada Xebatên Kurdî de dikin û diyarkerên bingehîn in, girîng e ku bi kurtî jî be di vê raporê de behsa van rûdanan were kirin.

Bi taybetî di salên 2000î de, girtina partiyên îslamparêzên siyasal ên serdemên berê ji teref darizandin û saziyên Kemalîst ku parêzvaniya îdeolojiya fermî ya avaker a dewletê dikin, ji kûr ve bandor li polîtîka û vegotinên hikûmeta AKPyê kiriye û ew veguherandine. Bi vî awayî, di destpêka salên 2000î de AKP, li hember Kemalîstên ku partiyên îslamparêz ên siyasal girtine, lê hay bûye ku pêwîst e vegotinên demokrasî û mafên mirovan bi kar bîne.[22] Ligel heft paketên guncaniya YEyê ku CHP jî piştgirî dide, hikûmeta AKPyê reformên bingehîn bi cih anîne ku bi giştî mafên mirovan û têkiliyên sivîl-leşkeran dihewîne. Ji ber ku îdeolojiya Kemalîst di heman demê de xwedan proje û perspektîfa Rojavayîbûn û modernbûnê ye, Kemalîstan reformên AKPyê ku bi gotina entegrasyona YEyê kirî tolere kirine.[23] Ji ber vê yekê, di salên 2000î de, bi heyama salên geşbûna desthilatdariya AKPyê û pêkanîna gelek reformên proseya guncaniya YEyê, Xebatên Kurdî yên li zanîngehên Tirkiyeyê jî pêş ketine.

Ligel pêvajoya guncaniya YEyê, di serdemên sekinandina pevçûnên çekdarî yên di navbera PKK û dewletê de, ji bo avakirina aştî/agirbest/bêpevçûnî û bi armanca dewletê ya ku bi rêya bêçekdarîkirinê rakirina PKKyê, proseya diyalogê ya di sala 2008an de bi dizî destpêkirî,[24] di serdema 2013-2015an de li gelek derdoran bûye sedema hêviyan û di tîrmeha 2015an de ji holê rabûyî, bi taybetî jî di asteke girîng de bandor li ser reformên qada perwerdehiya bilind a kurdî û zimanê kurdî kiriye. Piştî serkeftina girîng a Partiya Civaka Demokratîk (DTP) ya di hilbijartinên herêmî yên adara 2009an de, ji teref hikûmeta AKPyê polîtîkayên "Berfirehiya Kurdan" hat birêvebirin. Di vê hilbijartinê de DTPyê li 8 bajar û 51 bajarokan şaredarî bi dest xistiye (Bianet, 30ê adara 2009an). Ligel ku DTPyê meşrûiyet û hêza xwe ya rayan bi rêjeyeke girîng zêde kirî, AKPyê jî di sala 2009an de gelek reformên çandî pêk anî-

22 Bo vê mijarê bnr: Dagi, İ. D. (2006). The Justice and Development Party: Identity, Politics, and Discourse of Human Rights in the Search for Security and Legitimacy. In H. Yavuz (Ed.), *The Emergence of a New Turkey: Democracy and the AK Parti* (pp. 88-106). Salt Lake City: Utah University Press.
Doğan, E. (2005). The Historical and Discoursive Roots of the Justice and Development Party's EU Stance. *Turkish Studies*, 6 (3), 421-437.

23 Somer, M. & Liaras, E. G. (2010). Turkey's New Kurdish Opening: Religious Versus Secular Values. Middle East Policy, XVII(2), 152-165.

24 Karasu, M. (2013, April 24). PKK ilk kez açıkladı...Oslo'da neler oldu? http://www.aksam.com.tr/siyaset/pkk-ilk-kez-acikladiosloda-neler-oldu/haber-199057

ne. Hin ji van reforman, vekirina qenaleke TVyê (TRT6) ya bi kurdî ya bi piştgiriya dewletê, li girtîgehan kêmkirina sînordariyên bikaranîna kurdî, li hin zanîngehan vekirina beşên Ziman û Edebiyata Kurdî[25] û di sala 2010an de qanûnîkirina propagandaya siyasî ya bi zimanên derveyê tirkî.[26]

### 2.2.1. Beşên Kurdî û Tezên Kurdî yên Ewil Di salên 2010î de

Di nav çarçoveya rûdanên siyasî yên behskirî de, ji sala 2009an pê ve li Zanîngeha Mardin Artukluyê, Muş Alparslanê, Zanîngeha Bingolê, Zanîngeha Dicleyê û Zanîngeha Wan Yuzuncu Yilê beşên Ziman û Edebiyat û Çanda Kurdî û enstîtûyên zimanên zindî hatine vekirin. Herwiha, li Zanîngehên Bingol û Munzurê beşên Ziman û Edebiyata Zazakî hatine vekirin. Tezên ewil ên bi kurdî dîsa di qonaxa piştî 2009an de hatine nivîsandin û teza yekem a bi kurdî di sala 2012an de li Zanîngeha Mardin Artukluyê hatiye parastin û bi awayekî fermî hatiye qebûlkirin.

Di Agahîdankên YOKê de Tezên Ewil ku bi Kurdî Hatine Nivîsandin[27]

| Nivîskara/ê Tezê | Sal | Sernavê Tezê | Bername û Zanîngeh |
|---|---|---|---|
| RAMAZAN PERTEV | 2012 | Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) Ferhenga Menzûm a Kurdî-Farisî (Vekolîn-Tekst)<br>Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) Kürtçe-Farsça Manzum Sözlük (İnceleme-Metin) | Yüksek Lisans Mardin Artuklu Üniversitesi / Yaşayan Diller Enstitüsü / Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı |
| ZÜLKÜF ERGÜN | 2012 | Di Peydabûna Edebiyata Kurdî ya li Cizîra Botan de Karîgeriya Bajarvaniyê<br>Cizîra Botan'da Kürt Edebiyatının Ortaya Çıkışında Şehirleşmenin Etkisi | Yüksek Lisans Mardin Artuklu Üniversitesi / Yaşayan Diller Enstitüsü / Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı |
| EBUBEKİR GÖREN | 2013 | Di romanên Erebê Şemo'de Folklora Kurdî<br>Erebê Şemo'nun Romanlarında Kürt Folkloru | Yüksek Lisans Mardin Artuklu Üniversitesi / Yaşayan Diller Enstitüsü / Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı |
| RAMAZAN ÇEÇEN | 2013 | Di Edebiyata Kurdî de Folklor û Roman li dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn<br>Kürt Edebiyatında Folklor ve Roman Geçmişin Tahayyülleri Etrafında bugünün izleri | Yüksek Lisans Mardin Artuklu Üniversitesi / Yaşayan Diller Enstitüsü / Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı |
| KENAN SUBAŞI | 2014 | Ji bo Zarokan di Fêrkirina Kurdî de Rola Mamikan: Vekolîn - Senifandin<br>Çocuklara Kürtçe Öğretiminde Bilmecelerin Rolü: İnceleme – Sınıflandırma | Yüksek Lisans Mardin Artuklu Üniversitesi / Yaşayan Diller Enstitüsü / Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı |

25 Akil İnsanlar Heyeti Güneydoğu Raporu, (2013). http://file.yeniturkiye.org/Files/Pdf/20130626195417_akil-insanlar-heyeti-guneydogu-raporu.pdf

26 Somer, M. & Liaras, E. G. (2010). Turkey's New Kurdish Opening: Religious Versus Secular Values. Middle East Policy, XVII(2), 152-165.

27 Hemû agahiyên vê tabloyê bi awayê ku ji agahîdanka YOKê hatine girtin tên nişandan.

Ji sala 2009an û vir ve li hin bajarên diyarkirî yên kurdan, bi vebûna beşên kurdî, rê li ber perwerdehiya bi zimanê kurdî û weşanên akademîk ên kurdî vedibin. Tevî ku beriya 2009an qedexe bû akademîsyen di dersan de bi kurdî perwerdehî bidin, ev qedexe bi vebûna beşên kurdî ji hole rabû ku li van beşan perwerdehî bi kurdî bû. Her çi qas ev xebat bi qadên ziman û edebiyatê sînordar be jî ji aliyê dîroka zanîngehên tirk, azadiyên akademîk û Xebatên Kurdî gelek girîng e ku zimanê kurdî li hin zanîngehan bûye zimanê perwerdehiya bilind û nivîsandina tezên bi kurdî dest pê kiriye. Ji aliyê din, wekî li xwarê dê were nîşandan, destpêkirina perwerdehiya bilind a bi kurdî û pêkanîna Xebatên Kurdî li zanîngehan, nayê wê maneyê ku akademîsyenên ku di vê qadê de xebat dikin, di weşanên xwe yên kurdî, tirkî an jî îngilîzî de û di dersên xwe de tûşî fişaran nayên.

## 3. SÎNORDARKIRINA AZADIYA DERBIRÎNÊ YA BINGEHÎN DI QADA XEBATÊN KURDÎ DE: AN SANSÛR Û OTOSANSÛR AN JÎ CEZAKIRIN

Li gor *Biryara Pêşniyarî ya li ser Statûya Personelên Akademîk ên Perwerdehiya Bilind* a UNESCOyê ya 1997an:

Personelên akademîk ên perwerdehiya bilind, xwedan mafê dewamkirina azadiya xwe ya akademîk in. Ev maf; azadiya nîqaş û hînkirina bêyî sînordarkirina li gor doktrînekê, lêkolîna bi azadî û azadiya belavkirin û weşandina encamên vê lêkolînê, azadiya rexnekirina nîzam û saziya ku lê dixebitin, mafê azadiya ji sansûreke dezgehî, azadiya beşdariya organên akademîk ên pîşeyî û temsîlî dihewîne. Divê hemû personelên akademîk ên perwerdeya bilind bibin xwedan mafê bicihanîna peywira xwe ya bêyî tirseke fişara ji dewletê an ji çavkaniyeke din û bêyî merûzmayîna tu awayên cihêkariyê. Ev prensîb, bi xebata personelên akademîk ên perwerdeya bilind ya li derdoreke xebatê ya demokratîk bi temamî dikare bi cih were ku derfet bide vê yekê, anku li derdoreke ku her kes ji bo pêşxistina civakeke demokratîk hewl bide.[28]

Wekî ku ev biryar nîşan dide, di qada navneteweyî de, li gor standardên ji teref UNESCOyê pêşniyarkirî, personelên akademîk xwedan mafê dewamkirina azadiya xwe ya akademîk in û divê akademîsyen dema azadiya xwe ya akademîk biparêzin, bibin xwedan wî mafî ku bêyî tirsa fişara

---


28 Biryara Pêşniyarî ya Têkildarê Statûya Personelên Akademîk ên Perwerdehiya Bilind a UNESCOyê [UNESCO Yüksek Öğretim Akademik Personelin Statüsüne İlişkin Tavsiye Kararı] http://80.251.40.59/politics.ankara.edu.tr/altipar/Yayinlar/Yuksek%20 Ogretim%20Tavsiye.pdf

ji dewletê an ji çavkaniyeke din tevbigerin. Ji bo vê yekê, derdoreke xebatê ya demokratîk lazim e. Ji ber wê, bi awayekî azad pêkanîna xebatên akademîk ên li derdoreke demokratîk a bêfişar, şikil dide mafên bingehîn ên akademîsyenan. Dema bi van krîteran li tecrubeyên akademîsyenên li qada Xebatên Kurdî yên li zanîngehên Tirkiyeyê were nêrîn, tê dîtin ku desthilatdariya siyasî ya li Tirkiyeyê û birêveberiyên zanîngehan ji temînkirina van standardan gelek dûr in. Tevî hin îstîsnayan, li Tirkiyeyê birêveberiyên dewlet û zanîngehan li seranserê tarîxa komarê, li nav konjonktûrên siyasî yên cuda û bi awayên cuda hewl dane ku akademîsyenan di bin kontrol û fişarê de bigirin û biqutifînin. Akademîsyenan an hewl daye xebatên xwe li vê derdora fişarker pêk bînin an jî pêk neanîne û ji zanîngehan hatine dûrxistin.


Li gor hevdîtinên ku me di xebata vê raporê de pêk anîn, mafên azadiya derbirînê û azadiya akademîk yên akademîsyenan, bi polîtîkayên tirsandin û qutifandinê di asteke girîng de hatine îxlalkirin. Ev fişarkerî, pêşî wekî sansûr û otosansûrê derdikeve holê. Hem li gor hevdîtinan hem jî li gor rapirsiyê, sansûr û otosansûr ji aliyê azadiyên akademîk û azadiya derbirînê yên qada Xebatên Kurdî yên li zanîngehên Tirkiyeyê her dem du babetên girîngtirîn pêk tîne. Her çi qas Xebatên Kurdî ji salên 1990î vir ve li zanîngehên Tirkiyeyê hatibe qebûlkirin û ji sala 2009an vir ve dest bi vekirina beşên kurdî hatibe kirin jî, sansûr û otosansûra di weşanên akademîk û tezan de dewam kiriye. Hin beşdaran anîne ziman ku şêwirmendên tezên wan bi nîşandana sedemên cuda pêşniyar kirine ku di sernavên tezan de û heke mimkun be di nav tezê de jî hin têgehan bi kar neînin an jî wan bi xwe di hin mijaran de bi endîşeyên cuda otosansûr kirine.

Li gor beşdaran otosansûr, tevî ku otosansûr pratîkeke şexsî ye ku ji teref mamoste an xwendekarên ku tezê dinivîsin bi hisên şexsî pêk tê, sansûr bi taybetî ji teref şêwirmendên tezan ji xwendekaran tê xwestin. Sansûr û otosansûr bi giranî dema axaftin û nivîsandinê, bi taybetî di mijarên tarîx, erdnîgarî, çandî û zimanî yên aîdê kurdan de, di têgehên hilbijartî de xwe nîşan didin. Herwiha, di rexneya polîtîkayên dewletê yên li Kurdistanê an jî di analîza pevçûna li hember PKKyê de ev sansûr û otosansûr berçav e. Piraniya akademîsyenên ku li qada Xebatên Kurdî xebatên xwe pêk tînin, dema pêkanîna xebatên xwe an jî dema di dersan de fikrên xwe bi xwendekarên xwe re parve dikin hewl didin ku bipîvin û fehm bikin ka kîjan fikir û têgeh sînorên dewletê derbas dikin û ji ber vê dikarin bên cezakirin; kîjan fikir û têgeh “maqûl” û “qebûlker” xuya dikin.

Di rapirsiya xwe de me ji akademîsyenên ku di qada Xebatên Kurdî de xebatên xwe didomînin pirsî ku ka ew di tez, pirtûk, gotarên akademîk û bi giştî di dersên xwe de otosansûr dikin an na. 58 kesên beşdarê rapirsiyê bersiv dane her du pirsan jî.





Wekî di tabloyê de tê dîtin, li gor îfadekirina ji 58 kesan 41 kesî ya pêkanîna otosansûrê di weşanên akademîk de, nîşan dide ku yek ji pirsgirêkên bingehîn ên di qada Xebatên Kurdî de otosansûr e. Di beşên pêş de tê nîşandan ku sansûr û otosansûr bi giranî di kîjan mijar û babetan de tên kirin. Ji aliyê din, ligel weşanan, me hewl da ku em rewşa otosansûra di dersan de jî derbixin holê û me ev pirs ji beşdaran kir:




Wekî li jor jî tê dîtin, ji 58 kesan 37 kesî bersiva "erê" daye vê pirsê. Berbelaviya otosansûrê ku di van bersivan de tê dîtin balkêş e. Piştî van du pirsên di derbarê sansûr û otosansûrê de me ji beşdarên rapirsiyê pirsî ku şêwirmendên wan ên tezê

bi sedema "dê bibe pirsgirêk" li hember tezên wan daxwaza sansûrê kirine an na. Ji 58 beşdaran 54 kesî bersiv da.

**Dema hilbijartina sernavê teza xwe an jî nivîsandina teza xwe ya lîsansa bilind an jî doktorayê ya têkildarê kurdan, şêrwirmenda/ê we yê tezê bi sedema ihtimala bûyîna pirsgirêkê pêşniyar kir an jî hişyarî da ku hûn hin têgeh an îfadeyan bi kar neînin?**




Wekî li vir jî tê dîtin, mîna beşdaran, ji sedî %53.45ên ku bersiv dane rapirsiyê gotine şêwirmendên wan bi rêya hişyarî û pêşniyariyan mudaxeleyê têgehên tezên wan kirine bi sedema ku dikare rê li ber pirsgirêkan vebike. Bersiva "erê" ya ji 23 kesan ji 58 kesî nîşan dide ku beşeke girîng a tezên nivîsandî di nav atmosfereke diltirs û endîşeyî de tên parastin. Ev derdora endîşeyê jî derdixe holê ku fişara desthilatdariya siyasî û birêveberiyên zanîngehan a li ser personelên akademîk giran e. Wekî ji jêgirtinên li xwarê jî dê were dîtin, mijara sansûr û otosansûra di Xebatên Kurdî de bes ne aîdê serdema piştî rewşa awarte ye lê pirsgirêkeke aîdê hemû serdeman e.

### 3.1. Du Têgehên ku Salên Dûr û Dirêj Qedexe Mane "Kurd" û "Kurdistan"

Têgeha "kurd" a ku îdeolojiya fermî ya dewletê bi salan înkar dikir û bikaranîna wê li lêkolînerên serbixwe û akademîsyenên li zanîngehan qedexe kiribû, tawanbarkirin û cezakirina bikaranîna wê di salên 1990î de bidawî bû. Ji ber vê yekê, wekî ku ji tecrubeyên İsmail Beşikci jî tê dîtin, heta salên 1990î têgeha kurd, wekî têgeheke wisa derdikeve pêşberî me ku li zanîngehan rastî sansûr û otosansûrê tê. Ji aliyekî din, her çi qas têgeha kurd bikeve zanîngehan jî wekî ji tecrubeyên Fîkret Başkaya jî dikare were dîtin, cezakirina akademîsyenên ku rexneya Teza Dîroka Tirk a fermî,


îdeolojiya fermî rexne dikin û sînoran derbas dikin di salên 1990î de jî berdewam bûye. Fikret Başkaya, ji ber kîtêba xwe ya bi navê *Îflasa Paradîgmayê Destpêka Rexneya Îdeolojiya Fermî (Paradigmanın İflası Resmi İdeolojinin Eleştirisine Giriş)* ya di sala 1991an de weşandî ji Beşa Aboriyê ya Zanîngeha Abant Îzzet Baysalê hatiye îxrackirin û 15 roj piştî weşana kîtêba wî doz lê hatiye vekirin, ku di kîtêbê de Kemalîzmê, îdeolojiya fermî û polîtîkaya dewletê ya li hember kurdan rexne dike. Piştî proseyeke demdirêj a darizandinê, di sala 1993an de 20 meh cezaya hepsê û herwiha ya pereyan li Başkaya hatiye birîn. Başkaya, ji ber vê kitêba xwe 15 meh li Girtîgehên Ulucanlar û Haymanayê maye (Hevdîtina ligel Fikret Başkaya, 1ê îlona 2020an).

Derket holê ku têgeha kurd, ya ku êdî ne peyveke tabû ye ku li zanîngehên Tirkiyeyê bikaranîna wê neyê xwestin, li zanîngeh û beşên ku akademîsyenên neteweperest ên tirk xurt bin hê jî di nav çarçoveya îdeolojiya fermî de tê sansûrkirin. Bo nimûne, beşdareke/î ku teza xwe di 2009an de parastiye, bi vî awayî anî ziman ku endameke/î juriya teza wî yê/a neteweperestê/a tirk çawa bertek nîşan daye li hember têgeha kurd a di tezê de bikarhatî:

> Ji wê sernavê helbet li gor salname, belgeyên arşîvê û çavkaniyên serdemê, li gor kîtêba Kemal Karpat ya Serjimara Osmanî min pêkhateyên li herêmê nivîsandibûn. Ew qas kurd, ew qas ermenî, ew qas êzidî filan. Mamosteyekê/î gotibû “kurdê çi? Tu nikarî kurd binivîsî!” Min jî got “Divê ez çi binivîsim?” Got “Divê tu bibêjî tirk.” Min got; anku belgeyê tehrîf bikim? Got “Ez jurî me, tu nikarî bersiv bidî min, yê lazim çi be dê ew were nivîsandin!” Min got “Baş e, belgeyê tehrîf bikim?” Ji min re got “Pêkhateyê serdest çi be dê ew were nivîsandin.” Min jî got “Belê, dibe ku pêkhateyê serdest tirk be lê li wir komên cuda yên etnîkî û dînî jî hene. Çima qebûlkirina wê ew qas zor e?” Ya rast pir zêde tehrîk kir, ez jî aciz bûm. Her du mamosteyên din hewl dan ku aram bikin.

Ev bûyer li zanîngeheke dewletê û sala 2009an di juriya tezeke dîrokê de qewimiye. Lewra, tê dîtin ku di sala 2009an de jî têgeha kurd li zanîngehan tê sansûrkirin û heta di tezeke dîrokê de jî tehemmula têgeha kurd nayê kirin. Li vir, kesê ku daxwaza sansûrê dike endameke/î juriya tezê ye. Şêwirmendê tezê xwendekara/ê xwe li hember endama/ê juriyê, ya/ê xwedan vê daxwazê diparêze û beşdar bêyî guherînekê teza xwe diparêze.

Têgeha “Kurdistanê”, ya ne mîna têgeha kurd, heta sala 2009an li zanîngehên Tirkiyeyê bi awayekî giran rastî fişar û qedexeyan hatî, wekî delîlekî sûcê hatiye dîtin û rastî sansûr û otosansûrê hatiye. Wekî di agahîdanka YOKê de bi awayekî


FİKRET BAŞKAYA
PARADİG-
MANIN
İFLASI
RESMÎ İDEOLOJİNİN
ELEŞTİRİSİNE GİRİŞ

eşkere derketiye holê, sansûr û otosansûra li hember têgeha "Kurdistanê" heta sala 2009an bi awayekî giran berdewam kiriye. Taybetmendiya herî girîng a 2009an, "Berfirehiya Demokratîk" e ku ji teref hikûmeta Ak Partiyê wekî "Proseya Berfirehiyê" tê binavkirin, dewletê di polîtîkayên xwe yên li ser kurdan de hin gavên demokratîk avêtiye. Di heman demê de hêza Birêveberiya Herêmî ya Kurdistana Iraqê jî zêde bûye û di wê heyamê de, bi Tirkiyeyê re di nav gelek têkîliyên siyasî û ekonomîk de bûye. Têgeha Kurdistanê ku di navê Birêveberiya Herêmî ya Kurdistanê de derbas dibe bi tena serê xwe pozîsyona tabûyî ya têgeha Kurdistanê bi awayekî girîng guherandiye.

Tezên ewil ku di navên wan de Kurdistan derbas dibin wekî li tabloya xwarê ne. Sernavên tezan û wergerên wan bi awayê li agahîdanka YOKê diyarkirî hatine nivîsandin.

Tezên Yekem ên di Agahîdanka YOKê de ku Sernavên Wan de Peyva "Kurdistanê" Derbas Dibe[29]

| Nivîskara/ê Tezê | Sal | Sernavê Tezê | Bername û Zanîngeh |
|---|---|---|---|
| ZUHAL AY HAMDAN | 2019 | The governmental policies and military methods against the Workers Party of Kurdistan (PKK) in the 1990s<br>1990'lı yıllarda Kürdistan İşçi Partisi'ne (PKK) karşı benimsenen hükümet politikaları ve askeri yöntemler<br>(Di salên 1990î de polîtîkayên hikûmetê û rêbazên leşkerî yên li dijî Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK)) | Lîsansa Bilind-Zanîngeha Ortodogu Teknikê |
| BAŞAK DENİZ ÖZDEMİR | 2012 | Transformation process of Northern Iraq to Kurdistan regional government after the Gulf War<br>Körfez Savaş sonrası Kuzey Irak'ın Kürdistan yerel yönetimine dönüşme süreci<br>(Proseya veguherîna Bakurê Iraqê ya wekî Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê piştî Şerê Kendavê) | Lîsansa Bilind-Zanîngeha Yeditepeyê |
| MİNHANC ÇELİK | 2012 | Turning enemies into friends: The change in Turkey's relations with Kurdistan Regional Government between 2007-2011<br>Düşmanları dosta evirmek: Türkiye ve Irak Bölgesel Kürt Yönetimi arasındaki ilişkilerde 2007-2011 yılları arasında yaşanan değişim<br>(Veguherîna dijminan ya wekî hevalan: Guherîna têkiliyên Tirkiyeyê yên ligel Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê di salên 2007-2011an de) | Lîsansa Bilind-Zanîngeha Fatihê |

29 Hemû agahiyên vê tabloyê bi awayê ku ji agahîdanka YOKê hatine girtin tên nişandan.

| | | | |
|---|---|---|---|
| İBRAHİM SADEDDİN BİRGEĞOLU | 2013 | Sovereignty and identity in the modern Middle East: The pursuit of a sovereign 'kurdistan' in Iraq and Turkey (Wergera tirkî nîn e.) (Serwerî û nasname li Rojhilata Navîn ya modern: Lêgerîna 'Kurdistaneke' serwer li Iraq û Tirkiyeyê) | Lîsansa Bilind- University of London- London School of Economics- Enstitûya |
| HAYAM NORI AWAD | 2015 | Isolation and identification of pathogenic bacteria from drinking and used water samples in the cities of Kahramanmaraj and Duhok, Kurdistan region-Iraq- Kürdistan bölgesi Duhok kentinde, içme ve kullanma suyu örneklerinden patojen bakterilerin izolasyon ve identifikasyonu (Îzolasyon û Îdentîfîkasyona bakteriyên patojen yên ji nimûneyên avên vexwarin û bikaranînê yên li bajarên Mereşê û Duhokê-Herêma Kurdistanê-Iraqê) | Lîsansa Bilind- Zanîngeha Kahramanmaraş Sutçu İmam Derveyê Welat |
| UĞUR BAYRAKTAR | 2015 | Yurtluk-ocaklıks:Land, politics of notables and society in Ottoman Kurdistan, 1820-1890 Yurtluk-ocaklıklar: Osmanlı Kürdistanı'nda toprak eşraf siyaseti ve toplum, 1820-1890 (Yurtluk Ocaklık: Erd, polîtîkayên eşrafan û civaka li Kurdistana Osmanî, 1820-1890) | Doktora-Zanîngeha Boğaziçiyê |

Li gor agahîdanka YOKê bi giştî 42 tez hene ku di sernavên wan de peyva "Kurdistanê" derbas dibin.[30] Wekî li tabloya jorîn jî tê dîtin, hemû tezên ku di sernavên wan de "Kurdistan" derbas dibin tev li ser Birêveberiya Herêma Kurdistanê an jî li ser herêma Kurdistanê ya dema Osmaniyan hatine nivîsandin. Nêrîna hikûmeta AKPyê ya ku heyama Osmaniyan romantîze dike û têkiliyên siyasî û aborî yên di navbera Birêveberiya Herêmî ya Kurdistanê û Tirkiyeyê de, mimkun e ku were gotin, bi awayekî nerasterast bandoreke erênî li ser tabûyên li zanîngehên Tirkiyeyê û helwesta fişarker a dewletê kiriye ku vê helwesta fişarker ji ser peyva Kurdistanê azadiya derbirînê sînordar dikir.

Beriya 2009an ji ber ku peyva Kurdistanê li zanîngehan peyveke qedexe bû, ev peyv bi awayekî giran rastî sansûr û otosansûrê hatiye. Di derbarê qonaxa beriya 2009an de, beşdarekî, di sala 2007an de pêşniyara teza xwe ya ku peyva Kurdistanê dihewîne bi şêwirmendê xwe re parve dike û tiştên qewimîne li xwarê aniye ziman. Ev beşdar di sala 2011an de wekî akademîsyen dest bi kar dike û di serdema rewşa awarte ya 2016-2018an de ji karê xwe yê peywirdariya hîndekariyê ya doktor bi KHKyê tê îxrackirin. Beşdar bawer dike ku sedema îxraca wî ev e ku di civînan de li hember polîtîkayên rektoriyê derketiye û bi giştî ji ber nêrînên wî yên rexneyî ne ku li bin banê zanîngehê dianî ziman. Beşdar, di sala 2007an de piştî ku di pêşniyara teza xwe de peyva Kurdistanê bi kar aniye diyaloga di navbera xwe û şêwirmendê

30 Agahiya 1ê nîsana 2020an.

xwe de bi vî awayî aniye ziman:

> Min tezek nivîsand[…] û bir [cem şêwirmenda/ê xwe yê tezê], me bi hev re xwend. Lê nihêrî, hindik mabû çavên wî biketana ser maseyê, wiha nihêrî. Got "Ev çi ye law?" Min got "proposala tezê." Got "Ev proposaleka çawa ye law?" Min got "Min nivîsand", got "li vir çi dinivîse?" "[…]Ev tez dixwaze polîtîkaya hilweşîner ya tije şîdet a li Kurdistanê derbixe holê." Wiha dest pê dikir û reşnivîseke wiha bû ku ji her sê hevokan carekê Kurdistan, hilweşîn, şîdet û înşa derbas dibû. Wiha nihêrî: "Te wiha nivîsandiye lê heke em vê wiha qebûl bikin, ew dê enstîtûyê bigirin." Min got "Belê, heke digirin bila bigirin." Nihêrî "Welle ez ê te bikujim, tu yê serê me bixî belayê? Bedela çi, dinyayekî teqsîdê malê, erebeyê hene law. Welle ez ê te bikujim. Kurê min binihêre ew dê enstîtûyê bigirin û me tevan jî têxin hepsê." Min got "Êê em çi bikin?" Got "Nerm bike law vê." Lê tiştekî dizanim, pirsgirêkeke [şêwirmendê tezê] bi wan tezan tune bû, dizanibû ku rast in. Paşê hemû Kurdistan bûn cihên ku kurd lê dijîn[…] Piştî 2,5 saetan em çûn juriya pêşniyarê. Xweşbextane [şêwirmendê min ê tezê] zêde piştgiriya min kir, […] mamoste hebû ew çax, mêrekî xas bû, dîroknas. Wî jî heqeten zêde piştgirî da.

Wekî di vê serpêhatiyê de jî tê dîtin, di sala 2007an de peyva "Kurdistanê" ji teref şêwirmendekî tezê tê sansûrkirin ku ew jî piştgirî dide vê nîqaşê û heta bi awayekî şexsî dikare bikaranîna vê têgehê qebûl bike. Li vir, sedema daxwaza sansûrê, wekî endîşeya derxistina ji kar, endîşeyên ekonomîk, endîşeya ketina girtîgehê û ya girtina enstîtûyê derdikeve holê. Îro, ji ber endîşeyên bi vî awayî bicihanîna sansûr û otosansûrê li qada Xebatên Kurdî yên li zanîngehên Tirkiyeyê bi awayekî berbelav dewam dikin. Faktorên herî girîng yên ku azadiya derbirînê û azadiya akademîk ên li zanîngehan asteng dikin, wekî polîtîkayên cezakirinê yên dewletê derdikevin holê ku bi salên dûr û dirêj azadiya derbirînê sînordar kirine.

Ji sala 2009an vir ve têgeha Kurdistanê her çi qas ji teref YOKê were qebûlkirin jî di demên cuda de birêveberiyên zanîngehan, lijneyên weşanê yên kovarên akademîk û komîteyên organîzasyona konferansan dikarin wan weşan an jî daxuyaniyan red bikin ku vê têgehê bi kar tînin. Bo nimûne, beşdarekê/î anî ziman ku di sala 2012an de ji bo konferanseke tarîxê jê hatiye xwestin ku sernava danezana xwe biguherîne, ya ku tê de peyva Kurdistanê derbas dibe. Beşdar vê yekê red dike. Piştî nîqaşê beşdar danezana xwe vedikişîne û dev ji beşdarbûna konferansê berdide. Lewra, astengkirina bikaranîna têgeha Kurdistanê, tevî ku YOKê bikaranîna vê têgehê di sîstema xwe de qebûl kiriye jî bi rêbazên cuda, di qadên cuda de berdewam e.

### **3.2.** Hin Mijar û Têgehên ku Îro di bin Fişarê de ne:

Di dema lêkolînê de, beşdaran anî ziman ku her çi qas li agahîdanka YOKê neyê dîtin jî di qada Xebatên Kurdî de hin têgeh hene, tevî ku bê xwestin jî nikarin were bikaranîn. Hat dîtin ku ev têgeh di çarçoveya Xebatên Kurdî de têgehên "Bakurê Kurdistanê, "mêtingeh", "kolonî" an jî "dij-kolonyal" in.

Di derbarê têgeha mêtingehê de beşdarekê/î ku teza xwe bi kurdî nivîsandiye têkildarê têgeha "dij-kolonyal" a di sernavê teza xwe de serpêhatiyeke wisa parve kir:

> [...]mamosteyeke/î doktor ê di vê lijneyê de pêşniyar kir: got "Ji kerema xwe şaş fehm neke, ji bo min tu pirsgirêk nîn e lê dij-kolonyalê bikar neîne." Min got "çima?". Got "niha em her sê, sê doktor, qebûl dikin lê sibe dusibe dê du profesor bi awayekî mecbûrî bikevin parastina te. Em dê van her duyan ji derve hilbijêrin, ji ber ku em ji hundir in lê yên din ji derve hildibijêrin. Sibe dusibe şêwirmendê te biguhere, keseke/î din were, şêwirmenda/ê te vê qebûl neke, tu dê her tiştî binîvîsî lê ew dê her tiştî ji nû ve bi te bide nivîsandin, tu yê bikevî bin barekî wisa. Em ê jî xemgîn bibin. Ji bo ku em li tiştên wisa rast neyên di derbarê naverokê de tiştekî nabêjim lê vê ji sernavê derxe. Tu yê binivîsî, sibe dusibe tu yê teqez bikî kîtêb, dema te kir kîtêb tu yê dîsa wisa binivîsî." Ji min re maqûl xuya kir. Ez rastê otosansûreke wisa hatim. Di derbarê naverokê de tiştek negot lê bes ji bo sernavê pêşniyareke wisa kir, ji ber ku "Yên ku vê sernavê bibînin dê ji naverokê bitirsin. Dê fehm nekin tu li ser ziman û edebiyatê dixebitî."[...] Min "dij-kolonyalê" ji sernavê derxist.
>
> Li vir jî dîsa tê bilêvkirin ku derxistina peyva "dij-kolonyalê" bi niyeteke baş, bi armanca "parastinê" tê pêşniyarkirin. Di dema hevdîtinan de, li zanîngehên Tirkiyeyê sansûr û otosansûra van têgehan gelek girîng e, tevî ku di lîteratûra akademîk a cîhanê de bi hêsanî dikarin werin bikaranîn. Beşdareke/î din jî di derbarê têgeha Bakurê Kurdistanê de nêrînên xwe parve kirin. Ev beşdar yek ji wan akademîsyenan e ku piştî 2016an bi KHKyê ji karê xwe hatiye dûrxistin. Sedema derxistina xwe ya ji kar wekî nêrînên xwe yên muxalîf yên bilêvkirî diyar kir:
>
> Niha em bibêjin ez ê di teza xwe de tiştekî binivîsim, helbet dê bibêjim Bakurê Kurdistanê. Dibêjim Bakurê Kurdistanê. Mesela tu bibêjî Kurdistan ev êdî hinekî maqûl e lê dema tu dibêjî Bakurê Kurdistanê ev hê jî ji bo gelek kesan nayê qebûlkirin.

Akademîsyenekê/î ku diyar kir di serdema rewşa awarte de pêşî di derbarê wê/î de gotegotên bêbingeh ên wekî "PKKyî" derketine û paşê jî ji teref rektor hatiye mecbûrkirin ku îstîfa bike, ji bo mijara sansûr û otosansûrê ev gotin anîn ziman:

> Min dixwest di kîtêbê de behsa gelek tiştên cuda bikim, me gelek zêde sansûr û otosansûr kir. Mesela min di wê xebatê de nekarî behsa wan tiştan bikim ku bandor li bîra kolektîf kirine. Bîreke polîtîk ya xas ya herêmê heye, mesela gund hatine valakirin lê hûn nikarin behsa sedemên wê bikin. Mixabin, tu bi awayekî gelek xemgîn mecbûr dimînî bibêjî "heyama terorê" lê tu mecbûr dimînî, ji ber ku min bi rastî jî dixwest ev xebat derbikeve. Gerçî vê gotinê min di kitêbê de bi kar neanî lê têgehên "bûyerên melûm", "pevçûnên li herêmê" bi kar anî.

Akademîsyenên ku dixwazin PKKyê, ku bi salan e bi dewletê re di nav şerê çekdarî de ye, bixin nav axaftin û xebatên xwe rastê astengiyên zimanî tên. Zanîngeh jî wekî dewletê li bendê ye ku akademîsyen dema rêxistinê pênase bikin têgeha "terorê" bi kar bînin û terorê şermezar bikin. Ji ber vê sedemê, analîza şerê çekdarî yê di navbera PKKê û dewletê de, rewşa têkiliya di navbera PKKê û kurdan de, babetên girîng ên din in ku li zanîngehan bi awayekî azad nayên nîqaşkirin.

Metna "Em ê nebin hevparên vî sûcî!" ya ku li xwarê dê were behskirin jî metneke wisa ye ku bi îxraca gelek akademîsyenan ya ji zanîngehan bidawî bûye. Bi vê metnê akademîsyen di mijara awayê nîqaşkirina pevçûnên di navbera PKKê û dewletê de û awayê girtina helwestê ya li hember van pevçûnan de derketine derveyê sînorên dewletê û paşê jî beşeke wan a mezin bi awayekî giran hatine cezakirin. Lewra, li zanîngehên Tirkiyeyê, ji aliyê Xebatên Kurdî "analîza pevçûnê" û polîtîkayên dewletê ên li Kurdistanê bi kîjan têgehan û çawa tên nîqaşkirin, yek ji meseleyên bingehîn e.

### 3.3. Danezana "Bu suça ortak olmayacağız!" "Em ê nebin hevpaên vî sûcî!" û Cezakirina Akademîsyenên Îmzekar

Li gor *Biryara Pêşniyarî ya li ser Statûya Personelên Akademîk ên Perwerdehiya Bilind* a UNESCOyê ya 1997an:

> [...] divê hemû personelên akademîk ên perwerdehiya bilind bibin xwedan mafê fikrî, wijdanî, dînî, derbirînê, civînê û rêkxistinbûyînê; û maf û ewlehiya şexsî û azadiya seyahatê. Divê bikaranîna mafên şexsî yên endamên hîndekariyê neyên astengkirin. Tevkari-

ya guherîna civakî jî di nav vê bergehê de ye; bi rêya îfadekirina nêrînên xwe yên di derbarê siyaseta welat de û biryarên siyasî de ku bandor li ser perwerdehiya bilind dikin. Divê personelên akademîk ên perwerdehiya bilind bi awayekî keyfî neyên girtin, desteserkirin, rastê îşkence, zilm, muameleya dermirovî û bêrûmetiyê neyên. Dema mafên wan bi awayekî giran werin îxlalkirin divê personelên akademîk ên perwerdehiya bilind bibin xwedan mafê muraceata bo saziyên neteweyî, herêmî û saziyên Neteweyên Yekbûyî û hemû rêxistinên ku personelên perwerdehiya bilind temsîl dikin piştgiriya kamil bidin wan.

Piştî danezana bi sernavê "Em ê nebin hevparên vî sûcî!" *"Bu suça ortak olmayacağız"* a ku bi du zimanan hat weşandin û nêrînên di derbarê siyaseta welat de dianî ziman, tiştên ku ji teref dewletê hatin serê akademîsyenan gelek prensîban îxlal dike. Wekî li xwarê dê were nîşandan, akademîsyen rastê gelek îxlalên mafên mirovî hatine ku di jêgirtina jor de hatine diyarkirin. Wekî bi awayekî eşkere hatiye nivîsandin personelên akademîk di derbarê biryarên siyasî de, yên ku bandor li siyaseta welat dikin, divê bikaribin bi awayekî serbest nêrînên xwe bînin ziman û bi vî awayî bibin xwedan mafê tevkariya guherîna civakî û ji ber vê yekê neyên cezakirin.

Danezana "Em ê nebin hevparên vî sûcî!" 6 meh beriya rejîma rewşa awarte, 11ê Çileya 2016an de bi raya giştî re hat parvekirin û di qonaxa yekem de ji teref 1128 kesan, di qonaxa duyem de jî ji teref 2212 akademîsyen û xwendekarên doktorayê[31] hat îmzekirin; bertekên fişarker û cezakar ên desthilatdariya siyasî bi qasê akademîsyenên qadên cuda, bi awayekî girîng bandor li wan akademîsyenên îmzekar kiriye ku di qada Xebatên Kurdî de xebatên xwe bi rê ve dibin. Di destpêka raporê de hat diyarkirin ku hem ji akademîsyenên ku me ligel wan hevpeyvîn kirî hem jî ji yên ku beşdarê anketê bûne, çend ji wan ji ber danezanê ji zanîngehan îxrac bûne. Wekî di beşa destpêkê de jî tê dîtin, gelek akademîsyenên ku di qada Xebatên Kurdî de lêkolîn dikin ev danezan îmze kirine û di asteke girîng de di bin bandora îxlalên mafî yên piştî danezanê de mane.

Danezana "*Bu suça ortak olmayacağız!* Em ê nebin hevparên vî sûcî!"[32] ji bo dîroka têkiliyên tirk û kurdan û bandora van têkiliyan a li dîroka zanîngehên Tirkiyeyê girîng e. Di dîroka zanîngehên Tirkiyeyê de cara yekem e ku gelek xebatkarên zanîngehan, yên ji dîsîplîn û pozisyonên akademîk ên gelek cuda, akademîsyen û xwendekarên doktorayê yên tirk, kurd û ji komên din ên etnîkî, danezaneke bi kurdî û tirkî ya ku polîtîkayên dewletê yên li hember kurdan, bi awayekî eşkere û tund

31 Xwendekarên doktorayê jî di nav akademîsyenan de ne.

32 Ji bo naveroka danezanê û bêhtir agahiyên di derbarê nîqaşan de bnr. https://tr.wikipedia.org/wiki/Bar%C4%B1%C5%9F_%C4%B0%C3%A7in_Akademisyenler_bildirisi

rexne dikin, bi awayekî îmzekirî, li qada giştî, bi kurdî û tirkî parve dikin.

Xwediyên îmzeyan di qonaxa pevçûnên çekdarî yên li Sûr, Nisêbîn, Cizîr û Silopiyê de ku bi piraniya niştecihên wan kurd in, polîtîkayên dewletê rexne dikin û bang li dewletê dikin ku hem li gor hiqûqa xwe ya hundirîn û hem jî li gor hiqûqa navneteweyî tevbigere.

Piştî parvekirina vê danezanê bi raya giştî re, Serokkomarê wê demê Receb Tayîb Erdogan bi civîneke çapemeniyê danezan wekî "îxanet" û "piştgiriya terorê" nirxandiye, akademîsyenên ku ev danezan îmze kirî jî bi sifatên wekî; "qaşo ronakbîr", "muswedeyên ronakbîr", "cahil", "tarî" û "mandater" piçûk xistine.

Piştî vê axaftinê, di serî de çapemenî û gelek mihraqên cuda li hember akademîsyenên îmzekar dest bi propaganda û êrişan kirin. Piştî axaftina Serokkomar, demildest, di heman rojê de, anku roja 12 çileya 2016an, Lijneya Giştî ya YOKê di derbarê mijarê de civîneke acîl li dar xistiye û piştî civînê bi daxuyaniyekê ragihandiye ku dê di derbarê akademîsyenên îmzekar de ligel rektoran civîn werin lidarxistin û "tiştê lazim dê were kirin":

> Danezana ku ji teref komeke akademîsyenan hatiye belavkirin û têkoşîna dewleta me ya li hember terorê ya li Başûr-rojhilat wekî "qetlîam û qirê" binav dike, hemû derdora akademiyê di bin gumanê de dihêle. Li tu welatekî demokratîk pîşe û statûya kesên ku piştgirî didin terorê îmtiyaz nade kesê, piştevaniya ji bo terorê nayê piştguhkirin. En danezana ku piştgiriyê dide terorê, bi azadiya akademîk ve nayê girêdan. Temînkirina ewlehiya hemwelatiyên me erka bingehîn a dewletê ye. Ji bo vê danezanê çi lazim be dê di çarçoveya hiqûqî de were kirin. Em dê ligel rektorên xwe û Lijneya Navzanîngehî, ji bo nirxandina vê mijarê bicivin. (*Sözcü*, 12ê çileya 2016an.)[33]

Li gor vê daxuyaniya YOKê polîtîkayeke fişarê û cezakirinê yên ji teref birêveberiyên zanîngehan li hember akademîsyenên îmzekar pêk hatiye. Dozgeriyê li hember gelek akademîsyenan bi îdiaya "propagandaya rêxistina terorê" doz vekiriye. Her çi qas hemû îmzekar ji heman proseyê derbas nebin û di tecrubeyên wan de gelek cudahî hebin jî akademîsyenên îmzekar rastê gelek îxlalên mafî hatine, yên wekî heps, desteserî, îxrackirina ji kar, vekirina lêpirsînên dîsîplînê, vekirina dozan, zordariya îstîfayê, zordariya vekişandina îmzeyê, sînorkirina pasaportê, qedexeyên derketina derve. Tiştên ku dewletê aniye serê akademîsyenan, bi temamî li dij *Biryara Pêşniyarî ya li ser Statûya Personelên Akademîk ên Perwerdehiya Bilind* a UNESCOyê ye ku di destpêka vê beşê de hatibû nîşandan.

33 https://www.sozcu.com.tr/2016/gundem/cumhurbaskani-erdogan-suriye-kokenli-bir-canli-bomba-saldirisi-oldugu-degerlendirilen-teror-olayini-esefle-kiniyorum-3-1039871/

Ji ber ku li ser îxlalên mafî yên akademîsyenên îmzekarê danezana “Em ê nebin hevparên vî sûcî!” gelek rapor hatine amadekirin dê di vê raporê de ev mijar bi hûrgilî neyê nirxandin. Ji bo agahiyên bi hûrgilî yên li ser mijarê, raporên li jêrnotê dikarin werin vekolîn.[34] Herwiha, îxlalên mafî yên ji teref Akdemîsyenên Aştîxwaz di navnîşana https://barisicinakademisyenler.net/node/314 birêkûpêk tên rojanekirin.

Hemû îxlalên mafî yên ku di vê sernavê de tên behskirin bi temamî li dij xala 19emîn a *Peymana Mafên Medenî û Siyasî* û xala 10emîn a *Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê* ye.

Kiryarên cezakar ên dewletê, yên ku bi vî awayî azadiyên akademîk û azadiya derbirînê asteng dikin, di heman demê de peyameke girîng e ji bo akademîsyenên qada Xebatên Kurdî ku nîşan dide divê di xebatên xwe yên akademîk û dersên xwe de çi bibêjin û çi nebêjin.

Nayê zanîn ku çend kesên di qada Xebatên Kurdî de dixebitin ev danezan îmze kirine. Lê ji aliyekî din, hem di rapirsî hem jî di hevdîtinan de derketiye holê ku akademîsyenên ku di vê qadê de xebatan pêk tînin rastî piraniya îxlalên mafî hatine. Bo nimûne, hin akademîsyenên îmzekar ên ku me ligel wan hevdîtin kirî ji kar hatine dûrxistin, hinek jî nehatine dûrxistin. Ji beşdaran 9 kesî danezan îmze kirine û ji 9 kesan 4 kes bi KHKyan ji karê xwe îxrac bûne, 1ê îstîfa kiriye û peymana yekê nehatiye dirêjkirin. 3 kesên îmzekar jî li karê xwe dewam dikin. Bi heman awayî, di rapirsiyê de ji 58 kesan 17 akademîsyenî dane zanîn ku ji ber îmzekirina danezanê bi KHKyê ji karê xwe îxrac bûne.

Yek ji akademîsyenên îmzekar ku me ligel hevdîtin kirî, anî ziman ku dema li hember biryara dûrxistina ji zanîngehê daxwaznameya îtirazê daye Komîsyona Rewşa Awarte ji ber ku nizanibûye sûcê wî çi ye, wî bi xwe sûc li xwe bar kirine û xwe parastiye. Beşdar bêyî ku bizanibe bi çi tê sûcdarkirin û kîjan kiryar û gotinên wî wekî sûc hatine hesibandin, mecbûr maye ku xwe biparêze. Ev rewş, di serî de

34 Hin raporên girîng ev in:
• Barış İçin Akademisyenler Davasının Kısa Tarihi 11 Ocak 2016-11 Ocak 2019, TİHV Akademi • Academic Purge in Turkey Human Rights Violations, Losses, and Empowerment, Human Rights Foundation in Turkey, 2019 https://tihvakademi.org/wp-content/uploads/2020/02/Academic_Purge_in_Turkey_Executive_Summary.pdf
• Akademisyen İhraçları, Hak İhlalleri, Kayıplar ve Güçlenme Süreçleri, 2019 https://tihvakademi.org/wp-content/uploads/2020/02/akademisyenihraclariy.pdf
• Barış İçin Akademisyenler Dayanışma Grubu Raporu, 2019, https://barisicinakademisyenler.net/sites/default/files/Bakraportr041219.pdf
• Üniversitenin Olağanüstü Hâli, Akademik Ortamın Tahribatı Üzerine Bir İnceleme, • Serdar Tekin, Türkiye İnsan Hakları Vakfı, 2019, https://tihvakademi.org/wp-content/uploads/2020/02/universiteninolaganustuhaliy.pdf
• Bilim Akademisi Akademik Özgürlükler Raporu 2016-2017g
• https://bilimakademisi.org/wp-content/uploads/2017/07/bilim-akademisi-akademik-ozgurluk-ler-raporu-2016-2017-agustos-9.pdf

îxlala "karîneya mesûmiyetê" û "mafê darizandina adilane", îxlalkirina prensîbên bingehîn ên hiqûqê nîşan dide.

> Ez ji we re behsa parastina xwe bikim, belkî hûn baştir fehm bikin. Dosyeyek li holê nîn e, bes ji ber ku têkiliya we bi "terorê" heye we ji kar diavêjin. Ji ber ku dosye nîn e min parastina xwe wisa nivîsand: Muhtemelen we ji ber vê ez ji kar avêtime, parastina min a di derbarê wê de ev e. Sedema duyem dibe ku ev be, parastina min a duyem ev e. Ya sêyem dikare ev be, bi vî awayî min çar-pênc "îdiayên sûcê" yên muhtemel derxistin holê. [...] Pêşî ji we dixwazin ku hûn li sûcekê texeyul bikin, ji xwe re hêmaneke sûcê bifikirin, paşê jî hûn di derbarê wê de parastinê dikin. Trajîkomîk.

Akademîsyenên ku di qada Xebatên Kurdî de xebatan bi rê ve dibin û yên qadên din, di proseyên mîna hev re derbas bûne. Di vê mijarê de ji ber ku gelek rapor hatine weşandin, di vê raporê de di çarçoveya danezana "Em ê nebin hevparên vî sûcî!" de îxlalên mafî bi hûrgilî nehatine behskirin.

### 3.4. Li Beşên Ziman û Edebiyata Zazakî Fişara li ser Nîqaşên Zazabûn, Kurdbûn û Zazakiyê

Nîqaşên di derbarê zazayan de di çarçoveya polîtîkayên înkar û asîmîlasyonê de dest pê kirine û li gor zazayên ku xwe wekî kurd pênase nakin, argumanên têkildarê nekurdbûna wan hatine derxistin. Di vê heyamê de hatiye hewldan ku stratejiya kevn di akademiyê de dîsa were zindîkirin.

Di hevpeyvînan de derket holê ku îxlaleke girîng a azadiya derbirînê û azadiya akademîk jî di derbarê beşên Ziman û Edebiyata Zazakî de ye. Beşên Ziman û Edebiyata Zazakî bes li du zanîngehan hene, li Zanîngeha Munzurê ya Dêrsimê û Zanîngeha Bingolê ya Çewlikê. Ji aliyekî din li zanîngehên ku beşên Ziman û Edebiyata Kurdî hene zaravaya zazakî-kirmanckî-dimilkî-kirdkî wekî derseke cuda tê xwendin. Zarava an jî zimanê zazakî-kirmanckî-dimilkî-kirdkî ji ber ku di tirkî de wekî *Zazaca* tê zanîn, di tirkiya vê raporê de dê wekî *Zazaca* derbas bibe.

Di hevdîtinan de ne mîna kurdî-kurmancî, zazakî wekî qadeke wisa derket holê ku di derbarê wê de gelek nîqaş hene. Bo nimûne, ji alfabeya ku ji teref Celadet Alî Bedirxan hatiye pêşxistin, ya ku ji teref nivîskar û akademîsyenên kurd tê qebûlkirin, û wekî alfabeya kurdî tê binavkirin, bi awayekî cuda di zazakiyê de alfabeyên cihê tên bikaranîn û di alfabeya zazakî de standardîzayonek tine ye.

Akademîsyenên ku di derbarê beşên zazakî de me ligel wan hevpeyvîn kir, anîn ziman ku di mijara alfabeya zazakî de gelek nêrînên cuda hene. Ji van nêrînan sê

heb derdikevin pêş. Ji van yek *"Alfabeya Kurdî"* an jî *"Alfabeya Bedirxan"* e ku di salên 1930î de ji teref Celadet Alî Bedirxan hatiye pêşxistin. Ev alfabe, di serî de *Komxebat û Weşanxaneya Vateyê* ya gelek tevkariyên girîng li lîteratûra zazakî kirî, ji teref weşanxaneyên wekî *Avesta, Nûbihar, Peywend* û *Rûpel*ê tê bikaranîn. Alfabeya din, ya ku wekî *Alfabeya Jacobson / Ware* tê binavkirin, cara yekem di serdema piştî 1980yan, di kovarên wekî Ayre (1985-87), Piya (1988-1992), Ware (1992-2003) de hatiye bikaranîn û di sala 1993yan de li gor rêbera rastnivîsê ya Kovara Wareyê û zimanzan C. M. Jacobsonî bi vî awayî hatiye binavkirin.[35] Ligel alfabeyên Jacobson/Ware û Bedirxan ku di nivîsandina zazakî de tên bikaranîn, alfabeyeke din ya ku li zanîngehan derdikeve pêş ew alfabe ye ku ji teref endamê hîndekariyê yê Zanîngeha Munzurê Zulfu Sercan hatiye pêşxistin.

Mesut Keskinê ku di derbarê alfabeya Zazakî de xwedan gotar e, tîne ziman ku ji van her du alfabeyan, alfabeya Bedirxan û Jacobson/Ware, di alfabeya zazakî de xala bingehîn a cudahiyê ne. Ji ber ku ev her du alfabe ji teref derdorên kovaran û weşanxaneyan tên bikaranîn. Bikaranîna van alfabeyan di heman demê de di derbarê kurdbûna zazayan an jî cudahiya zimanê zazakî de îmayên xurt dihewîne. Wekî ku hem Keskin di nivîsa xwe de aniye ziman hem jî beşdaran diyar kiriye, yên ku alfabeya Jacobson/Ware bi kar tînin zazakiyê wekî zimaneke cuda û zazayan (an jî xwe) jî wekî etnîsîteyeke cuda dibînin; yên ku alfabeya Bedirxan bi kar tînin zazakî-kirmanckî-dimilkî-kirdkiyê wekî zaraveyeke kurdî û zazakîaxêvan (an jî xwe) jî ne wekî komeke etnîk a cuda lê wekî kurd pênase dikin. Lewra, maneyên siyasî yên hilbijartina van alfabeyan hene.

Ji alfabeyên navborî yên li jor, tevî ku beşa Ziman û Edebiyata Zazakî ya Zanîngeha Bingolê alfabeya Jacobson/Ware bi kar tîne, beşa Ziman û Edebiyata Zazakî ya Zanîngeha Munzurê alfabeya Zulfu Selcan bi kar tîne. Bikaranîna alfabeyên cuda yên beşên Ziman û Edebiyata Zazakî ya her du zanîngehan, bi awayekî eşkere nîşan dide ku birêveberiyên zanîngehan piştgirî nadin standardîzasyona alfabeya zazakî û cudahî/duberiya navbera alfabeyan bi rêya zanîngehan tê kûrkirin. Hin beşdarên rexnegirê van pratîkan anîn ziman ku bikaranîna du alfabeyên cuda yên li Dêrsim û Bîngolê ji ber armanca dewletê ya kûrkirina cudahiya di navbera Sunniyên Çewlikê û Elewiyên Bingolê ye. Ligel vê yekê, avakirina beşên Ziman û Edebiyata Zazakî bi tena serê xwe nîşan dide ku dewlet zazatiyê wekî etnîsîteyeke ji kurdbûnê cuda û zazakiyê (kirmanckî) jî wekî zimanekî bi temamî ji kurdiyê cuda dinirxîne û li zanîngehan dixwaze vê perspektîfê xurt bike. Lewra, dema ev beş hatine vekirin, ji serî de dewletê û birêveberiyên zanîngehan di vê nîqaşa siyasîbûyî de pozisyonek bijartine. Nêrîna ku zazakîaxêv/kirmanckîaxêv komeke etnîkî ya cuda ne û zazakî/kirmanckî

35 Mesut Keskin (2011), Zazaca Alfabe Sorununa Bir Bakış ve Çözüm Önerisi, "I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu" Bingöl Üniversitesi Yayınları. https://www.researchgate.net/publication/301356467_ZAZACADAKI_ALFABE_SORUNUNA_BIR_BAKIS_VE_COZUM_ONERISI

jî zimanekî ji kurdiyê cuda ye, li beşên Ziman û Edebiyata Zaza yên Zanîngeha Munzur û Zanîngeha Bingolê jî serdest e.

Beşdaran anî ziman ku heyamên ku rektorên fişarker li serî bûn û konjonktûra giştî ya siyasî destûr dida, dewletê û birêveberiyên zanîngehê, li ser akademîsyenên ku ji wan nêrînên jor cuda difikirin, bo nimûne, yên xwe û kesên zimanê wan ê zikmakî zazakî wekî kurd pênase dikin û zazakî jî wekî kurdî pênase dikin, yên ku dixwazin di ders û gotarên xwe de alfabeya Bedirxan bi kar bînin, bi awayên cuda rastê fişarkeriyê hatine. Asta van zordariyan li gor konjonktûrên siyasî yên cuda û serdemên rektoran cuda dibe. Beşdarekê/î anî ziman ku di mijarên zazakî-zazabûn-kurdbûnê de akademîsyenên ku nêrînên wan cuda ne ji nêrînên fermî yên bi piştgiriya dewletê û zanîngehê, bi "kurdparêzî" û "sempatîzaniya terorê" tên sûcdarkirin. Beşdareke/î ku naxwaze navê zanîngeha wê/î were diyarkirin got ku birêvebereke/î zaningehê bi awayekî eşkere gotiye ku kesên zazakî wekî zaraveyeke kurdî bibînin dê li zanîngehê neyên hewandin. Akademîsyenên ku me ligel wan hevpeyvîn kirî anîn ziman ku ji ber cudahiya fikrên xwe sê akademîsyen ji zanîngeha Bingolê hatine îxrackirin. Li aliyekî din, ev îxracên ku hatine behskirin ne di çapemeniyê de ne jî di dosyeyên dozan de cih girtine.

Li gor venêrîna medyayê ya ku di çarçoveya vê raporê de me kirî, ev mijar û nîqaşên ku ji kûr ve têkildarê xebatên etnîsîte û zimannasiyê ne, gelek zêde hatine siyasîkirin û di van nîqaşan de layengiriya rektoran jî bûne nûçe. Bo nimûne, di sala 2015an de xwendekarên Zanîngeha Bingolê li hember zexta polîsan, cezayên dîsîplînê û lêpirsînên li ser xwendekarên Zanîngeha Bingolê ketine greva birçîbûnê. Ev greva birçîbûnê rê li ber nîqaşên siyasî vekiriye. Dema ku greva birçîbûnê hê jî berdewam dikir, rektorê Zanîngeha Bingolê Giyasettin Baydaşê ku greva birçîbûnê rexne dikir, di daxuyaniya bo çapemeniyê de nêrîna xwe tîne ziman ku zaza ne kurd in. Rektorî ev gotin anîn ziman: *"Di vê qonaxê de esasen hin kes li vir ji bo bikaranîna xwendekaran hewl didin. Mesela hûn daxuyaniyên doh bişopînin. Ez li wir tevlî wê fikrê dibim; yên ku di derbarê min de têne îfadekirin, anku beyanateke min heye ku zaza ne kurd in. Rast e. Ez xwedan îdiayeke wisa me, ev min eleqedar dike."*[36] "Axaftinên doh" ên ku rektor behs dike, aîdê Selahaddîn Demirtaşê Hevserokê HDP-yê yê wê çaxê ye. Di qonaxa greva birçîbûnê de, ya xwendekarên Zanîngeha Bingolê li hember fişaran pêk anî, Demirtaş daxuyanekê dide û van gotinan tîne ziman: "*Ji Fakulteya Fenê hatiye, nivîsandiye 'zaza ne kurd in." Ez ji vir bang li rektorê Zanîngeha Bingolê dikim, destên ku li hember zarokan rabin dişikin. Teqez bêyî ku rê li ber provakasyonê vebe, divê mudaxaleyê Zanîngeha Bingolê were kirin."* (*Bingölonline*, 3ê Adara 2015an)[37]

Ji teref akademîsyenên ku me ligel wan hevpeyvîn kirî hat diyarkirin ku aka-

36 https://www.dailymotion.com/video/x2inh5a

37 https://www.bingolonline.com/haber/ogrencilere-kalkan-eller-kirilir-51002.html



Elfabêya
Kurdî
Celadet Alî Bedirxan
Bingehên
Gramêra
BERHEMÊN GISTÎ
НОВЫЙ
Г МЯГКОЕ
ТВЕРДОЕ
О МЯГКОЕ
(ВЕРЕВКА)

demîsyenên ku zimanê wan ê zikmakî zazakî-kirmanckî ye û xwe wekî kurd pênase dikin, zazakiyê wekî zaraveyeke kurdiyê pênase dikin û dixwazin di dersên xwe de alfabeya Bedirxan bi kar bînin, nayên qebûlkirin û dema werin girtin jî ji beşan tên dûrxistin an jî bi rêyên cuda ji wan tê xwestin ku xeta fermî ya zanîngehê bişopînin. Ligel van, di hevpeyvînan de van kiryarên ku azadiya derbirînê ya personelên akademîk sînordar kirî, herwiha li xwendekaran jî bandor dike. Bo nimûne, hin xwendekaran bi hin mamosteyên xwe re parve kirine ku ew nikarin di mijara alfabeyê de bi hin mamosteyên xwe re bi rehetî bikevin nîqaşê, mecbûr dimînin ku alfabeya ji teref zanîngehê tê xwestin bi kar bînin û dema di ezmûn an jî spartekên xwe de alfabeya ji teref îradeya zanîngehê xwestî bi kar neyînin ji hin mamosteyan notên kêm digrin an jî di dersê de dimînin.

### 3.5 Qedexeya Tezên bi Kurdî û Cihêkariya li hember Kurdî li Zanîngeha Dicleyê

Di dema lêkolînê de derket holê ku yek ji girîngtirîn îxlalên mafî yên li beşên kurdî li Zanîngeha Dîcleyê pêk tê. Dema bi beşên Ziman û Edebiyata/Çanda Kurdî yên li zanîngehên din re were miqayesekirin, Zanîngeha Dicleyê di mijara nivîsandina tezên bi kurdî de polîtîkayeke asîmîlasyonkar û fişarker bi rê ve dibe.

Li zanîngehê cara yekem di sala 2012an de li Fakulteya Edebiyatê, di bin beşa Ziman û Edebiyatên Rojhilatî de bi navê “Ziman û Edebiyata Kurdî” şaxek vebûye, lê xwendekar nehatine girtin. Bernameya lîsansa bilind a bêtez di sala 2013an de, bernameyên lîsansa bilind a bitez û doktorayê jî di sala 2015an de vebûne.[38] Tevî ku li zanîngehê li vê beşê bernameya doktorayê vebûye jî, di vê şaxê de îstihdama endamên hîndekariyê nîne. Hema hemû endamên hîndekariyê ku li vê beşê ders didin ji Fakulteya Îlahiyatê hatine. Tevî ku ev her sê bername ava bûne jî, di beşê de bes bernameyên lîsansa bilind û doktorayê çalak in. Lewra, ji ber ku xwendekarên lîsansê nayên girtin, xwendekarên beşê tev ji yên lîsansa bilind û doktorayê pêk tên. Zanîngeha Dicleyê ji ber ku di qada kurdî de xwedan bernameya doktorayê ye, ji aliyê Xebatên Kurdî ve li cihekî gelek girîng e. Li zanîngehên Tirkiyeyê, di qada kurdî de bes du bernameyên doktorayê hene ku yek bernameya doktorayê ya li Zanîngeha Dicleyê, yek jî bernameya doktorayê ya bi hevkariya Zanîngeha Muş Alparslanê û Zanîngeha Bingolê ye. Digel ku li Zanîngeha Mardin Artukluyê qadroya akademîk têrê dike ku perwerdeya doktorayê bidin û karmendên akademîk û xwendekarên lîsansa bilind ji bo vekirina bernameya doktorayê muraceat kirine jî li Zanîngeha Artukluyê di vê qadê de bernameya doktorayê nayê vekirin.

Girîngtirîn îxlala mafî destûrnedayîna nivîsandina tezên doktora û lîsansa bilind a bi kurdî ye ku ev li zanîngehên din nîne, bes li beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Zanîngeha Dicleyê heye û nivîsandina tezên kurdî ji teref rektoriyê di sala 2017an

38 http://www.dicle.edu.tr/tr/duyuru/dicle-universitesinden-kamuoyu-aciklamasi

de hatiye qedexekirin. Beşdaran gotin ku li beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Zanîngeha Dicleyê, hemû ezmûnên nivîskî û devkî bi kurdî tên kirin, mamoste û xwendekar di dersan de kurdî diaxivin, heta ezmûna merîta doktorayê jî bi kurdî tê kirin lê nivîsandina tezên kurdî qedexe ye û ev bi israr tê astengkirin. Lewra, di heman beşê de xwendekarên ku di perwerdehiya xwe de hemû dersan û ezmûnan kurdî dibînin, mecbûr dimînin ku tezên xwe bi tirkî binivîsin. Herwiha, xwendekarên doktorayê yên ku karibûne li zanîngehên din tezên xwe yên lîsansa bilind bi kurdî binivîsin, mecbûr dimînin ku li Zanîngeha Dicleyê tezên xwe yên doktorayê bi tirkî binivîsin. Ev rewş jî hem ji bo beşê û akademîsyenan hem jî ji bo xwendekaran paşketineke akademîk û fişara li ser azadiyên akademîk îfade dike.

Di rêznameya fermî de bi giştî li beşên Ziman û Edebiyata/Çanda Kurdî zimanê perwerdehiyê wekî tirkî tê qebûlkirin. Lê li aliyek din, dema nivîsandina vê raporê, ji bilî Zanîngeha Dicleyê, beşên li zanîngehên din bo nivîsandina tezên lîsansa bilind û doktorayê yên bi kurdî destûr didan û YOKê jî tezên bi kurdî û kirmanckî/zazakî qebûl dikirin. Lewra, tevî ku di mewzûatên fermî de zimanê perwerdehiya van dersan wekî tirkî hatibe binavkirin jî YOK tezên bi kurdî dipejirîne û piştî tezên bi kurdî nivîsandî, xwendekar dikarin dîplomayên xwe yên lîsansa bilind û doktorayê bigirin. Ji ber vê, ji bilî Zanîngeha Dicleyê, li zanîngehên din ji aliyê YOK û zanîngehan, qedexeya tezên kurdî di pratîkê de nayê dîtin.

Zanîngeha Dicleyê, qedexeya nivîsandina tezên kurdî bi rêyên nerasterast, bi guherîna mewzûatên nivîsandina tezan, di sala 2017an de bi cih aniye. Di navbera salên 2015-2020an de ji bo Zanîngeha Dicleyê, bi sernavê *Rêziknameya Ezmûn û Perwerdehiya Serlîsansê ya Zanîngeha Dicleyê* du rêziknameyên cuda di Rojnameya Fermî de derketine. Ji van ya yekem ew rêzikname ye ku di 31ê tîrmeha 2015an de, di rojnameya bi hejmara 29431 de derketiye. Di vê rêziknameyê de di bin sernavê *Beşa Pêncem Bernameya Doktorayê* de, di fiqreya 7em a xala 21an de ji bo nivîsandina tezan ev îbare derbas dibin: *"Di wan bernameyan de ku zimanê perwerdehiyê tirkî ne, xwendekar mecbûr in ku tezên xwe bi tirkî biparêzin. Xwendekarên ku dixwazin dikarin tezên xwe ligel tirkî bi zimanên din jî binivîsin."*[39] Lewra, li gor rêziknameya sala 2015an, sala ku bernameyên lîsansa bilind a bitez û doktorayê vebûne, destûr hatiye dayîn ku xwendekar bi kîjan zimanî bixwazin bikaribin teza xwe binivîsin. Ligel vê rêziknameya sala 2015an weşandî, dema ku agahîdanka YOKê[40] were vekolîn tê dîtin ku di sala 2017an de teza xwendekarekî bi navê Halil İçen, a ku ji serî heta dawî bi kurdî, bi sernavê *"Di Nav Çanda Kurdî de Çîrokêk Sîndrella"* li agahîdanka tezan a YOKê hatiye zêdekirin. Li aliyek din, di agahîdankê de zimanê vê teza kurdî wekî tirkî hatiye diyarkirin. Ev teza ku bes kurteya wê ya tirkî û îngilîzî li agahîdankê barkirî, zimanê wê wekî tirkî diyarkirî lê naveroka wê ji serî

39 https://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2015/07/20150731-2.htm

40 https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/

heta dawî bi kurdî, li Zanîngeha Dîcleyê hatiye parastin û di 13ê çileya 2017an de ji teref YOKê hatiye qebûlkirin.

Çend meh piştî parastina teza kurdî ya Halil İçen, di 4ê hezîrana 2017an de, anku di qonaxa rewşa awarte de, rêziknameyeke duyem ya aîdê Zanîngeha Dicleyê "Rêziknameya Ezmûn û Perwerdehiya Serlîsansê ya Zanîngeha Dîcleyê" di Rojnameya Fermî de hatiye weşandin. Di vê rêziknameyê de xala têkildarê nivîsandina tezan bi temamî hatiye guherandin. Ev xal, di proseya astengkirina nivîsandina tezên kurdî de wekî xaleke wisa derdikeve pêşberî me ku îdareya zanîngehê bi kar tîne. Di bin sernavê "Bingehên Giştî yên Têkildarê Perwerdehiyê" de di fiqreya 18em a xala 23yan de, di derbarê zimanê nivîsandina tezan de ev xal hatiye nivîsandin:

> Zimanê nivîsandina tezê, zimanê perwerdehiya bernameya şopandî ye. Bes bi teklîfa şêwirmend û heke lijneyên rayedar ên enstîtûyê munasîb bibînin tez dikare bi zimanekî din were nivîsandin. Di vê rewşê de, divê şêwirmendê tezê şertên li gor Rêziknameya Têkildarê Hînkirina Zimanên Biyanî û Esasên Hîndekariya bi Zimanên Biyanî diyarkirî bîne cih û ji teref lijneyên rayedar ên enstitûyê munasîb were dîtin. Mecbûrî ye ku tez bi zimanê nivîsandî were parastin. Herwiha, endamên juriyê yên di ezmûna parastinê de peywirdar bin, divê li gor hukmên rêziknameyê werin diyarkirin ku di vê fiqreyê de derbas dibin.[41]

Wekî ku di jêgirtinê de tê dîtin ev xal biryara zimanê tezê dispêre îradeya personelê akademîk ê şêwirmendê tezê û bi esasî jî enstîtûyê. Li gor vê xalê, şêwirmendên tezê divê ji Muduriyeta Enstîtûyê ya di bin zanîngehê de daxwaz bikin an jî destûr bixwazin ku xwendekar bikaribin tezên xwe bi kurdî binivîsin. Lê li aliyekî din, dema xwendekar û şêwirmend daxwazeke wisa dikin, bi sipartina vê xala rêziknameyê, tê diyarkirin ku bi sedema kurdî ne zimanê perwerdehiyê ye, ne jî di statûya zimanê biyanî de ye, daxwaza nivîsandina tezên kurdî ji teref enstîtûyê tê redkirin. Beşdaran anî ziman ku ev xal di beşên wekî Ziman û Edebiyata Erebî, Ziman û Edebiyata Îngilîzî de nayê bikaranîn lê di proseya astengkirina nivîsandina tezên kurdî de tê bikaranîn.

Wekî li jor ji cudahiyên rêziknameyê û astengiyên kiryarê jî derdikeve holê, tevî ku YOK tezên kurdî qebûl dike û li zanîngehên din ji bo tezên bi kurdî bi rehetî dîplomayên lîsansa bilind û doktorayê tê dayîn jî, Rektoriya Zanîngeha Dicleyê bêyî sedemeke qanûnî, bi awayekî keyfî nivîsandina tezên kurdî qedexe kiriye. Wekî beşdaran jî aniye ziman, tevî ku xwendekar û hin karmendên akademîk ên Zanîngeha Dicleyê ev pirsgirêk bi rektoriya zanîngehê û serokên beşê dane zanîn û guheran-

41 https://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2017/06/20170604-14.htm

dina vê pratîkê daxwaz kirine jî, dema ku ev rapor dihat nivîsandin li Zanîngeha Dicleyê pratîkên fişarkeriya li ser kurdî berdewam bûn.

Di dema nivîsandina vê raporê, rojên dawî yên tîrmeha 2020an de, qedexeya tezên kurdî ya li Zanîngeha Dicleyê li ser medyayê û medyaya civakî[42] ket rojevê. Piştî derketina van nûçeyan Rektoriya Zanîngeha Dicleyê, bi armanca nixumandina cudahiyên di navbera pratîkê û rêziknameyê de, daxuyaniyeke çapemeniyê weşand ku qet behsa van cudahiyên rêziknameyê nake û di daxuyaniyê de cih da van gotinan:

> Hatiye dîtin ku di van rojên dawiyê de li derdorên medyaya civakî hin parvekirinên di derbarê "qedexekirina nivîsandina tezên kurdî" ya li zanîngeha me hatine belavkirin da ku raya giştî bi agahiyên şaş û xapîner were beralîkirin. Ji ber vê yekê, pêwîstî hatiye dîtin ku raya giştî were agahdarkirin bi parvekirina agahiyên rast di derbarê mijarê de. Li zanîngeha me di asta lîsansê de bernameya Ziman û Çanda Kurdî di sala 2012an de vebûye. Di heman qadê de Bernameya me ya Lîsansa Bilind a Bêtez di sala 2013an de, Bernameyên me yên Lîsansa Bilind a Bitez û Doktorayê di sala 2015an de vebûne. Zimanê perwerdehiyê yê van bernameyan tirkî ye. Mîna vê, li zanîngeha me Zimanê Îngilîzî, Zimanê Erebî, Zimanê Farisî û hemû beşên fîlolojiyê de zimanê perwerdehiyê tirkî ye. Heta îro ji Bernameya Lîsansa Bilind a Bêtez a Ziman û Çanda Kurdî 86 xwendekar, ji bernameya me ya Lîsansa Bilind a Bitez 10, ji bernameya me ya Doktorayê jî 6 xwendekar derçûne. Ji roja destpêkê heta îro di van bernameyan de tu guherîneke statûyê û guherineke zimanê perwerdehiyê nehatiye kirin. [43]

---

42 Selim Temo: 10 yıldır Kürtçeye yönelik bu densiz yaklaşımı deşifre ediyorum. İşte yeni densizlik: Üniversitelerdeki Kürt Dili ve Edebiyatı bölümlerinde Kürt diliyle tez yazımı yasaklandı ve bütün derslerin dili Türkçe oldu. Yerli ve millî akademi böyle bir şey!
https://twitter.com/temoselim/status/1288826066962984962
Piştî vê parvekirina twitterê ya Selim Temo mijar derketiye medyayê û di derbarê mijarê de ev nûçe di medyayê de hatine dîtin.
Kürt Dili Bölümü'nde Kürtçe Tez Yasak (Yeni Yaşam, 30 Temmuz 2020) https://yeniyasamgazetesi1.com/kurt-dili-bolumunde-kurtce-tez-yasak/
Kürt Dili ve Edebiyatı Öğrencilerine Kürtçe Tez Yasağı (Duvar, 30 Temmuz, 2020) https://www.gazeteduvar.com.tr/gundem/2020/07/30/kurt-dili-ve-edebiyati-ogrencilerine-kurtce-tez-yasagi/
Dicle Üniversitesi Kürtçe tez yazımını yasakladı (Rudaw, 31 Temmuz 2020)
https://www.rudaw.net/turkish/kurdistan/310720201

43 Dicle Üniversitesi'nden Kamuoyu Açıklaması (2 Ağustos 2020) http://www.dicle.edu.tr/tr/duyuru/dicle-u1niversitesinden-kamuoyu-aciklamasi

Wekî ji vê jêgirtinê jî tê dîtin, Zanîngeha Dicleyê di vê daxuyaniyê de tîne ziman ku jixwe zimanê bernameya Ziman û Çanda Kurdî tirkî ye, di vê qadê de guherîneke nû nîne, bi afirandina fehmeke mîna ku qedexeyeke nû hebe raya giştî bi awayekî şaş tê beralîkirin û herwiha qedexe pratîtekeke gelek kevn e. Di vê daxuyaniyê de, di mewzûatê de tevî ku zimanê perwerdehiya van beşan wekî tirkî tê nîşandan jî, wekî li jor jî tê diyarkirin di beşê de ji serî heta dawî zimanê perwerdehiyê bi kurdî ye. Herwiha, di sala 2017an de tezeke kurdî li Zanîngeha Dicleyê hatiye parastin, YOKê ev tez pejirandiye û piştî parastina vê tezê, di meha hezîrana 2017an de Rektoriya Zanîngeha Dicleyê mîna ku li jor jî tê nîşandan, guherineke rêziknameyê pêk aniye ku nivîsandina tezên kurdî asteng dike.

Li beşê, digel ku di pratîkê de zimanê perwerdehiyê kurdî ye jî, zimanê nivîsandina tezê tirkî ye. Hem ders hem jî ezmûn bi kurdî pêk tên. Lê tevî vê, bi kurdî nivîsandina tezan hatiye qedexekirin. Herwiha, li beşên Ziman û Edebiyata Erebî û Ziman û Edebiyata Îngilîzî dikarin bi zimanê ku bixwazin, teza xwe binivîsin. Di vê nimûneya îxlala mafên akademîk de ku ji teref Rektoriya Zanîngeha Dicleyê tê kirin, xala balkêş ew e ku di navbera pratîk û rêziknameyên zanîngehan de ferq hene. Tevî ku mewzûata di derbarê zimanê hîndekariyê de ji bo hemû zanîngehan eynî ye, li beşên Zimanê Kurdî yên zanîngehên din xwendekar dikarin bi kurdî tezên xwe binivîsin û ev tez ji teref YOKê tên pejirandin jî, Rektoriya Zanîngeha Dicleyê bi rêziknameyeke nû nivîsandina tezên kurdî qedexe kiriye û li hember zimanê kurdî helwesteke asîmîlasyonker û înkarker nîşan daye.

## 4. TECRUBEYEKE DÎROKÎ DI QADA XEBATÊN KURDÎ DE: ZANÎNGEHA MARDİN ARTUKLUYÊ Û ÎXLALÊN MAFÊN AKADEMÎK

Di sala 2019an de li hin zanîngehan vekirin û çalakkirina beşên kurdî rûdaneke gelek girîng e ji aliyê dîroka zanîngehên Tirkiyeyê, ku wekî di beşên paş de jî hat gotin, li ser înkara kurdan, Kurdistanê û kurdî fealiyet pêk anîne. Li zanîngehan vekirina beşên ku bi kurdî perwerde didin, dikare were gotin ku ji aliyê Xebatên Kurdî ve "şoreşeke" mezin e. Lê li aliyek din, dema em ji derveyê akademiya Tirkiyeyê li vê mijarê binêrin, di serî de daxwaza perwerdehiya bi zimanê zikmakî, gelek li paş daxwazên maf û azadiyan dimîne ku kurd daxwaz dikin. Xwendekarên ku heta dema zanîngehê ji perwerdehiya bi zimanê zikmakî mehrûm dimînin, bi tirkî perwerde dibin û yên ku piraniya wan ji kurdan pêk tê û di van beşan de ku hejmareke kêm xwendekaran digirin, perwerdeya kurdî di nav kategoriya zimanê biyanî de yên wekî almanî, îtalyanî, latînî û di bin navê "Zimanên Zindî" de digirin. Herwiha, di piraniya beşên kurdî de her çi qas di pratîkê de zimanê perwerdehiyê kurdî jî be bi awayê qanûnî zimanê perwerdehiyê tirkî ye. Ev jî rewşa fiîlî ji misogeriya qanûnî bêpar dihêle û rê li ber mudaxele û fişaran vedike.

Yekem zanîngeha ku di qada perwerdehiya bilind a kurdî de ketiye nav fealiyetê, Zanîngeha Mardin Artukluyê ye. Di bin Enstîtûya Zimanên Zindî de, di pratîkê de perwerdehiya bilind a bi kurdî dest pê kiriye. Ligel vê taybetmendiyê, hem li gor hevdîtinên di çarçoveya vê xebatê de hem jî wekî ji venêrîna medyayê derketiyê holê, Zanîngeha Mardin Artukluyê (MAU) xwedan ciheke girîng e, ji ber ku di çarçoveya azadiyên akademîk

û azadiya derbirînê ya qada Xebatên Kurdî yên li zanîngehên Tirkiyeyê, li gor konjonktura siyasî ya rojane, rolên gelek “fişarker” an jî “azadker” yên rektoran, YOKê û dewletê ya li ser akademîsyenan û xweseriya zanîngehan nîşan dide.

MAUya ku di sala 2007an de, dema desthilatdariya AKPyê hatiye avakirin di nav salên 2009-2014an de wisa derdikeve pêşberî me ku bi awayekî qismî azadiyên akademîk û xweseriya zanîngehê lê tên temînkirin. Ligel vê yekê, ev avaniya zanîngehê ya bi awayekî qismî azad û xweser, di sala 2014an de bi fişara hêzên mehelî yên Mêrdînê, YOKê û desthilatdariya dewletê bi temamî ji holê tê rakirin. Fişara ku MAU di sala 2014an de lê rast hatî, dema qonaxa diyalogê ya di navbera PKK û dewletê de dewam dikir û herwiha beriya rewşa awarte ya 2016-2018an û weşandina metna “Em ê nebin hevparên vî sûcî!”, nimûneyeke dîrokî ye ku di qada Xebatên Kurdî de îxlalên mafên akademîk nîşan dide.

MAUya di sala 2007an avabûyî, wekî atmosfera polîtîk ya serdema avabûna xwe nîşan bide, di heyameke wisa de hatiye avakirin ku desthilatdariya AKPyê ji bo armanca bêçekkirina PKKyê di navbera kurd û tirkan de “biratî/xwîşkitiya îslamê” û ligel vê jî li gor esasa polîtîkayên guncaniya daxwazên Yekîtiya Ewropayê, gotarên “pir-çandîbûn” û “pir-bawerîbûn”ê dixistin rojevê, bi armanca ku bibe zanîngeheke wisa ku van gotarên desthilatdariyê bike rastî. Cudahiya Mêrdînê ya ji bajarên din ên kurdan, parastina hebûna komên etnîkî ên derveyê tirkan, wekî ereb, kurd, suryanî, ermenî û êzidiyan, roleke resen ji bo wê afirandiye.

Bi sedema vê mîsyona resen a li MAUyê barkirî, di salên ewil yên zanîngehê de, avakirina zanîngeheke li gor pir-çandîbûna Mêrdînê hem ji teref çapemeniyê hem jî ji teref birêveberiya zanîngehê her tim hatiye nîşandan û ji teref birêveberiya zanîngehê hatiye gotin ku tê armanckirin MAU bibe zanîngeha mezintirîn a Rojhilata Navîn. (Cumhuriyet, 10ê hezîrana 2009an). Taybetmendiya herî girîng a ku tecrubeya MAUyê ji tecrubeyên zanîngehên din vediqetînê, yên ku beşên kurdî û birêvebirinên Xebatên Kurdî lê hene, rektorê yekem Serdar Bedii Omay, ji teref hin dînamîkên mehelî yên Mêrdînî yên mihafezakar û layengirê desthilatdariyê – hin esnaf, komele û organên weşanên mehelî yên Mêrdînî – hin komên nav zanîngehê û YOKê bi rêya îxbar û tometan hatiye xwestin ku ji zanîngehê were dûrxistin. Gelek saziyên mihafezakar ên li Mêrdînê, li gor zanîngehên din, ji polîtîkayên azadîxwaz ên qismî xweser ên li zanîngehê zêde aciz dibin û li hember birêveberiya zanîngehê di qadên giştî de kampanyayan bi rê ve dibin. Di encama van kampanya, îxbar û rageşiyên di navbera rektorî û YOKê de, rektorê yekem beriya bidawîbûna proseya diyalogê, di sala 2014an de ji kar tê dûrxistin û di dewsa rektorê yekem de dekanê Fakulteya Îlahiyatê Ahmet Agirakça ji teref YOKê tê tayînkirin ku dê çawa were, fehmeke birêveberiyê ya fişarker û despotîk pêk bîne.

### 4.1 Heyama Rektorê Yekem Serdar Bedii Omay: Xweseriya Qismî li Zanîngehê

Akademîsyenên ku me ligel wan hevpeyvîn kirî, li MAUyê serdema rektorê yekem Serdar Bedii Omay (2007-2014) di qada Xebatên Kurdî de, ji aliyê azadiya derbirînê û fealiyetên akademîk yên wekî weşan, panel û semîneran, li gor zanîngehên din ên li bajarên kurdan û serdemên rektorên din, nîsbeten wekî serdemeke azad û xweser binav kirin. Rektorê yekem Serdar Bedii Omay, di serdemeke wisa de rektorî kir ku desthilatdariya AKPyê wekî "proseya çareseriyê" binav dikir û polîtîkayên "berfirehiya demokratîk" bi cih dianî; wî projeya "pir-çandîbûnê" ya ku dewletê li Mêrdînê dikir armanc, bi van gotinan aniye ziman:

> Me projeyeke mîmarî ya gelek xweşik amade kir ji bo cihwarê. Ew dê li gor avaniya dîrokî ya Mêrdînê be. Li gor avaniya pir-dînî û pir-zimanî ya Mêrdînê, dê mizgeftekê, şapeleke suryaniyan û perestgeheke piçûk a êzidiyan tê de hebe. Li hin cihên navçeya Midyadê hevwelatiyên me yên êzidî dijîn. Di dîrokê de Mêrdîn, li Mezopotamyaya Jorîn mezintirîn navenda zanîngehê ye. Di sedsala 19em de bajarekî wisa ye ku 13 medrese lê hene. Vê kelepora zanistî dê li vê kampusa me ji nû ve şîn bibe[…]
>
> Ez bawer dikim ku bi xebatên xwe yên civandina van çand, dîn û zimanên ku bi sedsalan e li cem hev bi awayekî aştiyane dijîn û çavkaniya xwe ji genên vê axê digirin, em ê tevkariya aştî û hizûra vî welatî bikin. […]
>
> Ji van suryanî, ji koma zimanî ya aramî ya zimanên semîtîk e û li herêma me tê axaftin. Ji bo avakirina beşa Ziman û Edebiyata Kurdî xebatên me didomin. Me pêş-amadekarî temam kirine. Em ê ji bo pejirandinê serî li YOKê bidin. Piştî pejirandina YOKê em ê îsal vê beşê vekin. Em wisa plan dikin ku di sala 2010an de bi 20 xwendekaran, li vê beşê dest bi hindekariyê bikin. Ji bo vê, me bi zanîngehên Duhok û Kerkûkê yên bakurê Iraqê û ji bo beşa erebî jî bi Zanîngeha Şamê re pêş-peymanek îmze kir. Ji bo Ziman û Edebiyata Kurdî ew dê piştgiriya mamosteyan bidin. Wan jî ji bo vekirina beşa Ziman û Edebiyata Tirkî hin daxwaz ji me kirin. Em ê jî di vê mijarê de piştgirî bidin wan. Ji bo Ziman û Edebiyata Suryanî em bi beşên perwerdehiya suryanî re dikevin nav têkiliyan. Di xebatên xwe yên têkildarê vekirina beşa Ziman û Edebiyata Kurdî de di çarçoveya mehelî û neteweyî de em piştgiriyeke mezin dibînin.[44]

---

44 https://www.ab.gov.tr/p.php?e=43430

Wekî ji vê jêgirtinê jî tê dîtin, MAU wisa hatiye dîzaynkirin ku bibe zanîngeheke wisa ku hembêza xwe ji bo hemû ziman û dînên herêma lê avabûyî, bi fehma "pirçandiyê" vedike û piştgiriyê dide van dîn û zimanan. Herwiha, di dema rektorê yekem de hatiye gotin ku bi zanîngehên girêdayî Birêveberiya Herêmî ya Kurdistanê re pêş-peyman hatine îmzekirin. MAU li Tirkiyeyê yekem zanîngeh e ku perwerdehiya kurdî û suryanî dide. Tezên kurdî yên ewil di bin banê vê zanîngehê de hatine nivîsandin û parastin. Lewra, di pozisyoneke wisa de ye ku bi taybetî di qada kurdî de yekem zanîngeha tirk e ku bi erka pêşengiyê radibe. Herwiha, ligel kurdî, di qada Xebatên Kurdî de jî gelek akademîsyenên ku xebatên xwe bi tirkî û îngilîzî bi rê ve dibin, yên di pozisyona welatiyên Tirkiyeyê an jî welatiyên welatên din, yên ku doktorayên xwe ji zanîngehên cuda yên dinyayê girtine, di beşên antropolojî, zanista siyasetê, felsefe, mîmarî û beşên din de bi awayekî qadroyî an jî peymanî li MAUyê xebitîne. Li gor gotarên pirçandîbûnê yên serdemê; akademîsyenên ku xebatên xwe têkildarê komên etnîkî yên cuda yên Rojhilata Navîn, yên wekî kurd, suryanî, ereb, êzidî, li vir bûne xwedan derfet ku pozîsyonên akademîk bibînin.

Beşdaran anî ziman ku di serdema behskirî de, bi taybetî di serdema 2013-2014an de, bi bandora proseya diyalogê ya navbera PKKê û dewletê jî, li zanîngehê bi taybetî ji aliyê Xebatên Kurdî û beşên kurdî derdoreke rehet hebûye, li zanîngehê xwe di bin tehdîdê de hîs nekirine û helwesta rektor a li hember wan erênî bûye. Bo nimûne akademîsyeneke/î endamê hîndekariyê yê doktor ku ji ber metna "Em ê nebin hevparên vî sûcî!" îmze kiriye di heyama piştî 2016an de ji karê xwe hatiye îxrackirin, di sala 2014an de, di serdema Serdar Bedii Omay de, di derbarê helwesta birêveberiya zanîngeha ya li hember zimanên derveyê tirkî, ev gotin anî ziman:

> Bi esasî, em di mijdara 2014an de behsa Proseya Çareseriyê dikin, atmosfereke wisa heye ku Proseya Çareseriyê hakim e. Herwiha, em behs dikin ku Zanîngeha Mardin Artukluyê jî qadeke pêla reforman e ku di nav çarçoveya Proseya Çareseriyê de pêk hatiye. Bes nimûneyekê bidim; dema ez çûm Artukluyê, hemû tabelayên me bi çar zimanî bûn. Ji bilî tirkî û îngilîzî, erebî, suryanî û kurdî hebûn, ev li korîdoran jî dihat dîtin. Her xwendekareke/î lîsansê di nav çar salên perwerdehiyê de mecbûr bû ku an erebî an suryanî an jî kurdî hilbijêre û çar salan bi dersên zêde, 24 saet krediyên xwe temam bike. Anku, mecbûr bû herî kêm zimaneke mehelî yê Mêrdînê hîn bibe. Di dema zanîngehê de ew çax meşrûiyetek heye ji bo kurdî, ziman û meseleya kurdî. Ev rehettir dihatin axaftin.

Lê dîsa jî, tevî ku ev heyam nîsbeten heyameke rehet û azad bûye jî, ev nayê wê maneyê ku li ser akademîsyen û Enstîtûya Zimanên Zindî ji mihraqên din fişar


mardin artuklu
üniversitesi

tine bûne. Bo nimûne, ji MAUyê sê beşdaran anî ziman ku di sala 2010an de ji bo bi tirkî dayîna dersên li ser zimanê kurdî, li ser Gerînendeyê Enstîtûya Zimanên Zindî Kadri Yildirim, ji teref mihraqên navnediyarkirî fişarekê hatiye kirin. Wekî li jor jî hatiye gotin, her çi qas di pratîkê de ders bi kurdî werin dayîn jî di mewzûatê de zimanê van dersan wekî tirkî derbas dibe. Akademîsyeneke/î ku lîsansa xwe ya bilind li MAUyê temam kirî û di serdema pêş de jî li heman zanîngehê wekî akademîsyen kar kirî, di derbarê mijarê de ev gotin anî ziman:

> […]dema me ders digirt, wextekî Kadri Yildirim ew çax gerînendeyê enstîtûyê bû, alîkarê rektor bû. Em hatin, me lê nihêrî notên xwe bi tirkî filan nivîsandine. Tabî kesên di koma yekem [a lîsansa bilind] de tev mirovên hişmend bûn; mirovên ku dinivîsandin, xêz dikirin, fikrekî wan hebûn. Em çûn cem mamoste, pê re axivîn, me got wisa nabe. Ev der Ziman û Edebiyata Kurdî ye, anku tu notên tirkî belav bikî, piştî wextekê dersê bi tirkî bidî, ev ne li gor me ye. Wî jî got "E-name ji min re tên, anku fişar heye." Tabî naverok negot lê me hinek bi cesaretdanê hinek jî bi gazinan bo vê yekê rê li ber wî girt. Belkî jî ev ji ber hişmendiya giştî ya hevalan bû, belkî jî nizanim, ders, heta tez jî dikaribûn bi tirkî bûna îro. Lê tev bi hev re helbet. Xuya bû ku ji hin cihan fişar hebû ku me nedizanî, êdî ji kî dihat.

Wekî ku di vê jêgirtinê de tê dîtin, bi piştgiriya xwendekaran jî akademîsyen li hember van fişarên çavkaniya wan nebilêvkirî, li ber xwe didin û dersan bi kurdî didin. Dema ku me hevdîtin pêk dianîn, li MAUyê dersên beşên Zimanê Kurdî hê jî bi kurdî dihatin dayîn.

### 4.1.1 Di Mijara Kontenjana Formasyona Mamostetiya Kurdî de Pirsgirêka ligel YOKê

Tevî ku li MAUyê dersên bi kurdî berdewam bûn, di qonaxên pêşiyê de, di navbera Rektoriya MAUyê û Enstîtûya Zimanên Zindî û YOKê de rageşiyeke girîng derdikeve. Ev hêrsdarî di derbarê mijara kontenjana bernameya lîsansa bilind a bêtez de ye ku ji bo gihandina qadroya mamosteyan hatiye vekirin; yên ku da ji sala 2012an pê ve ji bo xwendekarên dibistana navîn, li dibistanên navîn ên cuda dersên hilbijarî yên kurdî bidin. Piştî vebûna beşên Ziman û Edebiyata Kurdî li zanîngehên Tirkiyeyê, di sala 2012an de rûdaneke girîng diqewime: Ji bo xwendekarên dibistana navîn ên li herêmên diyarkirî yên li nav sînorên Tirkiyeyê dersên "Hilbijarî yên Ziman û Zaravayên Zindî" vedibin. Ji bo ku li dibistaneke navîn ya ji rêzê sinifeke

zimanên hilbijarî vebe, divê herî kêm 10 xwendekar vê dersê hilbijêrin. Di nav çarçoveya vê dersê de hilbijartina abazayî, adîgeyî, zazakî û kurmancî pêkan bû.[45] Kurdî, wekî dersa hilbijarî wisa hatibû amadekirin ku hefteyê du saet be. Di destpêkê de pêwîstiya mamosteyan, di serî de ji mamosteyên tirkî, edebiyat û zanyariyên civakî û zimanên biyanî hat dabînkirin ku kurmancî û zazakî dizanibûn (*Sabah*, 3yê cotmeha 2012an; *Hürriyet*, 6 sibata 2013an).[46]

Di vê proseyê de Wezareta Perwerdehiya Neteweyî, ji bo amadekirina pirtûkên dersê yên pêwîst yên dersên hilbijarî yên vebûyî, bi MAUyê û Lijneya Perwerdehiya Bilind re protokoleke hevpar amade dike û pirtûkên dersên kurmancî û zazakî yên ku di dersan de werin bikaranîn, ji teref mamosteyên zimanê kurdî yên li MAUyê tên amadekirin. Herwiha, biryar tê dayîn ku ji bo gihandina mamosteyên dersên hilbijarî, yên ku ev pirtûk tê de werin bikaranîn, bernameya formasyonê ya lîsansa bilind a bêtez were vekirin.[47] Birêveberiya MAUyê, ji bo bernameya lîsansa bilind a bêtez a ji bo gihandina mamosteyên dersên kurdî yên hilbijarî, kontenjana 500 kesî vedike, û 2.528 kes serî lê didin.[48] 500 kes; 250 kes wekî xwendekarên Perwerdehiya Yekem, 250 kes jî wekî xwendekarên Perwerdehiya Duyem qeyda xwe li vê beşê çêdikin bi hêviya ku wekî mamosteyên kurdî tayîn bibin li dibistanên navîn. Piştî vê rûdanê YOKê ragihand ku wê kontenjana 500 kesî nepejirandiye û hejmara kontenjanê dê daxîne 250yî û herwiha dê destûra formasyonê nede 250 kesî (*Doğruhaber*, 28 Ekim 2012).[49] Ev daxuyanî fişareke giran û mudaxaleyeke rasterast a ji jorîn, a li hember xweserî û rêveberiya zanîngehê nîşan dide. Di *Biryara Pêşniyarî ya li ser Statûya Personelên Akademîk ên Perwerdehiya Bilind* a UNESCOyê de, di derbarê girîngî û pêwîstiya xweseriya perwerdehiya bilind de ev îfade hatine diyarkirin:

> 17. Xweserî, bi taybetî ji aliyê dabînkirina fonên ji teref dewletê, bi sîstemên hesabdayîna giştî û azadiya akademîk û rêzdariya

---

45 Li gor nûçeyeke rojnameya Hürriyetê ya bi tarîxa 6ê sibata 2013an, di dema amadekirina nûçeyê de hejmara xwendekarên ku di sinifa 5an de dersên kurdî hilbijartine 18.847 e. 9.914 xwendekarî jî dersa "Hilbijarî ya Ziman û Zaravayên Zindî hilbijartiye lê zaravayê hilnebijartiye. 26 xwendekarên ku li bajarên wekî Duzce, Tokat û Kutahyayê dijîn, zimanên abazayî û adîgeyî hilbijartine. (Hürriyet, 6ê sibata 2013an).

46 https://www.sabah.com.tr/egitim/2012/10/03/kurtce-secmeli-ders-egitimi-basladi
https://www.hurriyet.com.tr/gundem/iste-secmeli-kurtce-nin-turkiye-haritasi-22534618

47 https://www.memurlar.net/haber/291481/kurtce-ogretmen-adaylarindan-eylem-video.html

48 https://www.memurlar.net/haber/291481/kurtce-ogretmen-adaylarindan-eylem-video.html

49https://dogruhaber.com.tr/haber/51481-mardin-artuklu-universitesi-secmeli-kurtce-ders-surecinden-cekiliriz/
https://www.memurlar.net/haber/291481/kurtce-ogretmen-adaylarindan-eylem-video.html

li hember mafên mirovî, ji bo bi awayekî çalak biryardana saziyên perwerdehiya bilind a di xebatên akademîk, standard, birêveberî û aktîvîteyên eleqedar de asteke xwe-birêveberî ya pêwîst e.

18. Xweserî, pêş-şerteke mecbûrî ye ku şêweyê sazûmanî yê azadiya akademîk û bicihanîna lazim a fonksiyonên bo personelên akademîk û saziyan hiştî dixe bin garantiyê.

29. Dewletên endam, di bin mukelefiyetê de ne ku saziyên perwerdehiya bilind ji çavkaniyeke tehdîdê ya muhtemel ya li hember xweseriya wan biparêzin.

20. Xweserî, ji teref saziyên perwerdehiya bilind divê wekî behaneyekê neyê bikaranîn ji bo sînordarkirina mafên personelên akademîk ku bi standardên navneteweyî yên din û vê pêşniyarê de hatine temînkirin.[50]

Wekî di vê jêgirtinê de tê dîtin, di nimûneya jor de YOKê, bi rêya mudaxaleya kontenjana ji teref zanîngehê diyarkirî, xwendekarên bo beşê hatine qebûlkirin mexdûr kirine, bi awayekî fişarker mudaxaleyê birêveberiya MAUyê kiriye. Piştî daxuyaniya YOKê ya daxistina kontenjanên girtina xwendakaran ji bo lîsansa bilind a bêtez, xwendekarên ku heq kiribûn bikevin beşê, bi daxuyaniyeke çapemeniyê ev biryara YOKê protesto kirine û YOK vexwendine ku vê biryarê vekişîne (*Doğruhaber*, 28ê cotmeha 2012an).[51] Wekî xwendekaran, Rektoriya MAUyê jî di 28ê cotmeha 2012an de daxuyaniyeke çapemeniyê weşandiye. Di daxuyaniyê de biryara YOKê ya daxistina kontenjanan bi awayekî tund hatiye rexnekirin, hatiye diyarkirin ku di girtina xwendekaran de "liyaqat" esas bûye û zanîngeh dê ji proseya dersên kurdî yên hilbijarî vekişe. Di daxuyaniyê de îfadeyên wisa hatine diyarkirin:

Beriya ku em fikra xwe ya vekişîna ji proseya dersa kurdî ya hilbijarî pêk bînin em xusûsên li jêr bo raya giştî û merciyên eleqedar pêşkêş dikin:

[...]

Girîngtirîn gava vebûna demokratîk bêguman ew gav e ku rê li ber vedike zimanê kurdî biqedeme di perwerdehiyê de were bikaranîn. Wekî yekeya Kurdolojiyê ya Zanîngeha Mardin Artukluyê me biryara piştgiriya vê gavê da û di dewsa lêpirsîna niyetên li paş wê, me tercîh kir ku em ji aliyê çendanî û çawaniyê hundirê wê tijî bikin.

---

**50** Yüksek Öğretim Akademik Personelinin Durumuna İlişkin Tavsiye, 1997, s.7 http://80.251.40.59/politics.ankara.edu.tr/altipar/Yayinlar/Yuksek%20Ogretim%20Tavsiye.pdf

**51**https://dogruhaber.com.tr/haber/51481-mardin-artuklu-universitesi-secmeli-kurtce-ders-surecin-den-cekiliriz/
https://www.memurlar.net/haber/291481/kurtce-ogretmen-adaylarindan-eylem-video.html

Di vê çarçoveyê de:

Me yekeya xwe ya Kurdolojiyê bi 10 elemanên hîndekariyê yên qadroyî xurt kir ku ew di qadên ziman, edebiyat û çanda kurdî de xwedan pisporî ne û herî kêm xebatên wan ên deh salî hene; di vê maweyê de me bes "liyaqata" elemanên eleqedar wekî pîvan qebûl kir.

Me xwendekarên lîsansa bilind a bitez dîsa bi girîngiya liyaqatê girt ku tevî yên nû hejmara wan digihije 60an û hinekên wan tezên xwe teslîm kirine û mezûn bûne.

[…]

7) Me 2528 endamên ku muraceatê îlana me ya "Perwerdehiya Lîsansa Bilind a Bêtez a Kurdiya Hilbijarî" kirî, ku niha tê xwestin bibe pirsgirêk, di bin koordînasyona Yekeya Ezmûn a Bajarî ya OSYMyê li 10 dibistanên cuda girtin ezmûnê û di encama nirxandineke objektîf de ku ji bilî liyaqatê me tu tiştek nekir pîvan, me qeyda kesîn û kiryarên bicihkirina 500 kesî temam kir. Qismekî mezin ê van 500 kesan dev ji karên xwe yên li nav an jî derveyê welat berdan, hin kes bi takekesî hin kes jî bi malbata xwe re niha mala xwe bar kirine Mêrdînê û niha li bendê ne ku dest bi perwerdehiyê bikin.

[…]

Encam: Tevî ku em diyar dikin em hê jî bihêvî ne, heke hejmara 500 kesên ku qeyda teqez a li Bernameya Lîsansa Bilind a Bêtez a Dersa Kurdî ya Hilbijarî kirî neyê pejirandin û destûra formasyonê neyê dayîn bo 234 endamên ku formasyona wan nîn e, em bi rêzdarî bo raya giştî radigihînin ku em ê ji proseya têkildarê Dersa Kurdî ya Hilbijarî vekişin ku halê hazir me deh roj e sekinandiye. (Zanîngeha Mardin Artukluyê, Yekeya Têkiliyên Gel û Çapemeniyê)[52]

Beşdarekê/î ji MAUyê anî ziman ku piştî vê daxuyaniya birêveberiya zanîngehê ne YOKê ne jî MAUyê di vê mijarê de paş de gav neavêtiye, zanîngehê perwerdehiya lîsansa bilind a bêtez daye dewamkirin û kontenjana 500 kesî wekî serdema yekem û serdema duyem kiriye du beş. Wekî ji vê jêgirtinê jî tê dîtin, YOK û desthilatdariya navendî her çi qas bo qada Xebatên Kurdî li zanîngehan cih vebikin jî her tim hewl didin ku vê qadê di bin kontrol û birêveberiya xwe de bihêlin. Ji aliyekî din, daxuyaniya çapemeniyê ya MAUyê di derbarê çavkaniyên hêrsdariya di navbera

52 Kamuoyu Açıklaması (Seçmeli Kürtçe Dersi)
http://www.mardintime.com/m/?id=2137
http://www.radikal.com.tr/egitim/artuklu-universitesi-kurtce-ogretmen-yetistirmeyecek-1102072/

YOK û MAUyê de hin tiştan nîşan dide. Di vê daxuyaniyê de birêveberiya MAUyê pir zêde balê dikşîne ser peyva "liyaqatê". Di nivîseke protestoyê ya wisa de ew qas balkişandana ser têgeha "liyaqatê" nîşan dide ku hêrsdariya têkildarê kontenjanê ya di navbera YOKê û MAUyê de bi esasî li ser mijara girtina xwendekaran a li gor "liyaqatê" ye. Ji 2.528 kesên ku serî li vê bernameya bo gihandina mamosteyên kurdî vebûyî dane, hilbijartina 500 kesan dê li gor kîjan krîteran be, wekî sedema bingehîn a mudaxeleya YOKê derdikeve holê. Wekî di beşên pêş ên raporê de dê were nîşandan, mijara "liyaqatê" anku diyarkirina xwendekarên bo gihandina mamostetiya kurdî û bi giştî jî hilbijartina xwendekarên lîsansa bilind û mijarên qadroyîbûna têkildarê personelên akademîk dê bibin mijarên ku herî zêde bal tên kişandin dema Gerînendeyê Enstîtûya Zimanên Zindî û Alîkarê Rektor Kadri Yildirim îstîfa bike.

### 4.1.2 Hewlên Hêzên Mehelî yên Mêrdînî û Derdorên Mihafezekar ên nav Zanîngehê ji bo Astengkirina Azadiyên Akademîk û Azadiya Derbirînê

Bûyereke din a girîng jî di sala 2013an de diqewime ku bandoreke neyênî li ser xweseriya zanîngehê ya MAUyê dike. Kesekê/î an jî hin kesên ku ji birêveberiya Serdar Bedii Omay ya li MAUyê û ji derdora azad a qismî ya li nav zanîngehê aciz dibin, raporekê "îxbarê" amade dikin ku Rektoriya MAUyê bi "dûrbûna ji derdora îslamî" sûcdar dike û ev rapor bi rêya e-nameyê bo YOKê, hin birêveberên payebilind ên dewletê û birêveberiya zanîngehê tê şandin. Ji ber ku rapor ji navnîşana e-nameya F. D.yê li MAUyê endamê hîndekariyê hatiye şandin, tê îdiakirin ku rapor ji teref F. D. hatiye amadekirin. Lê F. D.yê ku di derbarê mijarê de daxuyanî daye, îdia dike ku şîfreya e-nameya wî hatiye şikestin û komployek li hember wî hatiye amadekirin. Ev rapora îxbarê ku birêveberiya Serdar Bedii Omay bi qadroyîbûn û cihêkariyê sûcdar dike û hin akademîsyenan deqsorî dike, hin akademîsyenên MAUyê ku berê di birêveberiya partiyên legal ên kurd û birêveberiyên mehelî de xebitîne wekî sûcdar dinirxîne û dike mijara îxbarê û dinivîse ku hin akademîsyen çepgir, alîgirê elewiyan û ateîst in û ji ber vê jî sûcdar in. Piştî ku rapor bi raya giştî re hatiye parvekirin, birêveberiya zanîngehê bi daxuyaniyekê ev rapor şermezar kiriye. (Hevdîtin; Cumhuriyet, 23ê Sibata 2013an; Hürriyet, 23ê Sibata 2013an)

Belavkirina raporeke "îxbarê" ya wisa, di nav zanîngehê de dibe sedema degvedaneke mezin û di nav akademîsyenên muxalîf de dibe sedema dilnerehetiyê. Nayê zanîn ku rapor ji teref kê hatiye amadekirin. Akademîsyenên ku di derbarê mijarê de me ji wan pirs kirin, anîn ziman ku wisa difikirin ev rapor ji teref hin derdorên li nav zanîngehê (akademîsyen û karmend) yên ku ji azadiyên derbirînê û akademîk ên li zanîngehê aciz in û hêzên mehelî yên dijberên birêveberiya zanîngehê hatiye amadekirin.

Dema ku li hember rektoriya serdemê sûcdarkirinên wisa berdewam bûn ku

wekî “ji binî” dikarin werin binavkirin, di heman demê de li zanîngehê di qada îxlalên mafî yên li ser azadiyên akademîk, azadiya derbirînê û komên LGBTÎ+ de îxlaleke din qewimî û di çapemeniyê de jî xuya bû. Doçentê Alîkar Dr. Levent Şenturkê ku Li Fakulteya Mîmariyê dixebite, roja 17ê nîsana 2014an plan dike ku panelekê bi sernavê “Ji Nexweşiyê ber bi Daxwaza Mafê – Seyra Manîdarkirina Hevzayendiyê” organîze bike ku ji teref Alî Erol were pêkanîn. Piştî ku tê bihîstin ev panel dê were organîzekirin, hem ji derdorên bajarê Mêrdînê hem jî ji derdorên zanîngehê bertêkên zayendperest û dij LGBTÎ+ yên dijminane derdikevin. (Cumhuriyet, 20ê adara 2014an û beyanên hin beşdaran).

Di nav komên bertêkdar yên li dij panela plankirî de Mardin Dost-Der (Komeleya Dostanî Perwerdehî Alîkarî û Piştevaniyê) jî heye û serokê komeleyê Mehmet Arasan di derbarê mijarê de daxuyaniyeke nivîskî diweşîne:

> Daxwaza lidarxistina paneleke rasterast hemberê namûs û ‘ara gelê me yê misilman û pêşengiya saziyeke wekî Zanîngeha Mardin Artukluyê em gelek êşandine. Em vê panela kirêt bi awayê herî tund şermezar dikin. Em hemû kes û saziyên ku dixwazin vê panelê li dar bixin, alîkarî bikin û sponsorî bikin, gilî dikin bo gelê xwe yê misilman yê emsalê namûs û îffetê (*Milliyet*, 21ê nîsana 2014an).[53]

Mele jî bertêk li hember panelê nîşan didin û nûnerê herêmî yê Din-Bir-Senê Mehmet Şirin Ersan di derbarê panelê de van gotinan tîne ziman:

> Haya me jê heye ku ev panel ne xebateke akademîk e. Nîşaneya herî girîng ev e ku kesê wekî axaftvan bo panelê hatiye vexwendin, ne kesekî wisa ye ku di derbarê mijarê de xebatên akademîk kirine. Ev kes wekî birêveberê rêxistinekê tê naskirin ku ew rêxistin li seranserê welat xwedan mîsyona belavkirina propagandaya fehma hevzayendiyê ye. Lewra li vir armanc ne fealiyeteke akademîk e lê bi rêya mehandina nirx û hesasiyetên bingehîn ên civakê, bi gotina hin mamosteyên li Fakulteya Mîmariyê, şoreşeke bêdeng e. Zanîngeha Mardin Artukluyê gelo bûye fakulteyeke wisa ku kesên di daxwaza pêkanîna şoreşekê de ne, bi giranî li wir cih bigirin? Fakulteya Mîmariyê demek berê jî bi gotegotên pêkanîna civata eraqê ya giştî hatibû bihîstin ku li bînaya fakulteyê, mamosteyekî serokê beşê ligel xwendekarên xwe pêk anîbû[…] Sedema bingehîn a van rûdanên li Fakulteya Mîmariyê gelo li fakulteyê bi zanebûn kombûna mamosteyên xwedan “rihê Geziyê” ne ku li zanîngehên din

53 https://www.milliyet.com.tr/gundem/escinsellik-paneli-mardini-karistirdi-1870564

> derfetên belavkirina fikrên xwe nabînin? Ev hemû tişt û di dawiyê de hewla panela ku bi daxwaza pêkanîna şoreşeke bêdeng tê kirin, ji aliyê cihê ku niha zanîngeh lê ye metirsîdar e. Metirsiyên me yên dûrketina zanîngehê ya ji mîsyona xwe ya avakirinê zêde dikin. Şîrovekirina mijarê ya ji teref rêxistinên civaka sivîl ya bi niyet û armancên cuda ya di bin maskeya dînî de, endîşe û metirsiyên me yên li ser mijarê zêde dikin (*Milliyet*, 21ê nîsana 2014an).[54]

Piştî van daxuyaniyên zayendperest, dij LGBTÎ+ û daxwaz dikin ku li zanîngehê li ser xeteke îslamî fealiyet werin kirin, rektor û dekan paş de gav diavêjin û ev panel ji teref birêveberiya zanîngehê tê betalkirin (*Milliyet*, 21ê nîsana 2015an).[55] Ji teref rektoriyê betalkirina vê panelê, nîşan dide tevî ku birêveberiya zanîngehê li hember YOKê di mijara bernameya lîsansa bilind a bêtez de berxwedaneke girîng nîşan bide jî dema mijar takekesên LGBTÎ+ bin esasen bi derdorên homofobîk û mihafezekar re li hev dike. Lewra derdikeve holê ku rektorî di mijara azadiya derbirînê û azadiya akademîk de têra xwe helwesteke akademîk a azadîxwaz nagire/nikare bigire.

Piştî bertekên dij LGBTÎ+ betalkirina panelê, îxlaleke girîng e ku rektoriyê di qada azadiya derbirînê de pêk aniyê, ku di heyama Serdar Bedii Omay de li medyayê olan daye. Bi betalkirina panelê helwestên LGBTÎ+fobîk têne meşrûkirin. Piştî vê bûyerê, li ser malpereke înternetê ya bi navê Doğruhaberê, di nivîsekê de ku ji teref M. Mufit Yaray hatiye nivîsandin, Levent Şenturkê ku li Fakulteya mîmariyê akademîsyen û organîzekarê panelê, wekî hedef tê nîşandan: nûçeya bi sernavê "Betalkirin ne bes e, divê ev ên bêexlaq ji Mêrdînê herin!" akademîsyen Levent Şenturk "xurifî" tê pênasekirin û rektorê MAUyê Serdar Bedii Omay bi awayekî eşkere tê sûcdarkirin û bang li hikûmet û YOKê tê kirin ku mudaxeleyê zanîngehê bikin:

> […] Hikûmet û YOK dê bes temaşe bikin ku hin kes bi navê azadiyên takekesî rabin û bikevin nav fealiyetên ku hemû civakê jehrî bike û vê yekê bi derfetên dewletê dayî û bi bikaranîna navên akademîk bike? Kes nikare ji wan bipirse bê ka li fakulteya mîmariyê karê hevzayendiyê çi ye? Rektorê Zanîngeha Mardin Artukluyê tevî ku ji aliyekê peyamên Şeva Qedrê parve dike çawa di serî de destûr da, hişt ku navê zanîngeha wî bikeve nav eletewşiyeke wisa? Gelo têkiliyeke wî ya hissî ligel van hevzayendan heye? Digel ku bi hest û baweriyên dînî yên gel û bajarê Mêrdînê dizane jî, heta roja dawiyê destûrdayîna vê konferansa provakatîf, wî nake tekane berpirsiyarê van hemû bûyeran? Birêz rektor dikaribû hesabê bûyerên muhte-

54 https://www.milliyet.com.tr/gundem/escinsellik-paneli-mardini-karistirdi-1870564

55 https://www.milliyet.com.tr/gundem/escinsellik-paneli-mardini-karistirdi-1870564

mel bidaya? (*www.dogruhaber.com*, 17ê nîsana 2014an).[56]

Di heman qonaxê de 12 akademîsyen, daxuyaniyekê diweşînin ku tê de hemû fişarên qewimî şermezar dikin û di daxuyaniyê de cih didin van gotinan:

> Sedem, îdiayeke derrastî û bêbinyad bû ku digot ev pêşkêşiyên di çarçoveya derseke lîsansa bilind de, dê heqaret li nirxên me yên dînî bikin. Nayê qebûlkirin ku fakulteya me û zanîngeha me di ser şexsan re wekî hedef were nîşandan. Bêdengmayîna li hember ferzkirinên tineker ên qada azadiya akademîk xeta ye. Hedefnîşandana hebûna akademîk ya fakulteya me, zanîngeha me, mêvanên me, endamên hîndekariyê ku ji her aliyê cîhanê hatine û xwendekarên me yên xwedan kokên cuda yên dînî, sosyo-çandî û etnîkî; kesernak û derveyê hiqûqê ye. Divê bi nefret, tomet û yêdinkirinê, çalakiyên me yên akademîk neyên astengkirin. Çalakiyên me yên zanistî bi tu awayî heqaret li bawerî, nijad, ziman, dîn û şêweyê jiyanê nakin. Tu komekê nake armanc û nirxên tu kesî piçûk naxîne (*Milliyet*, 21ê nîsana 2014an).[57]

### 4.1.3 Tasfiyeya Birêveberiya Serdar Bedii Omay di sala 2014an de

Di nav atmosfereke wisa de ku gotarên dijminane yên li hember fealiyetên birêveberiya MAUyê belav dibûn, saziyên dewletê dikevin nav liv û tevgerê û bi îdiaya gendeliyê di îhaleyên MAUyê yên meha çiriya paşîn a 2014an de, ji teref Dozgeriya Mêrdînê di meha tîrmehê de lêpirsîneke berfireh dest pê dike û li odeyên rektor û dekanan lêgerîn tê kirin. Paşê jî bi berfirehkirina vê lêpirsînê 68 kesên ku Prof. Dr. Kadri Yildirimê Gerînendeyê Enstîtûya Zimanên Zindî û Alîkarê Rektor jî di nav de tên desteserkirin. Di nav kesên desteserkirî de ligel karsazên beşdarê îhaleyan bûne, Sekreterê Giştî yê Zanîngehê, Alîkarê Sekreterê Giştî, Dekanê Fakulteya Hunerê jî hene. Di dema vê operasyonê de, odeya rektorê zanîngehê Serdar Bedii Omay jî di nav de, li odeyên dekanan lêgerîn pêk tê û gelek hard dîsk, ewraq û dosye jî tên desteserkirin (Cumhuriyet, 19ê çiriya paşîn a 2014an). Ji kesên desteserkirî 29 kes, Alîkarê Rektor û Gerînendeyê Enstîtûya Zimanên Zindî Prof. Dr. Kadri Yildirim jî di nav de, bi îdiaya “avakirina rêxistinê bi armanca sûckirinê, endambûyîna rêxistinê, di çarçoveya rêxistinê de fesadîxistina nav îhaleyê, sextekariya wesfdar ya li dij saziya giştî, eşkerekirina agahiyên veşartî” bi daxwaza girtinê bo mehkemeyê hatin sewqkirin. Roja din, 24 çar kesên ku Kadri Yildirim jî di nav de tên berdan lê 5 kes

**56** https://dogruhaber.com.tr/haber/125261-iptal-yetmez-bu-ahlaksizlar-mardinden-gitmeli/

**57** https://www.milliyet.com.tr/gundem/escinsellik-paneli-mardini-karistirdi-1870564

tên girtin (*Evrensel* û ilkehaber.com, 22ê çiriya paşîn a 2014an).

Piştî van bûyeran, di 26ê çiriya paşîn a 2014an de gotareke Kadri Yildirim di çapemeniyê de derdikeve. Di vê daxuyaniya xwe de, lêpirsîna li ser xwe û desteserkirina xwe, bi qadroyên lîsansa bilind a bêtez ve girê dide ku dihat plankirin ev bername mamosteyên dersên hilbijarî yên kurdî bigihîne ku wekî di beşên paş ên vê raporê de hatibû diyarkirin, du sal berê, di sala 2012an de di navbera YOKê û MAUyê de bibû sedema tansiyonê û di daxuyaniya çapemeniyê de zêde bal hatibû kişandin ser peyva "liyaqatê". Yildirim tîne ziman ku ji ber ku wî daxwazên parlementeran ên qadroyîbûnê red kirine rastê komployek wisa hatiye.

> Destûrnedayîna min a girtina mirovan a bêheq bo Kurdolojiyê; Di derbarê wan endaman de ku muraceatê îlana bernameya me ya ji bo 500 xwendekarî kirî, parlementeran faks şandin ji min re û lîsteya navan dan min. Cemaet, terîqet, sendîka û komeleyan jî heman siparîş da min. Min hesab kir, hejmara wan 500î derbas dikir. Roja ezmûnê min xwendekar li hev civandin, rewş îzeh kir û hemû ew lîsteyên siparîşê qetandin û avêtin çopê. Xwezî min neavêta û îro wekî belge nîşanê we bida. Welhasil, ji ber ku ev siparîş bi cih nehatin wan dest bi êrişê kir û bi gotinên ku ji 500 kesên min girtî 480 kes sempatîzanên PKKyê ne, bi vî awayî hin rapor û îxbarname gihandin YOKê, MEBê û Wezareta Karên Navxweyî, Serokkomarî û Serokwezîriyê. Ji YOKê lêpirsîner hatin û ez xistim bin lêpirsînê. Lê di wan deman de em di nav pêvajoyeke şer de derbas dibûn û derdora BDPyê bernameya me protesto dikir û hişyarî didan kesên nêzikê xwe ku muraceatê vê bernameyê nekin. Anku yekane terefê ku lîste neda me BDP bû. Jixwe di nav kesên ku me girtî, mirovên ji her derdorê yên ji ezmûnê serkeftî hebûn. Anku mesele cuda ye (Yurt Haber, 25ê çiriya paşîn a 2014an).

Beşdarekê/î ku di wê demê de li enstîtûyê dixebitî û di qonaxa rewşa awarte de bi KHKyê îxrac bûyî, fişara li ser enstîtûyê ya ji teref derdorên nêzikê desthilatdariyê, ji bo diyarkirina qadroyan û girtina qadroyên xwe bo beşê, bi van gotinan anî ziman:

> Di demên ezmûnan de, heke mirov jidil bibêje, ji her derdorê însan dihatin anku digotin vê bigrin, wê bigrin. Anku ev zarokên parlementeran in, vê bigrin, wê bigrin, Fethûllahçiyan jixwe lîste dişandin, me guh nedida. Jidil dibêjim, me guh neda tu kesî, ne ji vî, ne ji wî, anku me guh neda tu kesî, di vê mijarê de em paqij in

anku. Çi HDPyî, çi AKPyî, çi Fethûllahî, çi cemateke din yanî. Di vê mijarê de Kadri Yildirim jî bedela wê da. Me jî, Kadri Yildirim jî bedela wê da, bi dûrxistina bi vî awayî. Çimkî em di meseleyên wisa de baldar bûn.

Lewra, hem Kadri Yildirim hem jî akademîsyenên têkildarê mijarê ku me ligel wan hevpeyvîn kirî, sedema bingehîn a desteserkirina Kadri Yildirim û vê operasyona li dij birêveberiya MAUyê lidarxistî, wekî êrişeke YOKê ya li hember derdora azad a qismî ya zanîngehê, ji holê-rakirina xweseriya zanîngehê, bi armanca kontrolkirina hilbijartina xwendekaran û qadrobûyîna li zanîngehê ve girê dan. Ji aliyekî din, heman beşdaran ligel van nêrînan anîn ziman ku di birêveberiya zanîngehê de hin kesan belkî di mijarên darayî de bêrêtî an jî di usûlê de xeta kiribin û ev jî di tasfiyeya birêveberiya zanîngehê de hat bikaranîn. Di qonaxa pêş de, Kadri Yildirimê alîkarê rektor û gerînendeyê enstitûyê ji sûcên di derbarê xwe de beraet kiriye. (Hevpeyvîna ligel Kadri Yildirim, 7ê tebaxa 2020an).

Di qonaxa pêş de ya bûyerên li jor behskirî, di meha kanûna pêşîn a 2014an de yekem rektorê MAUyê Serdar Bedii Omay, li gor daxwaza Serdozgeriya Mêrdînê ji teref lijneya venihêrtina YOKê ji berpirsiyariya rektoriyê tê girtin û di dewsa wî de dekanê Fakulteya Îlahiyatê Ahmet Agirakca wekî rektor tê tayînkirin (*Cumhuriyet*, 4ê kanûna pêşîn a 2014an). Piştî tayîna rektorê nû, Gerînendeyê Enstîtûya Zimanên Zindî û Alîkarê Rektor Kadri Yildirim di kanûna paşîn a 2015an de daxwaznameya îstîfayê pêşkêş dike bo birêveberiya zanîngehê (*Hürriyet*, 14ê kanûna paşîn a 2015an).

### 4.2. Heyama Rektorê Duyem Ahmet Agirakça: Paşveçûna di Azadiyên Akademîk de

Di sala 2014an de, piştî ku Serdar Bedii Omay ji kar hat dûrxistin, Ahmet Agirakçayê ku dest pê kir wekaleten rektoriyê bi rê ve bibe, bi awayekî fermî di adara 2015an de bo berpirsiyariya rektoriyê hat tayînkirin. Ahmet Agirakça heta sala 2019an rektorî kiriye û paşê jî di 22yê tebaxa 2019an de di dewsa wî de rektorê sêyem İbrahim Ozcoşar hat tayînkirin. Dema ku ev rapor dihat amadekirin İbrahim Ozcoşar Rektoriya MAUyê bi rê ve dibir.

Beşdarên ku li MAUyê xebitîne, heyama Ahmet Agirakçayê rektorê duyem; bi rengdêrên wekî “paşveçûn”, “kabûs” û “tarî” pênase kirin. Beşdarekê/î ji bo binavkirina heyama Agirakça îfadeya “Agirakça wekî bûldozerekî di ser me re derbas bû. YOK gelek baş dizane ku kengê, kîjan mirovî bîne ku derê.” bi kar anî. Yek ji îxlalên mafî yên herî girîng ên bi giştî li zanîngehên di nav sînorên Tirkiyeyê de hatî kirin û mudaxeleyên herî mezin ên li dij xweseriya zanîngehê, wekî ku dê di beşa pêş

de jî were behskirin, di serdema rewşa awarte ya 2016an de destpêkirî, rakirina hilbijartinên rektoriyê yên ku li nav zanîngehan pêk dihat û bêyî hilbijartinan, ji teref Serokkomariyê rasterast tayînkirina rektoran e. Di encama rûdanên resen yên li MAUyê, wekî ku li jor hat diyarkirin, rektorê duyem Ahmet Agirakça gelek beriya heyama rewşa awarte, di adara 2015an de ji teref Serokkomar Receb Tayîb Erdogan wekî rektorê MAUyê hat tayînkirin (*Cumhuriyet Egitim Eki*, 19ê adara 2015an).

### 4.2.1 Li Zanîngehê Tasfiye, Zordarî, Tirsandin, Çavtirsîkirin û Tehdît

Di heyama Agirakça de ku dema hat li ser berpirsiyariya rektoriyê îfadeya "nûnerê Erdogan im" bi kar anî, li hember akademîsyenên ji dîsîplînên cuda gelek îxlalên mafî pêk hatin û qadroyên heyama Serdar Bedii Omay pêkhatî, di asteke girîng de ji zanîngehê hatine tasfiyekirin. Polîtîkaya tasfiyeyê ya di heyama Agirakça de pêkhatî herwiha bi awayekî wekî delîl xuya dike ku heyameke berê operasyona li hember birêveberiya zanîngehê ne bi sedemên darayî sînordar e. Bi operasyona darayî ya destpêkirî û tasfiyekirina qadroyên nexwestî, di heyama Agirakça de li hember qadroyên akademîk dewam dike. Di heyama navborî de, qismeke îxlalên mafî yên li hember akademîsyenên bin banê MAUyê, di çapemeniyê de jî xuya dike. Di vê heyamê de, akademîsyenên ewropayî yên li MAUyê jî di nav de, karê gelek akademîsyenên biyanî tên bidawîkirin. Di nûçeyeke rojnameya Cumhuriyetê de tê gotin ku karê 25 akademîsyenên biyanî hatiye bidawîkirin (*Cumhuriyet*, 23ê sibata 2017an).

Nûçeyên din ku di vê heyamê de di çepemeniyê de tên dîtin di derbarê weşanên Agirakça û nêrînên wî yên siyasî yên salên berê de ne. Bo nimûne, weşaneke bi navê Ansîklopediya Îslamê dikeve rojeva medyayê ku Agirakça serperiştiya weşana wê kiriye. Di vê ansîklopediyê de fikrên wekî pêwîstiya kuştina kesên ku ji misilmantiyê derketine û dînê xwe guhertine, pêwistiya lêdana jinan heke bo mêrê xwe îtaet nekin, demokrasî û demokrasiya civakî nîzamên şîrkê ne, cih girtine (Cumhuriyet, 28ê adara 2018an). Beşdaran di derbarê helwesta siyasî û dînî ya Agirakça de anîn ziman ku piştî tayîna wî, li zanîngehê derdora azadiyê ya qismî bi awayekî berçav, bi awayekî neyênî guheriye û pratîkên mihafezekar û fişarker pêk hatine. Di dewsa panel, konferans û semînerên bi ziman û babetên cuda de giranî hatiye dayîn ser çalakiyên têkildarê çand û zimanê erebî. Di hevpeyvînan de hatiye gotin ku dersên hilbijarî yên erebî, suryanî û kurdî bi înîsiyatîfa xwendekaran bi xwe dihat hilbijartin û herwiha ji teref endamên hîndekariyê yên mêvan, li beranberê meaşê îlawe dersên kurdî dihat dayîn. Hat îfadekirin ku daxwazeke zêde hebûye û xwendekarên her beşê karibûne du saet dersên kurdî bigirin. Lê belê, îfade kirin ku ev çend salên dawî şikayetên wisa digihin wan ku serokên beşan û hin mamoste destûr nadin ev beş vebibin û zor didin xwendekaran ku dersên din hilbijêrin.

Ji Fakulteya Mîmariyê, Peywirdarê Lêkolînê Emre Ozyetiş, rastê îxlaleke giran ya mafî hatiye. Li gor hin îdiayan, îxlalên mafî yên li hember Ozyetiş, piştî ku li dersa xwe behsa mijarên wekî zayenda civakî, tayînkirina zayendê dike û paşê jî xwendekareke/î wî, wî bi yek ji serekeyên Mêrdînê îxbar dike (Hevdîtina ligel Emre Ozyetiş, 13ê gulana 2020an). Paşê Agirakça, Ozyetiş vedixwîne odeya xwe û heqaretên zayendperest lê dike. Ozyetiş, di nûçeyeke 27ê kanûna pêşîn a 2017an de, ku ji teref Zeynep Yunculerê hatiye amadekirin û li ser platforma înternetê ya bi navê *Journo*yê hatiye weşandin, bi van gotinan tîne ziman ku rektor bi gotinên zayendperest ew tehdît kiriye:

> Agirakça, jixweber pirseke wisa ji min kir "Tu dixwazî bibî keçik?" Li hember matmayîna min wisa dewam kir "Haya te jê nîn e ku tu li Mêrdînê yî?" Dema min îfade dikir ku dixwazim fehm bikim çi qewimiye bi qêrînî ji min re got "Derkeve derve!' Min jê re got tiştê ku ew dike gotinên nefretê ne û ez ê di derbarê wî de bangewaziya sûcê bikim. Wî jî wekî ku destê xwe biavêje sîlehê bir pişta xwe û ji bo ez ji odeyê derkevim ez tehdît kirim (Journo, 27ê kanûna pêşîn a 2017an).[58]

Di nûçeyê de herwiha hatiye diyarkirin ku di heman demê de bi rêya telefonê li rektor geriyane û rektor Agirakça bo rojnamevanê lê gerî ev gotin aniye ziman:

> Ev mêr bêedeb û rezîl e. Li dibistanê ji zarokan re behsa tiştên bêedeb dike. Ez li dibistana xwe mamosteyê mêr yê wisa naxwazim ku wekî keçikan tevdigere. Heke hûn jî vê nûçeyê çêbikin hûn ê bedela wê bidin, ez ê dozê li we vekim. Qet xwe aciz nekin. Dê serê we bikeve belayê (*Journo*, 27ê kanûna pêşîn a 2017an).

Piştî vê bûyerê akademîsyen Ozyetiş, di derbarê rektoriyê de bangewaziya sûcê dike. Piştî bangewaziya sûcê ji teref rektoriyê, ji Fakulteya Mîmariyê tê sirgûnkirin bo Fakulteya Perwerdehiya Bedenî ya ku xwendekar lê nîn in. Ji ber ku rektorî afîşe dike û di derbarê wî de bangewaziya sûcê dike, bi behaneya parvekirinên wî yên medyaya civakî, bi îdiaya "pesindayîna rêxistinên terorê, tehkîrkirina mezinên dewletê û birêveberiya zanîngehê" li hember Ozyetiş lêpirsîna dîsîplînê tê vekirin (Evrensel, 29ê kanûna pêşîn a 2017an; Journo 18ê kanûna paşîn a 2019).[59] Herwiha, ji teref dozgeriyê di derbarê Ozyetiş de ji ber sûcên propagandaya rêxistina terorê, heqaretkirina li serokkomar û heqaretkirina li tirkîniyê lêpirsîn tên vekirin û Ozyetiş du caran tê desteserkirin (Hevpeyvîna ligel Emre Ozyetiş, 13ê gulana 2020an).

58 https://journo.com.tr/agirakca-kiz-gibi-hoca-istemiyor

59 https://www.evrensel.net/haber/342025/cinsiyetci-sozlere-maruz-kaldi-yeri-degistirildi

Li gor *Biryara Pêşniyarî ya li ser Statûya Personelên Akademîk ên Perwerdehiya Bilind* a UNESCOyê:

> Saziyên perwerdehiya bilind, divê hewl bidin ku birêveberiyên xwe bînin haleke zelal ku karibin werin venihêrtin. Ev sazî divê ji van aliyan ve venihêrtinbar bin:
>
> **(g)** Dabînkirina muameleya wekhev ya li hember jin û kêmaran û qebûlkirina usûl û siyasayên bo rakirina tacizên cinsî û nijadî,
>
> **(h)** Dabînkirina neastengkirina xebatên li sinifê an jî derfetên lêkolînê yên personelê hîndekariyê yê perwerdehiya bilind a bi rêya şîdet, tehdît û tacizê;[60]

Prensîbên ku li jor hatine diyarkirin di bûyera Emre Ozyetiş de bi temamî hatine îxlalkirin. Piştî van îxlalan, ne kesên ku îxlal pêk anîne lê Ozyetiş hatiye cezakirin. *Mobbing*a li hember wî çi qas diçe zêde dibe, êdî nikare li ber xwe bide û di havîna 2018an de ji peywira xwe îstîfa dike. Di proseya berdewam de ji hemû dozên li hember wî vekirî beraet kiriye (Hevpeyvîna ligel Emre Ozyetiş, 13ê gulana 2020an).

Di wê heyamê de ku fişarên Agirakça dewam dikirin, heft akademîsyenên li MAUyê peywirdar ku di nav wan de muzîsyenê kurd Mehmet Atliyê ku li Fakulteya Mîmariyê akademîsyen bû, ji bo ku li hember îxlala mafî ya Ozyetiş derkevin û piştgiriya wî bikin daxwaznameyekê didin rektoriyê. Piştî vê daxwaznameyê heft kes rastê *mobbing*eke giran û tehdîtan tên. Naveroka tehdîtan ev in ku ew dê cezayên dîsîplînê bigirin û kariyera wan a akademîk dikare were astengkirin. Piştî van tehdîtan 4 kes îmzeya xwe ya daxwaznameyê vedikişînin. Mehmet Atli li hember fişaran li ber xwe dide û îmzeya xwe nakişîne; lê di tebaxa 2018an de Mehmet Atli û hevalekî wî yê akademîsyen bi heman sedemê cezaya dîsîplînê digirin û paşê jî ji peywira xwe ya li MAUyê îstîfa dikin. (Hevpeyvîna ligel Mehmet Atli, 16ê nîsana 2020an).

Tiştên ku Emre Ozyetiş û Mehmet Atli jiyane, bes hinek ji îxlalên mafî, çavtirsandin û fişarên li hember akademîsyenan in ku rektor bi şexsî, birêveberiyên zanîngehan jî wekî sazî bi cih tînin. Mîna van tiştan, azardana akademîsyenan ji teref rektor an jî birêveberan, gefxwarin, vekirina lêpirsînên dîsîplînê bi armanca çavtirsandinê, guhertina cihên kar ên akademîsyenan, zordana bo îstîfayê an jî îxrackirinê, îxlalên mafî yên giştî ne. Li gor ku beşdaran ji me re behs kirî, azardana li odeyên rektoran, gefxwarin û tirsandin ne tenê li MAUyê lê li zanîngehên din jî qewimîne.

---

**60** UNESCO Yüksek Öğretim Akademik Personelin Statüsüne İlişkin Tavsiye Kararı http://80.251.40.59/politics.ankara.edu.tr/altipar/Yayinlar/Yuksek%20Ogretim%20Tavsiye.pdf

### 4.2.2. Cezakirina Akademîsyenên li Zanîngeha Zaxoyê Doktora Kirî

Li bin banê MAUyê, di heyama Agirakça de, îxlaleke mafî ya girîng ku di qada Xebatên Kurdî de hatiye kirin; vekirina lêpirsîna îdarî ya li ser wan akademîsyenan e ku di heyama rektorê yekem Serdar Bedii Omay de li Zanîngeha Zaxoyê ya girêdayî Birêveberiya Herêmî ya Kurdistanê dest bi doktorayê kirine û di heyama her du rektoran de jî bi periyod çûne Zaxoyê, û ji teref YOKê hevkêşiya dîplomayên wan nehatine dayîn. Di heyama Serdar Bedii Omay de, ji ber ku di bin banê MAUyê de bernameyeke doktorayê ya li ser kurdî nîne, rektor ligel Zanîngeha Zaxoyê protelek îmze dike. Bi vê protokolê rê li ber hin xwendekarên ji MAUyê vedibe ku wekî xwendekarên doktorayê herin Zaxoyê. Beşdarekê/î vê bernameyê ev rewş bi van gotinan anî ziman:

> Li Tirkiyeyê jî bernameyeke doktorayê tune bû, ew çax Serdar Bedii Omay sax be, em bi hev re çûn. Ew û mamoste Kadri di seferekе Başûr de ji ber ku Zanîngeha Zaxoyê nêzîk e, bi wan re protokolek îmze kirin û, anku li cem me 6 endamên hîndekariyê hene, dikevin dersên me, heke hûn ji bo wan bernameyeke doktorayê vekin, bi wan re jî helbet 3 peywirdarên hîndekariyê hebûn, me bi wan re li hev kir. Di vê çarçoveyê de bes ji bo vê yekê, protolek hat îmzekirin di dawiya 2013yan de. Li gor vê protokolê nivîsek dan me tevan. Em çûn Zanîngeha Zaxoyê û me qeyda xwe çêkir. 2014an de me dest bi perwerdehiyê kir. Piştî qonaxeke dersan a 6 mehî jixwe em ketin proseya tezê. Anku bi vî awayî, di pêvajoya dersê de em diçûn û dihatin.

Li gor beşdaran, di serdema îmzekirina protokolê de, peymana hevkêşiya dîplomayê di navbera YOKê û Zanîngeha Zaxoyê de heye. Akademîsyenên li vê bernameya doktorayê qeydkirî, bi çûnûhatina Zanîngeha Zaxoyê beşdarî dersan dibin. Di dema van serdanên xwe de jî ji ber ku jixwe protokol hatiye îmzekirin û bi gelemperî dawiya hefteyê diçin Zaxoyê, ji bo çûnûhatinên xwe pêwîstî nabînin ku destûra îdarî bigirin. Paşê jî li Mêrdînê, di proseya dewamkirina xebatên xwe de tezên xwe yên doktorayê teslîm dikin û ji Zanîngeha Zaxoyê dîplomayên xwe yên doktorayê digirin.

Beşdara/ê ku doktoraya xwe li Zanîngeha Zaxoyê temam kirî, ji bo girtina hevkêşiya dîplomaya xwe muraceatê Lijneya Navbera Zanîngehan a YOKê dike. Lê belê, YOK bo demeke dirêj muraceata hevkêşiyê disekinîne û piştî demeke dirêj muraceat biencam dibe. Di bersivê de tê ragihandin ku êdî peymana hevkêşiyê ya YOKê ligel Zanîngeha Zaxoyê nîne. Ji ber betalbûna peymana hevkêşiyê ya ligel Zanîngeha Zaxoyê, muraceata hevkêşiya dîplomayê ya beşdarê/î tê redkirin. Dema ku ev prose dewam dike, di serdema rektorê duyem, anku Agirakça de, li hember xwendekarên

ku bo doktorayê diçûn Zanîngeha Zaxoyê, lêpirsîna îdarî tê vekirin. Lêpirsîna îdarî bi tawanbariya ku ev xwendekar dema ji bo perwerdehiya xwe ya doktorayê derketine derveyê welat destûra îdarî ya nivîskî negirtine, bi sûcdariya "bêdestûr derketina derveyê welat" hatiye vekirin. Piştî vê lêpirsînê cezaya birîna ji meaş li akademîsyenan tê birîn.

Îxlalên mafî yên li MAUyê pêkhatî bi van ne sînorkirî ne. Ligel ev ên behskirî gelek îxlalên mafî pêk tên li MAUyê di serdema Agirakça de. Her wekî di beşa ewil ya raporê de, di beşa "Em ê nebin hevparên vî sûcî!" de, îxlalên mafî yên giştî yên li hember akademîsyenên ku danezan îmze kirine û îxlalên mafî yên giştî yên heyama rewşa awarte de ku dê di beşa pêş de were behskirin. Ji aliyekî din, di vê beşa raporê de, di serdema her du rektoran de cudahiya kiryarên azadiya akademîk, xweseriya akademîk û azadiya derbirînê û xweseriya zanîngehê, xwe-rêveberiya zanîngehê û azadiyên akademîk bi kîjan rê û mekanîzmayan zirar dîtiye, hatiye hewldan ku bi nimûneya MAUyê were nîşandan.

## 5. BIDAWÎBÛNA PROSEYA DIYALOGÊ Û BANDORA GİŞTÎ YA HEYAMA REWŞA AWARTE LI SER XEBATÊN KURDÎ

Wekî di beşên paş de jî hat behskirin, di îxlalên mafî yên li hember akademîsyenan de, konjonktûra siyasî ya giştî, "polîtîkaya kurd" a rojane ya dewletê, têkiliyên YE-Tirkiyeyê, rewşa pevçûna çekdarî, helwestên şexsî û akademîk ên rektorên ku li gor daxwazên desthilatdariya siyasî tevdigerin, li ser azadiya derbirînê û azadiya akademîk di asteke girîng de bandor li ser şert û mercên xebatê yên akademîsyenan û îxlalên mafî dike.

Beşdaran dema behsa tecrubeyên xwe yên îxlalên mafî kirin, têgehên wekî "serdema rektor X", "serdema rektor Y", "serdema proseya çareseriyê", "serdema piştî proseya çareseriyê", "serdema agirbestê", "serdema şer", "serdema muzakereyan", "serdema diyalogê" "serdema rewşa awarte", "serdema derbeyê" zêde bi kar anîn. Di mehên havînê yên 2015an de, bidawîbûna qonaxa bêpevçûniyê ya di navbera PKKê û Dewletê de ku wekî "muzakere"/ "diyalog" dihat binavkirin û pişt wê jî îxlalên giran yên mafên mirovî yên ku di vê serdemê de ji teref dewletê hatin kirin, rûxandina bajaran, seqetbûyîn û mirina bi sedan mirovî, pêşî li ser akademîsyen û xwendekarên ku xebatên xwe li bajarên kurdan pêk tînin hilweşîneke psîkolojîk ya giran çêkiriye. Hin beşdaran anîn ziman ku ne tenê birêveberiyên zanîngehan lê derdoreke pevçûnên çekdarî bandorên neyênî û giran li ser Xebatên Kurdî kirine. Diyar kirin ku heta di vê qonaxê de hin xwendekaran xizmên xwe wenda kirine, hin xwendekaran dest bi neçûna zanîngehê kirine, gihana kitêban a xwendekaran gelek kêm bûye, hin xwendekaran di nav atmosfera tirsê ya bi sedema pevçûnan de kîtêbên xwe yên kurdî an şewitandine an jî avêtine çopê. Anîn ziman ku di vê

serdema zehmet de ku gelek mirovan jiyana xwe ji dest daye, baldariya li hember xebatên akademîk kêm bûye, motîvasyona hem ji bo jiyanê hem jî ji bo xebatên akademîk di asteke girîng de ketiye. Piştî sala 2015an, cardin destpêkirina pevçûnan, rejîma rewşa awarte, girtinên giştî, girtinên parlementer û serokên şaredariyan ên kurd ên hilbijartî û birêveberiya şaredariyan bi rêya qeyyûmên tayînkirî, îxlalên giran yên mafên mirovî û hemû van rûdanên siyasî û civakî, bandoreke gelek neyênî li ser qada Xebatên Kurdî kiriye û ev bandora neyênî di dema nivîsandina vê raporê de jî berdewam bû.

Di serdema 2016-2018an de, li seranserê qonaxa rewşa awarte bi rêya KHKyên ji teref Lijneya Wezîran amadekirî, peywirên gelek akademîsyenên li zanîngehan hatin bidawîkirin. Ligel vê yekê, di serdema piştî 2015an de û bi taybetî jî di serdema rewşa awarte ya di navbera salên 2016-2018an de, di hin mînakan de li gor biryar û helwestên birêveberiyên zanîngehan û rektoran ku dikarin wekî "keyfî" an jî "şexsî" werin nirxandin, akademîsyen rastê îxlalên mafî hatine. Bo nimûne, rektorekî zanîngehê di "proseya çareseriyê" de nîsbeten polîtîkayên azadîxwaz anîne cih lê heman rektor piştî Tebaxa 2015an ku proseya diyalogê bidawî bûye, bi taybetî jî di qonaxa rewşa awarte de karibûye berê xwe bide kiryarên tund û fişarker.

Xaleke din a girîng ku divê em diyar bikin ew e ku li gor beşdarên ku li Zanîngeha Mardin Artukluyê xebatên xwe kirine/dikin, beşdarên ji zanîngehên din, çi îxracbûyî çi nebûyî, di dema parvekirina tecrubeyên xwe de bêhtir biendîşe bûn.

Hin ji van beşdaran di dema parvekirina tecrubeyên xwe de an jî çavdêriyên xwe yên li zanîngehan, nexwestin ku rasterast jêgirtin ji wan were kirin. Beşdarên ku destûr dan jî rica kirin ku navên zanîngehên wan di raporê de derbas nebin. Ligel vê yekê, tevî ku îxlalên mafî yên li MAUyê di asteke girîng de li medyayê cih dîtiye, gelek îxlalên mafî yên li zanîngehên din di medyayê de nehatine nîşandan. Bi qasî ku me di hevdîtinan de çavdêrî kiriye, sedema endîşeyên akademisyenan, nîşandana kêm ya îxlalên mafî di medya û raya giştî de ye û ji ber ku ev zanîngeh li bajarên piçûk in, xwe kêmtir di nav ewlehiyê de hîs dikin. Ji ber van sedeman, hin bûyerên spesîfîk û jêgirtin bêyî navên zanîngehan dê werin ragihandin.

## 5.1 Îxracên Akademîsyenan, Rektorên Fişarker, Kêmbûna Çalakiyên Akademîk û Polîtîkaya Sirgûnê

Hejmara akademîsyenên di heyama rewşa awarte de îxrackirî 6.081 e.[61] Di vê proseyê de 15 zanîngeh bi sedema ku têkildarê Cemaeta Gulen in hatine girtin ku di qonaxa navborî de wekî rêxistineke terorî hatibû îlankirin.[62] Di îxrackirina aka-

61 Akademisyen İhraçları Hak İhlalleri Kayıplar ve Güçlenme Süreçleri, 2019, Türkiye İnsan Hakları Vakfı Yayınları, s.6.

62 Üniversitenin Olağanüstü Hali Akademik Ortamın Tahribatı Üzerine Bir İnceleme, Türkiye İnsan Hakları Vakfı Yayınları

demîsyenan de YOKê û birêveberiyên zanîngehan bi awayekî çalak cih girtine. Di vê qonaxê de qismeke ji van akademîsyenên îxrackirî bi PKKyê ve hatine girêdan, qismeke girîng jî bi Cemaeta Gulen ve hatine girêdan, qismek jê jî bêyî bi rêxistinekî hwd. ve werin girêdan, bes ji ber nêrînên xwe yên muxalîf hatine îxrackirin an jî hatine mecbûrkirin ku îstîfa bikin.

Di qonaxa rewşa awarte de fişara herî girîng a li hember xweserî û birêveberiya zanîngehan, qedexekirin û rakirina hilbijartinên rektoriyê ye ku di qonaxên berê de jî jixwe di bin fişarên dewlet û YOKê de pêk dihat. Bi KHKya di 29ê cotmeha 2016an de weşandî, hilbijartinên rektoriyê hatine qedexekirin û di Rojnameya Fermî de hatiye îlankirin ku rektorên zanîngehan dê ji teref Serokkomar, ji nav sê endamên ji teref YOKê pêşniyarkirî werin diyarkirin û tayînkirin (Rojnameya Fermî, 29ê cotmeha 2016an).[63] Gelek rektorên hilbijartî an jî piştî 2016an rasterast ji teref Serokkomar tayînkirî, ew rê hilbijartine ku bi qenalên lêpirsîn û îstîxbaratê, akademîsyenên wekî “bitalûke, dabeşker, dijminê dewletê û layengirê terorê” diyarkirî bi ceza bikin. Di vê qonaxê de rektor diyarker bûne di îxrackirina wan akademîsyenan de ku ne îmzekar in lê wekî ne dilsozê dewletê dîtine.

Li gor *Biryara Pêşniyarî ya li ser Statûya Personelên Akademîk ên Perwerdehiya Bilind* a UNESCOyê:

> Personelên akademîk ên perwerdehiya bilind, dema ku ew rêzê nîşanê mafên beşdarbûna birêveberiya beşên din ên civatê bidin, divê bêyî merûzmayîna cihêkariyekê, bibin xwedan maf û derfetê peywirgirtina li gor qabiliyetên xwe û saziya ku lê dixebitin di nav de, rexnekirina birêvebirina saziyên perwerdehiya bilind. Personelên perwerdehiya bilind herwiha divê xwedan mafê hilbijartina piraniya temsîlkarên organên akademîk ên saziyên perwerdehiya bilind bin.[64]

Piştî sala 2016an, rakirina temamî ya hilbijartinên rektoriyê û polîtîkayên fişarker ên rektoran bi temamî li dij vê prensîba li jor û peymanên navneteweyî ne ku di beşa ewil a raporê de hatî behskirin. Di qonaxa rewşa awarte de mafê hilbijartina temsîlkarên xwe yên saziyên perwerdehiya bilind û cihgirtina organên birêveberiyê yên personelên hîndekariya perwerdehiya bilind, bi temamî ji destê wan hatiye girtin.

Di derbarê mijara deqsorîkirina hin akademîsyenan wekî “xaîn” û fişara zêde ya rektoran a di qonaxa piştî rewşa awarte de, ji nav beşdaran akademîsyeneke/î

63 https://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2016/10/20161029-5.htm

64 UNESCO Yüksek Öğretim Akademik Personelin Statüsüne İlişkin Tavsiye Kararı http://80.251.40.59/politics.ankara.edu.tr/altipar/Yayinlar/Yuksek%20Ogretim%20Tavsiye.pdf

îxracbûyî mînakeke balkêş da ku nîşan dide dema proseya diyalogê ya ku wekî "proseya çareseriyê" jî tê binavkirin û qonaxa piştî 2015an ku ev prose bidawî bû, konjonktûra siyasî ya giştî çawa bandor li ser birêveberiya zanîngehê û bi taybetî gotar û polîtîkayên rektoran kiriye. Beşdarê/î anî ziman ku li zaningeha dixebitî, beriya 2015an hin çalakiyên li ser "meseleya kurd" dihatin lidarxistin. Di derbarê vê/î beşdarê/î de piştî 2016an ji teref birêveberiya zanîngehê lêpirsîn hatiye vekirin û paşê jî beşdar bi KHKyê ji peywira xwe hatiye îxrackirin. Li gor beşdar, sedema îxracbûna wî nêrînên wî yên ku di bin banê zanîngehê de dianî ziman û helwestên wî yên muxalîf bûn. Beşdarê/a ku li zanîngeheke derveyê MAUyê kar dikir daxwaz kir ku navê zanîngeha wî/wê di raporê de derbas nebe.

> Proseya çareseriyê gelek rehettir bû. Carna birêveberên zanîngehê jî beşdarê çalakiyên li zanîngehê dibûn. Mesela carekê ji partiya nêzî kurdan parlementerek hatibû, axaftinek pêşkêş dikir, slogan dihatin avêtin. Carekê komxebata çareseriya pirsgirêka kurd hat lidarxistin. Rektor jî beşdar bû, heta axivî jî. Pir baş tê bîra min, yek ji axaftvanan digot serok Apo wisa dibêje. Rektor beriya ku me îxrac bike ez gazî odeya xwe kirim. Ez çûm, tam dema ez rûnim ji min re got "we dê dewlet ava bikira?" Ez jî şaş mam, keniyam. Paşê jî hê di proseya lêpirsînê de bûm, hê îxrac nebûme. Got "We got qey dewlet çi ye? Hûn dibêjin qey dewleta tirk çi ye? Wisa disekine disekine paşê jî ha wisa tê li serê we dixe." Helbet piştî ku êdî niyeta wî hat fehmkirin min jî got "Ez ji bo axaftina tiştên wisa nehatim cem we. Tiştên ku hûn behs dikin meseleyên cuda ne, niyeteke min a avakirina dewletê, filan û bêvan nîn e." Wî jî got "Ev dewlet dizane kî kî ye, dema wê were ha wisa derdikeve pêşiya we." Min jî got "Mamoste anku hûn ji bo çi min diavêjin, we lêpirsîn vekiriye, xuya ye ku hûn ê min biavêjin lê ji bo çi hûn ê biavêjin? Pirsgirêkeke min a hiqûqî ya qanûnî heye?" Got "Na, tu pirsgirêkeke te ya hiqûqî ya qanûnî nîne lê baweriya dewletê bi te nayê, a min jî nayê." Min got "Yanî mesela ez dikarim çi bikim bo ku baweriya we qezenc bikim?" "Niha naseke/î te heye li asteke jor a dewletê, li YOKê, li wezaretê mesela?" Min got "Na, naseke/î min nîne." "Li qedemeyên bilind ên AK Partiyê naseke/î te heye? Li qeymeqamiyê, nasekî te yê walî heye?" Min got "Na." Wî got "Bila yek ji wan bibe kefîlê te, ji min re nivîsekê bişîne ku bibêje ez vî kesî dinasim, tu tişteke wî nîne, ez jî rewşa te binirxînim." Min got "Nasekî min ê wisa tune ye mamoste." Mînakek derxist ji ser maseya xwe û got "Mamosteyeke/î din heye ku di heman rewşê de ye, me ji bo wî jî lêpirsînek vekir lê parlemen-


> tereke/î Ak Partiyê jê re bûye kefîl. Niha em ê dosyeya wî bigirin. Heke dixwazî tu jî rêyeke wisa bibîne." Min got "Nasekî min ê wisa tune ye. Heke sûcekî min heye ku li min tê barkirin, bibêjin." Got "Na, tu ji min re îspat bike ku tu li aliyê dewletê yî." Min jî got "Yanî ez çawa dikarim vê îspat bikim, tişteke vê ya hiqûqî heye? Hûn ê sûcekê li min bar bikin û ez ê jî bersiva wê bidim." Got "Tawanbariyek tune ye. Tu ne li aliyê vê dewletê yî." Min got "Baş e, ez ê çawa xwe îfade bikim bi vî awayî?" Got "Mesela qet wêneyekî, dîmenekî te yê li mîtîngên naletkirina terorê heye?" Demekê mîtîngên wisa hebûn, derdiketin û nalet li terorê dianîn. Min got "Welle nîne mamoste." Got "Ew çax tu ne li aliyê dewletê yî.[...]" Min got "Niha hûn ji min re dibêjin mijarek nîne ku min wekî mijara lêpirsînê diyar kiriye. Mesela hûn dibêjin Îmzekarên Aşitiyê filan (ew çax li wan lêpirsîn hatibû vekirin, dihatin avêtin) li wê metnê îmzeya min nîne." Wî jî got "Jixwe yên wekî te radîkal belgeyeke wisa îmze nakin." Ez ketim şoqê. Got "Dewlet jixwe lê dinêre, lêdikole, herî tûj ên vî karî îmze navêjin."

Ev jêgirtina dirêj ji gelek aliyan, hêlên resen yên qonaxa diyalogê ya navbera 2013-2015an û şikestina giştî ya piştî wê nîşan dide. Ev nimûne, bi awayekî giştî rihê proseya diyalogê nîşan dide. Ji aliyekî din, wekî ku li jor jî hatiye îfadekirin, di qonaxa cardin destpêkirina pevçûnên çekdarî ya 2015an de, hem li herêmê hem jî bi gelemperî li zanîngehan atmosfera polîtîk guheriye. Hevdîtina ligel rektor ya ku di vê jêgirtinê de hatiye nîşandan, hevdîtineke normal ya navbera rektor û akademîsyenekî nîne. Ev hevdîtin beşeke ji lêpirsîna di derbarê akademîsyen de ye. Li for îfadeya beşdar, rektorî li vir wekî polîsekî lêpirsîn kiriye. Rektorê ku lêpirsînê dike, akademîsyenê xebatkarê zanîngehê bi hewldana avakirina dewleteke cuda û bi nedilsoziya ligel dewletê tawanbar dike. Hatiye gotin ku ji bo akademîsyenê wekî "gumanbar" hatiye îthamkirin bikaribe peywira xwe ya akademîk bidomîne, lazim e dilsoziya li hember dewletê û Partiya Edalet û Pêşketinê (AKP) îspat bike. Hatiye gotin ku wekî delîl ji endamên payebilind ên AKPyê nameyeke referansê bîne, wêneyekî pêşkêş bike ku nîşan bide ew beşdarê mîtîngên dij PKKyê bûye an jî waliyek an qeymeqamek jê re bibe kefîl. Li vir helwesta sûcdarkirin û piçûkxistinê gelek eşkere ye ku rektor bi awayekî belasebeb berê wê daye akademîsyen. Rektor, bi gotina heke şertên jor bi cih bîne ew ê pak bibe heke ne ew dê wekî "xaîn" were dîtin, rewşa pratîka a di bin banê akademiyê de nîşan daye û ev helwest wekî di beşa ewil ya raporê de hatiye behskirin bi temamî li dij peymanên navneteweyî ne ku Dewleta Komara Tirkiyeyê terefeke wan e û Biryara Pêşniyarî ya UNESCOyê ye.

Di qonaxa rewşa awarte de gelek akademîsyenên ku di qada Xebatên Kurdî de

xebatan dikirin, têkiliya wan ligel Cemaeta Gulen tune bû û danezan jî îmze nekiribûn jî, bi destûrên rejîma rewşa awarte di vê proseyê de an hatin îxrackirin û an jî ji ber merûzmayîna *mobbing*ê mecbûr man ku îstîfa bikin. Bo nimûne, sê beşdarên ku danezan îmze nekirine, tevî ku tu têkiliya wan bi Cemaeta Gulen re jî nîne, bes ji ber nêrînên xwe yên muxalîf ku li nav zanîngehê anîne ziman, bi KHKyan hatine îxrackirin. Du beşdar jî ji ber *mobbing*a li hember xwe dev ji karê xwe berdane. Ji nav 58 kesên bersiva anketê dane 14 kesî ji karê xwe îstîfa kiriye. Lewra, di qonaxa rewşa awarte de gelek akademîsyenên ku sînorên dewletê derbas kirine an jî rektoran ew meqbûl nedîtiye, gumanbar dîtiye an jî xaîn îlan kiriye, bi rêyên cuda ji zanîngehan hatine dûrxistin.

Piştî ku qonaxa rewşa awarte di 2018an de bi dawî bû, hin akademîsyenên ku bi KHKyan îxrac bûne ji bo vegera zanîngehê, muracaetê Serokatiya Komîsyona Lêkolîna Kirariyên Rewşa Awarte kirine û hin vegeriyane zanîngehê. Di anketê de me ji akademîsyenên serî li vegera karê xwe yê zanîngehê dayî pirs kir ku serîlêdana wan çawa biencam bûye. Ji 59 kesan 24 kesî ev pirs bersivand. Bersiv li jêr in:




Wekî di vê grafîkê de tê dîtin, gelek akademîsyen hê jî li benda encama muraceata xwe ne. Bes 1 ji akademîsyenên ku me hevdîtin kirî vegeriyaye zanîngehê û tayîna wî ne ji bo zanîngeha jê îxracbûyî lê ji bo yeka din hatiye kirin.

Ligel van îxlalên mafî yên li jor behskirî, xaleke balkêş jî ev e ku panel û konferansên akademîk ên qada Xebatên Kurdî hema hema sekinîne. Bo nimûne, beşdarekê/î anî ziman ku ji ber eleqeya gelê bajêr a li hember çalakiyên bi kurdî yên li zanîngehê, birêveberiya zanîngehê gelek aciz dibû. Beşdarê ku li zanîngeheke derveyî MAUyê kar dikir, daxwaz kir ku navê zanîngehê di raporê de derbas nebe. Di qonaxa beriya 2015an de, di derbarê hem eleqeya gelên bajêr û hem ya xwendekarên a li hember semîner û panelên kurdî yên li zanîngehê lidarxistî û berteka li hember vê de beşdarê/î ev gotin anî ziman:

> Ji vê beşê, li ser navê kurd, Kurdistan û dîroka kurdan arasteyîbûna gelek akademîsyenên ji beşên cuda, şiyana arasteyîbûnê, şikestina tirsekê, sînerjiyeke gelek cidî derxist holê. Helbet ew çax proseya çareseriyê jî hebû. Mesela tişteke piçûk bibêjim, klûbên xwendekaran hene. Ev klûbên nîv-fermî ne. Ji her beş an jî fakulteyî xwendekar têne cem hev. Klûba Edebiyatê hwd. Mesela xwendekareke/î min got "Mamoste derfeteke wisa ya fermî heye. Budçeya wê jî heye. Tu panelan li dar dixî, ji derve mirov tên nav zanîngehê." Me jî got dibe ka em bifikirin[…] Tê bîra min, bo nimûne çalakiyek li dar dixistin an jî gazî nivîskarekî dikirin, 1000-2000 kes tên. Ev rewş ji bo birêveberiya zanîngehê bû sedema diltirsiyeke cidî. Gotin "Berdin. Zanîngeh ji vî karî aciz e. Hûn çalakiyên wisa li dar dixin. Bi hezaran kesî tînin zaningehê. Ev rê li ber mobîlîzasyoneke cidî vedike." […] Dest pê kirin ku ji min re bibêjin vê bike, wê bike. Mesela êdî salon nedidan me. Digotin "salon nîne ji bo we." Dema me ji bo salonê israr dikir, digotin "israr nekin hûn dê bikevin nav talûkeyê." Xwendekar jî ji vê tirsiyan lewra mecbûr man ku civakê belav bikin.

Wekî ji vê jêgirtinê tê dîtin, helwesta birêveberiya zanîngehê ya li hember çalakiyan li gor demê diguhere. Di qonaxa piştî 2015an de jî li hemû zanîngehan çalakiyên li ser Xebatên Kurdî sekinîbûn. Hemû beşdarên ku hê jî li zanîngehan dixebitîn anîn ziman ku hemû çalakiyên bi tirkî an kurdî yên qada Xebatên Kurdî li zanîngehan cih nabîne, çalakiyên wisa di asteke girîng de kêm bûne û heke werin kirin jî bi tirs tên lidarxistin. Wekî hemûyê akademiyê, Xebatên Kurdî yên li zanîngehan jî, bi taybetî di qonaxa piştî 2016an de di bin şert û mercên fişarkerî û tirsê de tên birêvebirin.[65]

### 5.2. Paşveçûna di Dersên Hilbijarî yên Kurdî û Xebatên bi Kurdî de

Piştî sala 2015an, li zanîngehan paşveçûnên di qadên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Edebiyata Zazakî de, ji bo xwendekarên dikarin van beşan hilbijêrin, êdî ev beş ji cihekî balkêş dûr ketine. Beşdaran diyar kir ku di salên paş de van beşan ji kontenjanên xwe zêdetir tercîh digirtin û ji ber vê jî pûanên wan gelek bilind bûn. Beşdarekê/î ev rewş wisa anî ziman:

> Mesela bi awayê herî berçav, dema me beş nû vekir xwendekarên dihatin bi aliyê potansiyelê, pûanên ezmûna ketina zanîn-

65 Ji bo bandora giştî ya rejîma rewşa awarte ya li ser zanîngehên Tirkiyeyê bnr.Üniversitenin Olağanüstü Hali Akademik Ortamın Tahribatı Üzerine Bir İnceleme, Türkiye İnsan Hakları Vakfı Yayınları

gehê de niha cudahiyeke mezin heye. Şewq, moral û motîvasyona xwendekarên ewil gelek cuda bû, rewşa yên niha pir xirabtir e, anku profila me ya xwendekaran mixabin çi qas diçe xirab dibe. Ev ji atmosfera ku min behskirî ne azade ye.

Mesela li zanîngeha me beşa herî bilind beşa me ye. Ne bes li fakulteyê, bi giştî li hemû zanîngehê. Lê belê ev rewş çi qas diçe xira dibe û em niha di rewşeke wasat de ne.

Di proseya diyalogê de, li bajarên kurdan vebûna beşên kurdî yên  di astên lîsans, lîsansa bilind û doktorayê de bi taybetî ji bo xwendekarên kurd û yên ku dixwazin xebatên xwe yên akademîk di vê qadê de bikin, rê li ber coşeke mezin vekiriye û bi hejmarên gelek bilind muraceat li van beşan hatine kirin. Di zêdehiya muraceatan de bandora vê agahiyê jî hebû ku xwendekarên ji van beşan derçûyî dê wekî mamoste ji bo dersên hilbijarî yên kurdî yên dibistanên navîn werin tayînkirin.

Qismeke girîng a beşdarên li beşên Zimanê Kurdî û Zimanê Zazakî dixebitin/xebitîne anîn ziman ku ew difikirin eleqeya li hember van beşan û hem nav zanîngehê hem jî li dibistanên navîn dersên hilbijarî yên kurdî-kurmancî-kirmanckî-zazakî dewletê aciz kiriye û dewletê nexwestiye kurdî bihêz bibe. Di beşên paş de behsa tansiyona di navbera MAU û YOKê de hatibû kirin, ya di derbarê mijara kontenjana bernameya lîsansa bilind a bêtez de ku dê mamosteyên kurdî bigihanda û eleqeya xwendekarên dibistana navîn a li hember dersên hilbijarî yên kurdî. Piştî 2015an û bi taybetî jî piştî qonaxa rewşa awarte tayînkirina mamosteyên kurdî hatiye merheleya rawestanê. Di derbarê vê mijarê de Recep Şimşekê Hevserokê Şaxa 2yemîn a Egitim-Sena Diyarbekirê di 9ê îlona 2019an de daxuyaniyek daye. Li gor daxuyaniyê malbatên xwendekarên ku daxwaza dersa kurdî ya hilbijarî kirine anîn ziman ku hin gerînendeyên dibistanan ji ber kêmasiya polan nehîştine xwendekar kurdî hilbijêrin, hinekan jî ji ber ku mamosteyên kurdî nîn in berê xwendekaran dane dersên din. MEBê, ji bo daxwaza li hember dersên ziman ên hilbijarî ku ji 2012an pê ve ye di mufredatê de ne, bes hejmarên 2015-2016an parve kirine. Li gor hejmarên MEBê, di serdema perwerdehî û hîndekariyê ya 2015-2016an de kurmanciya hilbijarî, ji teref 71 hezar 616, kirmanckî (zazakî) jî 6 hezar 315, bi giştî ji teref 77 hezar û 931 xwendekaran wekî dersên ziman yên hilbijarî hatine hilbijartin. Digel vê yekê, MEBê heta îro ji bo dersa hilbijarî ya kurdî bes 59 kes (kurmancî 48, kirmanckî 11) qadro vekiriye (Evrensel, 9ê îlona 2019an).[66] Bi kurtî, dikare were gotin ku dewlet, piştî 2015an li gor polîtîkaya kurdan a fişarker, bi taybetî bi rawestandina tayînkirina mamosteyên jixwe kêm yên bo dibistanên navîn, beşên kurdî bêtesîr û bêfonksiyon kirine.

Ligel zeîfkirina dersên kurdî yên hilbijarî li dibistanên navîn, her çi qas li zanîn-

66 https://www.evrensel.net/haber/386372/sectirilmeyen-secmeli-ders-kurtce

gehan beşên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Edebiyata Zazakî neyên girtin jî, di dersên hilbijarî yên kurdî de ku li beşên cuda yên zanîngehê dihat dayîn paşveçûneke girîng qewimiye. Li zanîngehên ku beşên Ziman û Edebiyata Kurdî vebûne, xwendekarên li beşên Tarîx, Matematîk an jî Aboriyê hwd. dikarin dersa kurdî wekî dersa hilbijarî hilbijêrin. Lê ji hêleke din, di qonaxa piştî 2015an de, ne tenê li ser dersên kurdî yên hilbijarî yên li dibistana navîn, fişarkeriyên li ser dersên kurdî yên hilbijarî yên ku xwendekarên ji beşên cuda yên zanîngehê jî di asteke girîng de zêde bûne. Beşdareke/î ku xebatên xwe yên li zanîngehê didomîne di derbarê mijarê de ev gotin anî ziman:

> Berê daxwazeke zêde hebû, piştî ku em ketinê jî baş bû, her beşê du saet dersa kurdî digirt. Ev çend salên dawî serok û mamosteyên van beşan nahêlin ders vebibe û heta tehdît dikin heke hûn dersa hilbijarî ya kurdî bigirin em ê we di dersên din de bihêlin. Rasterast ji min re hat gotin, xwendekar hatin û ji min re gotin ku heke em serdema duyem hilbijêrin dê mamoste me ji wan bihêlin, em çi bikin. Mixabin pirsgirêkên bi vî awayî derketin. Niha dersên hilbijarî gelek kêm in.

# ENCAM

Li zanîngehên Tirkiyeyê destpêkirina dereng ya xebatên têkildarê kurdan û salên dawî pirsgirêkên ku akademîsyenên ku di vê qadê de lêkolîn dikin û ders didin, rûbirû dimînin bêguman ji cih, statû an jî "bêstatû"bûna kurdan a li Tirkiyeyê ne azade ye. Li Tirkiyeyê înkara hebûna kurdan û destpêkirina pêşxistina polîtikayên li hember vê înkarê heta salên 1920î diçe. Di proseya avakirina netewe-dewleteke nû de, qebûlkirina tirkbûnê ya wekî hêmanê avaker ê bingehîn û duristkirina hemû polîtîkayan li gor vê, encamên wekî binpêkirina maf û hemû taybetmendiyên komên etnîkî û gelên otokton ên li Tirkiyeyê bi xwe re aniye. Kurd jî yek ji wan gelan in ku herî zêde di bin bandora vê rewşê de mane. Jinûve-hilberandina taybetmendiyên kultûrî yên gelekî, kêmarekê, komeke etnîkî û xebatên ji bo pêşxistina ziman a ku bûyîna hêmana herî heyatî ye li hêlekê, bi teoriyeke di maneyeke akademîk de bêpalûpişt a wekî Teoriya Ziman-Rojê, ji bilî tirkî hemû ziman hatin înkarkirin. Bêguman zanîngehên li Tirkiyeyê jî wekî amûrên bingehîn ên îdeolojiya fermî hatin avakirin û şikl girtin. Ji ber vê yekê zanîngehan li hember qadên xebatê, mijar û têgehên ku xerabî bigihînin "bitûniya nedabeşbar a dewletê" hesasiyeta xwe her tim parastin. Hin mijar û têgehên "hesas" ên behskirî, li gor binyada siyasî ya demê û bi rûdanên navneteweyî yên nû cih biguherin jî têgeha "kurd" di hemû qonaxên desthilatdariyê de hesasiyeta xwe parast. Tevî ku birêveberiyên zanîngehan tu carî tolerans nîşanê akademîsyenên van hesasiyetan îxlalkirî nedane jî, ji dayîna cezayên edlî û îdarî yên "lazim" jî kêm nemane. Di vê mijarê de akademîsyenê ku herî zêde bedel daye, ji ber lêkolînên xwe yên li ser kurdan ên salên 1960î, İsmail Beşikci ye. Ji ber kîtêb û makaleyên nivîsandî, parastinên ji dozên van kîtêb û gotaran lê hatine vekirin, nameyên nivîsandî hwd. qismeke

girîng a emrê xwe li girtîgehan derbas kiriye. Pratîkên li hember Beşikci, herwiha çavtirsandinek bû li hember kesên ku difikirîn li ser kurdan bixebitin. Ji ber vê yekê, bi taybetî jî piştî 1960an digel ku li derveyê akademiyê li ser kurdan hem bi tirkî hem bi kurdî bi rêjeyeke cidî kîtêb û kovar hatine weşandin jî li zanîngehan destpêkirina xebata li ser van mijaran heta salên 1990î kêm maye. Bêguman di vir de para têkoşîna lêgerîna mafî ya kurdan heye ku xwe dispêre salên dûr û dirêj. Ji ber ku vê rewşê nîşan dida ku têkoşîna mafî ya kurdan êdî bi înkareke hêsan nayê bêqîmetkirin. Û her çi qas wekî “pirsgirêkekî” werin dîtin jî qet nebe ji bo çareseriya vê pirsgirêkê kirina hin tiştan hema hema ji teref hemû derdoran dihat bilêvkirin.

Piştî salên 2000î vebûna qenala TVyê ya kurdî, TRT6ê, tevî ku di nav çarçoveyekê de bi cih nebe jî, paşê jî li hin zanîngehan ji bo perwerdehiya kurdî vekirina enstîtû, beş û şaxên zanistan, li dibistanên navîn destpêkirina dersên hilbijarî yên kurdî, bi xwe re bilezbûna Xebatên Kurdî yên bi kurdî-tirkî anî. Lê ji bo berdewamiya pratîkên wisa, dûrê verastkirina qanûnî, bi biryarên afakî duristkirina wan, hin pirsgirêk dihewandin. Qet nebe li Tirkiyeyê red û înkara demdirêj a kurdan û çanda wan wekî ku pirsgirêkeke piçûk a di navbera du malbatan de be, ji bo çareseriyê serî li tevdîr û verastkirinan dayîn, dîtina van verastkirinan a wekî “lutfekê” ji teref aliyê serdest nîşan dida ku dê ew nikaribin demdirêj bin. Ligel vê yekê, li zanîngehan tevî azadiya qismî ya xebatên li ser kurdan, endîşeyên li hember kurdan ji teref meqamên siyasî berdewam bûn. Di qonaxa piştî 2015an, li zanîngehan kêmbûna konferans û panelên di qada Xebatên Kurdî de, kêmbûna teleba xwendekaran a ji bo beşên kurdî, hema hema bidawîbûna tayînên mamosteyên dersên kurdî yên hilbijarî, bes hin ji encamên wê bûn. Paşê jî gelek akademîsyen ji karên xwe hatin îxrackirin ku polîtîkaya kurdan a li dewletê li zanîngehên xwe bi awayekî eşkere rexne dikirin. Akademîsyenên ku nehatin îxrackirin jî bi awayekî rasterast an jî nerasterast her tim hîs kirin ku ne xwedan azadiyeke bêsînor in, heke li karê xwe berdewam bikin divê haya wan ji sînorên ku dewletê xêz kirî hebe û wan sînoran derbas nekin. Tevî ku yek ji girîntirîn hilberîner û mîratgirê şaristaniya mezopotamyayê, kurd bo demeke dirêj di bin polîtîkayên zordestî û înkarê de mane jî, li Tirkiyeya piştî 2000an bi awayekî qismî be jî gavên ji bo rakirina van avêtî û verastkirinên kirî xwedan girîngiyeke dîrokî ne. Lê belê, rûdanên 2015an û piştî wê hemû hest û ramanên xweşbîniyê ji holê rakirine. Negihandina temînata qanûnî ya mafên qismî yên pejirandî, vegirtina wan hêsantir kiriye.

PÊŞNIYAR

Ji daneyên lêkolînê bi awayekî eşkere tê dîtin, ji ber ku dîroka Xebatên Kurdî li zanîngehên Tirkiyeyê nû ye, pirsgirêkên cidî hene. Ji bo pêşxistina van xebatan û çareserkirina pirsgirêkên heyî hin gav hene ku werin avêtin û hin verastkirinên qanûnî hene ku werin bicihkirin.

**1.** Cihdîtin û pêşxistina kurdî ya li jiyana akademîk girêdayî verastkirinên fiîlî û qanûnî ne ku kurdî di hemû astên jiyana perwedehiyê de, perwerdehiya pêş-dibistanê jî tê de, were bikaranîn. Berî her tiştî, mafê "perwerdehiya bi zimanê zikmakî" divê were temînkirin û ev di serî de Makezagon, li hemû mewzûatan were zêdekirin û bikeve bin misogeriyê. Ji bo parastin û pêşxistina kurdî û zimanên din ku bo salên dirêj ji derfetên perwerdehiya modern mehrûm mayî, divê gavên piştgiriyê werin avêtin. Herwiha, ji bo kirmanckî/zazakiya ku di lîsteya "zimanên li ber mirinê" ya UNESCOyê de, divê pêngavên hewce demildest werin avêtin.

**2.** Komara Tirkiyeyê, bo jinûve-hilberîna kurdî û zimanên din ên aîdê çandên din ku ji salên ewil heta îro di tu asteke mufredata perwerdehî-hîndekariyê de cih negirtî û perwerdehiya wan qedexekirî, divê hin çalakiyên piştgiriyê bike, bikaranîna çavkaniyên giştî (çavkaniya însanî û madî) ya li gor jêbirina newekheviyê jî tê de.

**3.** Divê rê li ber were vekirin ku li zanîngeh an jî saziyên din, dezgehên sinif, şaxên zanistên bingehîn, beş, enstîtû û fakulte û hwd. yên arasteyî xebatên kurdî û çanda kurdî ne di bin navên wekî "Enstîtûya Zimanên Zindî" yên nezelal/îmaker; li gor hewcedariyên akademîk, bi navên xwe vebibin.

**4.** Divê li zanîngehan astengiyên fiîlî û qanûnî yên li pêş xweseriya zanistî û îdarî, yên şertên bingehîn ên hilberîna zanistê ne, werin rakirin û verastkirinên qanûnî werin bicihanîn.

**5.** Tevî temînkirina xweseriya zanistî û îdarî, di serî de xebatên kurdî, xebatên zimanên din yên li Tirkiyeyê tên axaftin divê werin teşwîqkirin, dîtbarkirin û her cure piştgirî were dayîn. Divê astengiyên fiîlî û qanûnî yên li pêş nivîsandina tezên bi kurdî werin rakirin û verastkirinên qanûnî werin bicihkirin ku keyfîbûna îdarî asteng bike.

**6.** Divê astengiyên fiîlî û qanûnî yên li pêş azadiya fikrî û derbirînê werin rakirin ku ev bi peymanên navneteweyî hatine misogerkirin û bi îçtihatan hatine piştrastkirin. Xebatên zanistî û akademîk bi tu awayî nebin mijara lêpirsînên cezaî û îdarî. Di vê çarçoveyê de nêrîn û xebatên ne li gor dewletê û beşeke civakê, divê di derdoreke azad de werin îfadekirin.

**7.** Divê îxlalên mafî yên li hember akademîsyenên ku ji ber lêkolîn û fikrên xwe merûzê mueyîdeyên cezaî û îdarî mane were bidawîkirin û mafên xwebûnî jî di nav de, hemû mexdûriyetên wan werin telafîkirin.

**8.** Divê ji bo xwendekarên ji beşên Ziman û Edebiyata Kurdî derçûyî verastkirinên qanûnî yên giştî werin kirin ku derfetê kardîtina wan a li hemû sazî û dezgehên fermî û taybet bên temînkirin.

**9.** Ji ber ku lêkolînên akademîk ên kurdî û Xebatên Kurdî di asteke gihiştî de nîn in, divê ji bo xebatên di vê qadê de yên li bin banên zanîngehan, çavkanî were veqetandin.

**10.** Divê di serî de weşanên li bin banê zanîngehan piştgirî bidin weşana berhemên wekî gotar, tez, lêkolîn, kovar, kîtêb hwd. yên di qada Xebatên Kurdî de nivîsandî an jî dê bê nivîsandin û polîtîkayên weşanê wisa saz bikin ku astengiyên fiîlî ji holê rakin.

**11.** Di serî de berhemên kurdî û yên di qada Xebatên Kurdî de nivîsandî, bêyî cudakirina nivîskar, weşanxane û zimanî divê li pirtûkxaneyên zanîngehan hemû berhem cih bigirin ku bo xwendekar û beşan wekî çavkanî ne.

**12.** Divê hevkêşiya dîplomayên wan xwendekaran were nasîn ku li zanîngehên Birêveberiya Herêmî ya Kurdistanê perwerdehiya lîsans, lîsansa bilind û doktorayê girtine û şertên wisa werin temînkirin ku li zanîngehên Tirkiyeyê bikarin perwerdehiyê bidomînin û bixebitin.